Şi'rên mijara wan pend û şîret bin ji wan ra *Pendname*, *Nesîhetname*, *Şîretname* hatine gotin (Çelik, 2015, r. 456). Di helbesta *Dilsozîya Bi Olê Re* da şîret û nesîhetan dide mislimanan. Di helbesta *Dilo Bêje Şêx û Mela* da nesîheta li şêx û melayan dike. Di dîwanên wî de gelek şî'r û malikên pendwarî tên dîtin. Wek mînak; di dîwana "*Evîna Bê Miraz*" da şî'ra *Derdan Li Xwe Kom Nekin* ji şîretan pêk hatiye. Malika yekem a şî'ra *Dilsozîya Bi Olê Re* wiha ye.

"Werin ba min gelî yar û hevalan,
Bibêjim bo we çend heb galegalan" (Xursî, Helbestên Olî, r. 85).

j. Qîyametname

Şi'rên li ser bûyer û rûdanên qîyametê dikevin bin vî navî (Güzel, 1999, r. 652). Helbesta bi navê *Dawîya Dinyayê* rabûna qîyametê kirîye mijar. Ji ser nava şî'rê jî mijara wê dixûye. Şî'r bi munacatê dest pê dike û paşê rewşa qîyametê rave dike. Pifkirina sûrê, rabûna mirîya ji goran û mijarên roja heşrê di şî'rê da bi cih bûne. Herdû malikên destpêka helbestê wiha ne.

"Melek ku puf sûrê biki,
Laş û gîyan ji hev diki

*Ba û bahozê radiki,
Çîyan ji cê wan radiki"* (Xursî, Helbestên Olî, r. 49).

k. Îyadetname

Şi'rên di wan da şa'ir bi felekê, bayê, avê ra weke dost û hevalemî xwe bi terzek samîmî bi wan ra diaxive dikevin bin cureya *Îyadetnameyan* (Çelik, 2015, r. 461). Xemkûr di dîwanên xwe da, xwe ji cûreya *Îyadetnameyan* bê par nehiştîye. Şi'ra bi navê *Bayê Hênîk* dikeve kategoriya *Îyadetname* ye. Di vê şî'rê da pirsên şa'irî ji bayê tê dîtin. Şi'ra bi navê *Bayê Hênîk* dişîbihe şî'ra Feqîyê Teyran (1561-1641) a meşhur *Ey Av û Av*. Pêkane Xemkûr di bin bandora Feqî da mabe. Şi'r wiha destpêdike:

*"Ya Reb çi ba ye tu didî,
Belkî tu çavan jî nedî.*

*Zanim ku nayê bê xwedî,
Diyar bikî vê hikmete"* (Xursî, Helbestên Olî, r. 16).

l. Medhîye

Ji şî'rên pesnê re *Medhîye* tê gotin. Di medhîyeyan da pesnê şah, padişah, kesayetên mezin wek şêx, mela, şa'ir, sîyasetmedaran tîn dîtin. Ji bilî van kesên, di dile şa'irî da cih girtibe, wek dost û hevalên wî jî dibin mijara medhîyeyan (Fesaî, 1380, r. 161). Helbesta bi navê *Axtepe*, medhîyeya li ser şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepe' û berhema wî ya giranbiha *Rewdî'n-Ne'im* ê ye. Helbesta bi navê *Seyda Mela Ehmedê Şêx Remo* dikeve nav cûreyê medhîyeyan. Destpêka şî'ra *Axtepe* wiha ye.

*"Kete destê me pirtûkek ji ristan,
Mi go qey ez ketim nav werz û bîstan"* (Xursî, Helbestên Olî, r. 10).

m. Mersîye

Mersîye, bêjeyek erebî ye. Di edebîyata farisan da bi "*sûgname*" an "*mersîye*" û di edebîyata tirkî da "*ağit*", di edebîyata Kurdî da bi "*Zêmar*" hatîye binavkirin. Wek ku em dizanin mersîye bûye navê çeşnek ji helbestên edebîyata klasîk û di edebîyata klasîk a kurdî, farsî, erebî û tirkî da, helbestên li ser şî'nê, şîna kesên cih di dilê şair da girtibe bi vî navî hatine nasandin (Fesaî, 1380, r. 172). Şi'ra li ser mirina Celal Telebanî (1933-2017) nimûneyek ji mersîyeyên Xemkûr e. Ev şî'r di dîwana *Evîna Bêmiraz* da cih girtîye. Di heman dîwanê da em li ser Seydayê Tîrêj jî mersîyeyê dibînin. Mersîyeya li ser Celal Telebanî bi van malikan destpêdike.

*"Mam Celal Telebanî,
Te jî serê xwe danî,*

*Bû mêvanê axa sar,
Serî li gorê danî"* (Xursî, Evîna Bêmiraz, r 106).

n. Jîname û Xwejîname

Jîyanname bi navê "Zendedîname", "Karnam"e" û "Tercumeê Hal" jî tê nasîn. Şa'ir ji destpêka jîyana xwe heta dema nivîsandina şî'rê wek kurte jîyana xwe dide ber çavan (Dad, 1385, r. 270-271). Di hin cûreyên Jîyannameyan da jîyana hin kesayetên piştî mirina wan ji teref hin kesan de bi şî'rê tê nivîsandin. Di edebîyata Kurdî da ev cûre berhemên tînin (Ertekin, 2015). Xemkûr weke hin şa'iran jîyana xwe bi helbestanîye ziman. Di helbesta bi navê *Rojbûna Min* da em jîyannameya şa'ir dibînin.

*"Sala çil û pêncan ku hat,
Roj bû yekê meha sibat.*

*Xwedê ji derya jîyanê,
Da dayîkek xursî xelat "* (Xursî, Evîna Bêmiraz, r. 169).

o. Newrozîye

Newrozîye yan Newrozname cureyek edebî ye. Ji bo pêrozbahîyên newrozê şî'r û stranên taybet li ser girîngî û rewşa cejna newrozê hatine nivîsandin dikevin bin vî kategorîyê. Ji şî'rên bi vî rengî re *Newrozîye* hatîye gotin. (Ergün, 2018, r. 335) ; (Artun, 2017, r. 158) *Were Em Herin Newrozê* di nav şî'rên Xemkûr da mînak e ji bo cûreyên newroznameyê. Di dîwana "*Tûrikên Kul û Derdan*" da jî helbestek *Newrozîye* tê dîtin. Her wiha di dîwana "*Welatê Wêran*" da şî'ra serbest a bi navê *Nerwroz* jî Newroznameyeke Xwemkûr e. Çarîna pêşî jî şî'ra *Were Em Herin Newrozê* wiha destpêdike.

*"Zivistan çû dinya li me bûye bihar.
Gul û gîya şîn hatine 'l ser koka xwe.*

*Were em derkevin tevde ji gund û war,
Herin nava gul û gîya newroza xwe" (Xursî, Buxçika Bûka Dîl Girtî, r. 160).*

p. Name

Şî'ra ji teref şa'irî jî bo kesekî din jî bo daxwazakê, jî bo ravekirina mijarekê, jî bo çareserkirina pisgirêgekê yan jî hişyarkirin û şîretan hatîye nivîsandin bi cûreya *Nameyê* tê nasîn. (Deniz, 2008, r. 15). Di dîwanên Xemkûr da gelek *Name* tînin dîtin. Bes di *Dîwana Olî* da sê name hatine nivîsandin. Yek ji wan nameyan jî bo Mela Tewfîq hatîye nivîsandin. *Name* wiha destpêdike.

*"Bi navê Xudayê sîfatên kemal,
Me pênuş bi destê xwe girtî li mal.*

*Me çend xet nivîsî li vî kaxetê,
Jibo yek bira yê xwe yê axretê" (Xursî, Helbestên Olî, r. 165).*

q. Guftûgo/Gotûbêj

Şi'ra ji teref du kesan ve hatiye honandin, ango du kesan şî'r avêtine ber hev ra *Guftûgo* tê gotin. Pêkan e ku herdû şa'ir rasteqîn bin û şî'r avêtibin ber hev, wek; *Guftûgo ya Mela û Feqî* (Zivingî, 1978, r. 895), û dibe yek jê kesekî xeyalî be. Şa'ir di xeyala xwe da bi hin şa'ir an kesayetan an dildara xwe ra axivî be. Di dîwanên Xemkûr da *Guftûgo* cihekî taybet digire. Şa'ir di xeyala xwe da bi hin kesan ra diaxive. Bi giştî 26 *Guftûgo* di dîwanan na bi cihbûne. Ji wan *Guftûgo* yan; 23 *Guftûgo* bi *Gule* ra, yek bi *Goyî* ra, yek bi *Xak* ra û yek jî bi *Cegerxwîn* ra ye. Mînaka *Guftûgo* yan li jor hate dayîn.

r. Hîcwîye

Hîcwîye jî cureyek edebî ye. Di dîwanên Xemkûr da ji hîcwîyeyên şexsî zêdetir, rexneyên civakî tîn dîtîn. Di edebiyata farsî da ji vê cûre rexneyan ra *Tenz* (Dad, 1385, r. 339) hatiye gotin. Li jêr dema em kesayeta Xemkûr ji aliyê civakî da vekolîn ewê bi berfirehî li ser vê mijarê bê sekinandin. Ji ber vê yekê, li vir em li ser nasekinin.

2. Ji Alîyê Ziman ve

Zimanê şî'rên Xemkûr ji zimanê şa'irên klasîk cuda ye. Di helbestên wî de berovajî şa'irên klasîk, bêjeyên farsî û 'erebî gelekî hindik in. Heta ji Xemkûr hatiye kurmançî bikar anîye. Hin bêjeyên 'erebî hebin jî, ji bêjeyan bêtir têgehên dînî ne, wek; *Rehman, Rehmet, Subhan, Zikir*. Ev cûre têgeh gelek caran ji bo wezna şî'rê hatine bikaranîn. Lewra em dibînin di heman malikê da wateya bêjeyê bi kurdî jî heye. Wek Mînak;

"Ji *kufrê* re neyar e her '*eduw* we,
Musulmanan di bexşîne, 'efuw we" (Xursî, Helbestên Olî, r. 42).

Wek xalek sereke di şî'r û dîwanên şa'irên klasîk da bêjeyên razber zêde tîn dîtîn. Xemkûr xwe ji bêjeyên razber dîr kirîye. Li dewsa bêjeyên razber bêjeyên şênber bikar anîye. Bi vî rengî ji alema şî'rê ya razber derdikeve û dinya û hestên xwe bi bêjeyên şênber û halê rasteqîn vedibêje. Teşbîh û îstîfeyên şî'rên wî bi sedema bêjeyên şênber çêjek taybet dide mirovan. Bi van taybetiyên xwe dibe şa'irekî realîst. Wek Mînak:

"*Bê zar û girtî û dîl im, li nav koma neyara
Cerg û dev û lêvê min, ziwa bûne'j hewara*

*Jîna min hemî borî, li ber hêt û dîwara
Ta kengî dê rizgar bim, ji destê dilgemara"* (Xursî, Evînnamê, r. 10).

Xemkûr ji bedêla mezmûn û têgehên edebiyata klasîk ku bi piranî ji bêjeyên erebî û farsî pêk tîn têgehên Kurdî xistîye cihê wan. Wek mînak; ji dêleva *Çeşmên Cadû* û *Reştûz ê Awirên Mêrkuj*, ji dêleva *Xeram ê Meş Qitik* û ji dêleva

Dêm ê Hinark bikarhatîye. Bi vî şiklî hem ji helbestvanên klasîk vediqete û hem têgeh û teşbihên resen çêdike.

Di şî'rên Xemkûr ên ku dikevin qada edebîyata millî, modern û gelerî da zimanê rojane hîn bêtir dixûyê. Xemkûr zimanekî sivik bikaranîye. Ziman, xwerû û vekirîye. Ji axaftina rojane ya gel hatîye wergirtin. Ji ber vê yekê şî'rên Xemkûr bi hesanî tèn fêmkirin. Em ji edebîyata millî mînakekê bidin.

*"Porê min tev bû hirî
Temen borî bi girî
Lewre kerên bê terî
Ketin bexçê bi herî.*

*Bexçe bû gêra kera,
Cî me nema'l van dera,
Em belav bûn her dera,
Ta Ege û Marmara"* (Xursî, Ger û Geşta Min, r. 47).

Ji alîyê kurmancî va zimanê wî dewlemend e. Hin bêjeyên di nav gel da kêmtên axaftin di şî'rên wî da tèn dîtin. Wek mînak; ji bo *Edebê Pûşil*, ji bo *Sîyasetê Ramyarî* û ji bo *Terbîyeyê Şerde* bikar anîye. Ev jî, bûye dewlemendîya zimanên şî'rên wî. Armanca wî ya sereke bi vê şewazê pêşxistina zimanê Kurdî ye. Ji bo pêşxistina zimanê Kurdî û belavkirina bêjeyên Kurdî hîlbijartinek enqest tèn dîtin.

Nivîsandina ferhenga di dawîya dîwanan da xalek girîng e, hem ji bo famkirina helbestan û hem ji bo pêşketina ziman. Dema dîwan an dîwançe tèn çapkirin, ji teref weşanxaneyan an ji teref amadekaran va, ferheng li dawîya wan tèn bicih kirin. Carinan jî di dawîya rûpelan da wek jêrenotan wateyên bêjeyan tèn dayîn. Bi taybet ev ferheng ji bo bêjeyên bîyanî ne. Lê Xemkûr hem wî bi xwe ferhengên şî'rên xwe amade kirîye û hem ferhenga wî ji bo bêjeyên Kurdî ne. Ev taybetî di nav şa'iran da nayête dîtin. Bi vî rengî hem bi şî'rê xwe û hem bi ferhengên xwe yên di dîwanên xwe da xebatek girîng ji bo bikar anîn, fêrbûn û pêşketina zimanê Kurdî kirîye.

3. Ji Alîyê Civakî ve

Xemkûr dilsozekî civakê ye. Dilsozîya wî ji du hêlan ve dikare bê vekolîn. Yek, alîyê dînî û yek alîyê sinc û çandî. Xemkûr, kesayetekî alim û zana ye. Di medreseyan da xwendîye. Haya wî ji bîr û bawerî û pêdivîyên dînî heye. Kiryarên tèn kirin û gotinên tèn gotin ji bo dîn guncav in an dijî dîn in, bi asanî dikare ji hev veqetîne. Bi zanebûna xwe û bi bîr û bawerîyên xwe, şêx û melayan rexne dike. Ev rexnekirin ne dijbertîya mela û şêxan e. Lewra em dibînin pesnê hin şêxan jî daye. Rexneyên wî li ser kiryar û gotinên dijî dîn, bîr û bawerîyên ne li gorî dîn û li ser çewtî û xwarîyên li ser navê dîn tèn kirin hatine kirin. Di Şî'rek xwe da poetîka xwe ya rexneya li hember şêx û melayan wiha tîne ziman:

"Bibê; rexnê me bo yên xapînok in
Pirêza wan ne pak in pêkenok in

Ne bo şêx û melayê rind û pak in
Di nav gel de diîsin wek mirak in" (Xursî, Helbestên Olî, r. 13).

Di şî'ra Şêxê Nexwendî da derbarê şêxên nexwendî, kesên ku agahiya wan ji dîn û tesewifê tune, bi cil û bergên xwe gel dixapînin wiha dibêje:

"Zatek me dî tac li serî
Çav û birû tev kilkirî
Gopal li dest rih şehkirî
Qaşo şêxê terîqetê.

Kêfa li şêx li Mîr tune
Çav dilîzin mîna cin e
Keramet û xwendin tune
Kes nabîne vê sosretê" (Xursî, Buxçika Bûka Dilgirtî, r. 142).

Ji bo şêx û melayên bi 'ilmê xwe kiryarên xwe dikin, ji civakê ra rêbertîyên dikin, peywîrên xwe bi cih tînin pesindarîyê dike. Ev yek bi me dide zanîn ku rexneyên wî li hember kiryar û gotinên şaş û çewt in. Wek Mînak:

"Şêx Maşûqê weke gul
Barê giran hilda mil

Jibo Xemkûrê xursî
Bû dermanê dilê kul" (Xursî, Evîna Bê Mîraz, r. 18).

Li ser çewtî û xwarîya since, dijî dîn û civakê gilî û gazinên xwe anîye ziman. Bê şermî û bê fedîtî, belavbûna tolazî û nemabûna namûsê gilî û gazinên sereke ne. Li ser vê rewşê nêrînen xwe yên li bajarê Antalya wiha ristîye:

"Gelek jê xort û qîz in
Li nav derya dilîzin

Nîne exlaqên olî
Lê pirin tog û tolî

Hemî ne ku bi mahr in
Lê wek maran bi jahr in

Rexên derya xîz û tav
Keç û xort tev diçin nav

Nêr û mê pev diarin
Agir li wan dibarin

Yek dibe dik yek mirîşk
Çîpan li hev dikin îşk

*Misilman in, kafir in
Ji hev nayên naskirin*" (Xursî, Ger û Geşta Min, r. 3).

Xemkûr piştî ku rexneyên xwe dike, çareserîya pirsgerêkan jî destnîşan dike. Çewtî û şaşî bi çi reng û şêwazê pêwîst e ji holê bîr rakirin, li gorî çanda gel tîne ziman. Di şî'ra *Jinika Parsek* da parskirina jinan rexne dike. Bi vê rewşê, bi parsektîya jinek ciwan gelek xemgîn dibe. Piştî rexneyên xwe çareserîya pisgirêkê nişan dide.

*"Weke wê pirin, parsek û gerok
Ka em bi pirsin, çîye naverok*

*Bi malbatên xwe, ku ew netirsin
Dê ew bexîret, ji kê bitirsin*

*Divê ku malbat, bibin yek li wan
Weke rihsitîn êriş bikin wan*

*Bigrin, girêdin, destê wan bi ben
Heta wan bikin pepûk û reben*

*Jinikê wan jî, ji wan bistînin
Ta sozek bi cî, ji wan bistînin*

*Nigê wan têkin, cihekî asê
Da ku jinên xwe, neşînin parsê*

*Çima dê jinik, bi pars û pûsê
Xwedî kin mêrên, dûrî namûsê*

*Ber bi xebitin, çi kar bi dest ket
Çi pir çi hindik, ji Xwedê berket*" (Xursî, Ger û Geşta Min, r. 64).

Xemkûr, ji civakê ne dûr e. Hemû rewş û bûyerên di serê civakê da derbas dibin çî dîrokî, çî sîyasî û çî çandî şopandîye û kirîye mijarên şî'rên xwe. Nezanîya gel, hejartîya millet, nexwendin, bêtifaqî, bindestîya jar û xizana, zordestîya çîna dewlemendan, mafên jinan, Komkujiya Helepçeyê û erdhêja Wanê rengên xwe didin malikên Xemkûr. Li ser erdhêja Wanê di şî'ra bi sernavê *Karesata Wanê* da, malikên xwe wiha dirêse:

*"Werin bibinin, şarê Wana min
Hûnê nas bikin, hemû jana min*

*Karesata hat, serê wana min
Dil hemî sotin, bê yên stemkar*" (Xursî, Buxçîka Bûka Dilgirtî, r. 82).

Encam

Helbet ev xebat di çarçoveya nivîsarekê de hate amade kirin. Loma bi tefasîl derfet tune ku wesf û taybetîyên helbesta Xemkûr bi hûrgulî were dayîn. Bi vê nivîsarê qesta me ya sereke bi hemû alîyan û bi kurtasî nasîn û danasîna Xemkûr û berhemên wî bû. Helbet em di wê bawerîyê da ne ku divê xebatên piralî û lêkolînê li ser vî helbestvanî were kirin. hêvî heye ku ev gotar bibe pêngaveke biçûk ji bo xebatên fireh.

Hemû berhemên Xemkûr bi kurdî/kurmancî ne. Ev jî berovajî tradîsyona ‘alimên kurdan e. Lewra bi gelemperî helbestkarên kurd ên klasîk bi hin zimanên din jî nivîsandine.

Xemkûr di vê serdemê da, bi zimanekî sivik û rojane û klasîk şopînerêkî Cegerxwîn û Tîrêj e ku ew jî piştî xwe didin Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û Ehmedê Xanî.

Rûpelên berheman ên ku me di nava nivîsarê da dane hemû di forma A4ê da hatine amadekirin. Helbet dema ku bêne çapkirin, hêjmara rûpelan dê zêdetir bibe.

Xemkûr xwestîye ku kurdî di her qadeke jîyanê da were bikarhatin. Loma wî *Telqîna Mirîyan* nivîsiye û ev telqîna xwe li ser gelek mirîyan jî xwendîye.

Xemkûr him bi awayê pexşan û him nezm berhem nivîsiye. Di herdu cureyên nivîsînê da jî serkeftî bûye, lê di helbestê da bêtir şareza ye.

Xemkûr xwedîyê ‘eqîdenameyeke menzûm e ku tradîsyona vê cureyê digihije Ehmedê Xanî. Gelek ‘alimên kurdan bi vê cureyê berhem nivîsandine. Xemkûr jî xwe bêpar nehiştîye.

Xemkûr xwedîyê mewlûdeke menzûm û xweser e ku serkirdeyê vê cureyê di edebîyata kurdî da Melayê Bateyî ye. Gelek ‘alimên kurd bi vê cureyê berhem nivîsandine. Xemkûr jî xwe bêpar nehiştîye. Lê şewaza Xemkûr şewazeke nû ye, heta ku jê hatîye xwe ji peyvên bîyanî dûr xistîye. Xwestîye bi zimanê rojane yê gel binivîse û nîşan daye bi vê helwestê uslûba nezmê jî têk naçe.

8 dîwanên Xemkûr hene. Bi vê hecmê di edebîyata kurdî da pir mînak tune ne. Eger em Cegerxwîn û Mela Ehmedê Nalbend jê derxin, Xemkûr dibe sêyem kesê ku xwedî pir-dîwanên kurdî ye.

Hemû berhemên Xemkûr li ber destê wî ne, yek jî heta niha nehatîye çapkirin.

Di berhemên dinî-didaktîkî da bi taybet di berhema Pêdivîyên Ol û Dînê Îslamê dahelbestvan di bin bandora Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî da maye.

Sîstema amadekirina dîwanên Xemkûr, sîstemeke têkûz e. Naveroka helbestên xwe amade kirîye û li gorî alfabeya latînî hemû helbest rêz kirine. Di gelek berhemên xwe da jî ferhengoka kurmancî-tirkî amade kirîye.

Helbestên sîyasî ango helbestên di xizmeta têkoşîna kurdan da komeke girîng digire. Xemkûr gelek caran helbesta xwe xistîye xizmeta bawerî û ramana xwe ya dinyewî.

Helbestên Xemkûr nerm in. Ango Xemkûr di helbestê naqîre. Şayik û bi hurmet tevdigere. Mijar çiqas tund be jî ew bi dilnizmîyê nêzîkî mijarê dibe û zû bi zû pênuşa xwe ya nazik hêrs nake. Bi vî uslûba xwe ya nerm ji Cegerxwîn vediqete.

Em dikarin bêjin Xemkûr, di pexşanê da uslûbeke siruştî, rojane, gelane û xweser heye. Ji bo berhemên menzum-dîdaktîkî bandora Aqtepi û Bateyî eşkere ye. Di helbestan da jî Cegerxwîn û Tîrêj du kes in ku zêdetir bandor li ser Xemkûr kirine.


Çavkanî

- A. Mermer, S. Deniz, Y. Bayram, L. Alici, M. Eflatun, N. K. Keskin. (2014). *Üniversiteler İçin Eski Türk Edebiyatına Giriş*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Artun, E. (2017). *Dinî - Tasavvufî Halk Edebiyatı (Edebiyat Tarihi/Metinler)*. Adana: Karahan Kitapevi.
- Aykanat, T. (2013). Cevrî Dîvân'ı Örnekçesinde Edebî Türler. *A. Ü. Türkîyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, Sayı 50, Erzurum*, 47-64.
- Cegerxwîn. (1992). *Kîme Ez*. İstanbul: Deng.
- Çelik, H. (2015). Bendi Mustafa Baba Divanında Edebi Tür ve Tarzlar. *Uluslararası Türkçe Edebiyat Kültür Eğitim Dergisi Sayı: 4/1*, 443-464.
- Dad, S. (1385). *Ferhengê Istilahatê Edebî, Wajername ê Mefahîm û Istihataê Edebî, Farsî û Ewrûpaî*. Întîşaratê Morwarîd: Tehran, Îran.
- Deniz, S. (2008). Kadızâde Mehmet İlmî'nin Sultan IV Murad İçin Yazdığı Duânâme'si. N. Öztoprak içinde, *Divan Edebiyatı Araştırmaları Dergisi 1* (s. 9-40). İstanbul: Dev.
- Dilçin, C. (1992). *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları sayı 517, 2, Baskı, Türk Tarih Kurumu Basımev.
- el-Qeyrewanî, İ. R. (1907). *el-'Umdetû Fî Mehasîniş-şi'rê we Adabîhî*. Qahîre: Daru's-Se'adet.
- Ergün, Z. (2018). Newroz û Cureyê Newroznameyê di Edebîyata Kurdî ya Nû de. *Dil Bilimleri (Klasik Sorunlar-Güncel Tartışmalar)* (s. 330-345). Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.
- Ertekin, M. Z. (2015). *Biyografiyeke Menzûm-Siltan Şêxmûs (Metn û Lêkolîn)*. Van: Lorya.
- Fesaî, R. M. (1380). *Enwa'ê Şi'rê Farisî*. Şîraz, Îran: Întîşaratê Nuwêd.
- Gemi, A. (2018). Çend Agahî Derheq Jiyana Feqe Reşîd û Sirru'l-Mehşer a Wî de. *Nûbihar Akademi*, h 9, r 127-145.
- Güzel, A. (1999). *Dinî-Tasavvufî Türk Edebiyatı El Kitabı*. Ankara: Akçağ.
- Hemdîn Şero, I. S. (Bê Dîrok). *Wêjeya Kurdî-Amadeyî 3*. Sûrî: Desteya Perwerde û Fêrkirinê.

- Îbrahim, Î. (2016). *Rengvedana Dîroka Kurdî Di Helbestên Cegerxwîn De*. Mardîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind.
- Kardaş, S. (2013). Cem Sultan'ın Cemşîd ü Hurşîd Mesnevisinin Edebi Tarzlar Açısından Değerlendirmesi. *Turkish Studies - International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume 8/1*, 1899-1909.
- Kınay, N. (2016). Edebî Türler Ve Tarzlar Bağlamında Lârendeli Hamdî'nin Leylâ İle Mecnûn Mesnevisi Üzerine Bir İnceleme. *Erzincan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi (ERZSOSDE) ÖS-III*, 257-270.
- Newayî, M. (2018). *Mela Elîyê Teremaxî (sedsala 16-17), Tesrîfa Teremaxî – Yekemîn Gramera Kurdîya Kurmancî-*. İstanbul: Nûbihar.
- Nîkobext, N. (1389). *Tehlîlê Şi'rê Farsî*. Tehran: Semt.
- Şukr, E. (91). Hikmet Der Nîgahê Mufessiranê Quran û Feylesofan. *Fesilnameê Felsefe ve Kelamê İslamî Ayîneê Me'rîfet, Danişgahê Şehîd Behîştî, Tabistan, İran*, 27-46.
- Tîrêj. (2014). *Dîwan (Xelat-Zozan-Cûdî)*. Stenbol: Peywend.
- Xeznedar, M. (2018) Ehmedê Nalbend, Ji Soranî Werger: Zîya Avci, *Kovara Nûbihar*, Havîn, Hejmar 144, 44-48.
- Xursî, X. (Destxet). *Dîwan-1- Helbestên Olî*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Dîwan-2- Buxçîka Bûka Dîlgirtî*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Dîwan-3- Evîna Bêmiraz*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Dîwan-4- Evîname*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Dîwan-5- Ger û Geşta Min*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Dîwan-6- Kulîna Nivîna*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Dîwan-7- Tûrikê Kul û Derdan*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Dîwan-8- Welatê Wêran*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Mewlûda Kurdî*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Pêdiviyên Ol û Dîne İslamî (Eqîda İmanê)*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Pîrs û Bersivên Ol û Dîne İslamê*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Telqîna Mirîya*. Berhema Neçapkirî.
- Xursî, X. (Destxet). *Wêranbûna Dinyayê û Avabûna Axretê*. Berhema Neçapkirî.
- Zivingî, M. E. (1978). *El- 'Iqdu'l-Cewherî fî Şerh-î Dîwan'îş-Şeyxi'l Cezerî*. Dimeşq: Çapê Duwem, Metbe'etî Sebah.

Pêvek

1- Destpêka beşa yekem û beşa dawî ji *Mewlûd* ê



SEKNA RÊZGIRTINÊ

Tu bi xêr hat, fermanarê dewletê,
Tu bi xêr hat, bendikarê ummetê.

Tu bi xêr hat, destegirê birçî'yan,
Tu bi xêr hat, rûmetdarê sêwî'yan,

Tû bi xêr hat, yekeminê musulman.
Tu bi xêr hat, ronîya dîn û îman.

Tû bi xêr hat, ya îmamê enbiya,
Tu bi xêr hat, dawîdarê enbiya.

Tu bi xêr hat, dijberê zilmdarî yê.
Tu bi xêr hat dijî koledarî yê,



Tu bi xêr hat, ronîya her tarî yê,
Tu bi xêr hat, pêşengê rizgarî yê.

Tu bi xêr hat, ey Resûlê rind û çak,
Tu bi xêr hat, rêberê vî dînê pak.

Tu bi xêr hat, dawîya peyxamberan,
Tu bi xêr hat, rû nehişt bo peykeran.

Tu bi xêr hat, dijberê serdestîyê,
Tu bi xêr hat, dijberê zordestîyê.

2- Rûpelên pêşî û dawî ji Pêdiviyên Ol û Dîne Îslamî (Eqîdename)



3- Rûpelê pêşî û paşî ji Telqîna Mirîyan


Telqîna Mirîyan
Bîsmillahirrehmanirrehîm

Elhemdu lillahi rebbil'âlemin, wesselat u wesselamû Êla xeyrî xelqihî Mûhemmedin we ela alihi we sehbihî ecmeîn.


Ya keça yan ji kurê filan kes û filan kesê! tu zanibe ku ji Xwedayê dilovan pêve tu kes zindî namînin, hemû kes dimirin, tunne dibin û çavên xwe li jiyane digirin. Lê mirina herî bi rûmet ewe ku, mirov xwe ji nebaşîyan bi parêzin û xwe ji çûyina bihiştê re amade bikin. Lewre girîngiya jiyana dinyayê, jilbo amadekariyên axretê ye.

Ya keç yan ji kurê filan kes û filan kesê! Xwedayê dilovan em ji axê afirandine û ewê disê me bimirîne bike êmê kurm û kèzên binê vê axê û ewê disê me ji gorên me rake û hesabê tiştên ku me li dinyayê kirine bi me re bibîne.


Ya keç yan ji kurê filan kes û filan kesê! (3-caran) tu bi destûra Xwedê, bi xêr û bereketa navê Xwedê, li ser bawerîya bi Xwedê û li ser navê Umme'ta Mûhemmed êlehisselat û wesselam li nav me veqetîya ye û derbasî mala xwe ya yekemin a Axretê bûye.



6- Bergê Dîwanê û dawîya ferhengê ji dîwana *Evîna Bê Miraz*



7- Helbesta yekem û rûpelê dawî ji dîwana *Evînname* yê



8- Helbesta yekem û rûpelê dawî ji dîwana *Ger û geşta Min*

ANTALYA Antalva gelkî xweşo. Erdek raste bi nexşo. Hêlek derya yek çiya. Ne cê jar û birçiya. Nine cî yê me jara. Li wî şar û bajara. Hemû qesr û qonaxin. Bi derya û bi avin. Bi kelek û bi keştî. Weke kincê nû şuştî. Cî yê seyran û geştê. Bi mirovan pir xweş tê. Der kolanan şîr dikin. Ciwan gula bîn dikin. Şêrinê xew revinê. Warê eşq û evinê. Geş dikin derya sipî. Pir ciwan û rih sipî. Gelek jê xort û qizin. Li nav derya dilizin.	WER WELATÊ XWE KURO 132 FERHENGOK 133 NAVEROK 176 Bi giştî pêncî û yek helbst (51)
--	--


3 179

9- Berg û dawîya naveroka diwana *Kulîna Nivîna*


KULÎNA NIVÎNA NIVÎSKAR XEMKÛRÊ XURSÎ	ŞERRÊ ŞÊR Û GUR 201 TEW LOLO TEW 207 TU BÛKE EZ JI BERBÛ ME 209 TU NEHAT VA EZ HATIM 212 UMÛD GUNULTAŞ 213 ZANIM PEYWBREK JI ME TÊ XWESTIN 215 FERHENGOK 217
---	---

257

10- Berg û helbesta dawî ji dîwana *Welatê Wêran*



11- Berg û dawîya ferhengokê ji dîwana *Buxçika Bûka Dîlgirtî*



12- Rûpelê pêşî û paşî ji berhema *Pirs û Bersivên Ol û Dîne Îslamê*

<p>بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ</p> <p>Me hewl da ku di warê ol û dîne Îslamê de; alikariyek zanistî bi biçûkên xwe yên kurdan re bikim. Piştî xebat û lêkolînek dirêj me pirtûkek biçûçik bi navê pirs û bersivên olî ji biçûkên xwe kurdan re amade kir û pêşkêşî wan kirin.</p> <p>Em hevî dikin ku hinek ji biçûkên me kurdan jî; ji van pirs û bersivên kurt sûd wergerin û nezan nemînin. Ked û xebat jî me û alikarî jî ji Xudayê dilovîn û dilovan.</p> <p>بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ</p> <p>الحمد لله رب العالمين والصلاة والسلام على خير خلقه محمد وعلى آله وصحبه أجمعين أما بعد</p> <p>BEŞA YEKEM: BÎNGEHÊN OLÎ YÊN SEREKE</p> <p>1-Ol û dîn çîye û çend cûrene?</p> <p>Olû Dîn: Xudayê dilovan; Hemû esasên ku mirovên aqilmend "li danya û axretê" bi wan dighêjin başî û bextewariyê ji pêxemberan re peyxam kîrine.</p> <p>ÇEND CÛRE OL Û DÎN HENE?</p> <p>Sê Cûre ol û dîn hene:</p> <p>1-Olû Dînê heq: Ev ol li ser esasekî mayende bi navgîna pêxemberan (tebliğ) û danezanî li mirovan buye. Mînak</p>	<p>204-Hinek tişteki binin gund yan bajarekî da ku bi peryê hazir bifroşin û xelk jî muhtacê wî tiştî bin; mirovek jî ji wanre bibêje ku li cem min deynin da ku ez hin bihin ji qîmetê hazir bi bihayekî zêdetir bifroşim.</p> <p>205-Bê neta kirinê nîrx û bihayê tiştan zêde bikin.</p> <p>206-Heywana bi şîr nedoşe heta guhanê wê tijî şîr bibe û paşê derxe firotinê. Da ku xelkê bi guhanê wê bi xapîne.</p> <p>207-Goştê heywanên xwarina goştê wan heram bixun. Çavkani: التحف العلابية Ettuhfetulalabiyyet (s.131-138)</p> <p>Subhane rebbîke rebbilizzetî emma ysfûn we selamun elelmurselîn welhemdû lillahi rebbilâlemin.</p> <p>سُبْحَانَ رَبِّكَ رَبِّ الْعَزَّةِ عَمَّا يَصِفُونَ وَسَلَامٌ عَلَى الْمُرْسَلِينَ وَالْحَمْدُ لِلَّهِ رَبِّ الْعَالَمِينَ</p> <p>Nivîskar: Mehemed Helîm ê xursa Hefîxwehan. Qoser/ Mêrdîn.</p>
--	---

13- Wêneyek Xemkûr







Makale Gönderim Tarihi: 29.04.2019

Makale Kabul Tarihi: 29.07.2019

CÎYÊ FONETÎK, FONOLOJÎ Û GRAMERA DEVOKA XERZAN DI NAV DEVOKÊN KURMANCÎ Û DÎYALEKTÊN KURDÎ DA

Ayhan YILDIZ*

KURTE

Hudûdên devoka herêma Xerzan, ji hudûdê bajarê Bidlîsê dest pê dîke, heta hudûdê Mûş, Dîyarbekir, Sêrt, Batman û Mêrdînê dewam dîke û digehê heta sinorê devoka Torî ku di nav sinorên Mêrdînê da cih digire. Devoka Xerzan, di dirêjahîya domahîya dîrokê da neçar maye ku di bin desthilatdariya dewletên curbicur da bimêne. Her çiqas zemanê berê li herêma Xerzan nufûsa ermenîyan jî hebûye, bes îro tenê şênîyên ku bi erebî, kurmancîya jor û kirmanckî/zazakî/dimbilkî dipeyivin li vir dijîn. Zemanê ku ermenî li vir hebûn, dinî Îsewîyan jî hebûye; lêbelê îro tenê muntêsîbên dinê Îslamê ku li ser mezhebê Sunnî-Şafîî ne li vir dijîn. Di vê xebatê da taybetmendiyên devoka Xerzan û dîyaleketa kurmancîya jêrîn û devokên din ên kurmancî yên mîna devoka Torê, Mêrdîn, Dîyarbekir û Serhedê digel hev hatine berawirdkirin. Li ser bingehe hewl hatîye dayîn ku tesbîta karakterên hevbeş ên devoka Xerzan û dîyalektên din, digel ên kurmancîya jêrîn bihê kirin.

Bêjeyên Sereke: Herêma Xerzan, Fonetîk, Fonolojî, Devok, Dîyalekt, Kurmancî

* Ögr. Gör. (Pey. Fêr.) Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı. ayhanmeretowar21@gmail.com, Orcid: 0000-0002-8763-4182

**Garzan Ağzının Fonetik, Biçimbilim ve Dil Bilgisinin
Kurmançî Lehçesinin Ağzlarında ve Kürtçenin
Lehçeleri Arasındaki Yeri**

ÖZET

Garzan ağzı sınırları Bitlis ili sınırından başlar, Muş, Siirt, Diyarbakır, Batman ve Mardin sınırlarına kadar devam eder. Mardin bölgesinde yer alan Tori bölgesine kadar genişleyen Garzan ağzı, tarih boyunca çeşitli devletlerin egemenliği altında yaşamak zorunda kalmıştır. Garzan bölgesi, önceleri Ermeniceyi konuşan nüfusu olmasına rağmen, günümüzde Arapça ve Yukarı Kurmançî ile Kırmanckî/Zazakî konuşan bir nüfusa sahiptir. Ermenilerin burada yaşadığı dönemlerde Hıristiyanlık dini de burada yaygın olmuştur da, bugün sadece İslam dini ve Sünnî-Şafî mezheb müntesipleri burada yaşamaktadır. Bu çalışmada Garzan ağzının özellikleri, nasilki Aşağı Kurmançî lehçesiyle karşılaştırılmış, Kurmançî'nin Tor, Mardin, Diyarbakır ve Serhad ağzlarıyla da karşılaştırılmıştır ve ortak olan karakterlerinin tespit edilmesine çalışılmıştır.

Anahtar Sözcükler: Garzan Bölgesi, Fonetik, Fonoloji, Ağız, Lehçe, Kurmançî

***The Place of Phonetic, Morphology and Grammar of
Garzan Sub-dialect Among Other Sub-Dialects of
Kurdmançî Dialect and Other Dialects of Kurdish***

ABSTRACT

The borders of Garzan sub-dialect start from Bitlis province and reaches to the borders of Muş, Siirt, Diyarbakır, Batman and Mardin provinces. Garzan sub-dialect that reaches to Tori area of Mardin province has been under the sovereignty of different states through the history. Though there have been Armenian speaking community in the Garzan area in the past, there are only Arabic, Upper Kurmançî, and Kırmanckî/Zazakî speaking communities at the present. In the times that Armenian were dwelled, Christianity were common in the Garzan area, however, today there are only believers of Sunnah-Shafî sect of Islam live there. In this study we compare the features of Garzan sub-dialect with Kurmançî dialect as well as with the Tor, Mardin, Diyarbakır and Serhad sub-dialects of this dialect.

Key Words: Garzan area, Phonetics, Phonology, Sub-Dialect, Dialect, Kurmançî

Destpêk

Herêma Xerzan, bi taybetiyên xwe yên devokî ji devokên din ên dîyalekta kurmançî cîya dibe. Ev rewşa wê ya cîyawaz, helbet, bi rabirdûya wê ya sîyasî û dîrokî ve têkildar e. Ji ber ku kurmançî û erebî li vê herêmê, bi taybetî jî li navend û gundên derdora qezaya Sasonê û Hezoyê di nav hev da dijîn, bivê nevé karîgerîya vê pevrebûnê teyîsiye ser vê devokê. Berî ku em dest bi taybetmendiyên devokê bikin, em pêşî dest bi dîroka wê ya sîyasî bikin, li gor qenata me dê çêtir be.

Herêma Xerzan ku ji gelên cîya cîya û ji dewlet û dînen cîya cîya ra malovanî kirîye, çawa ku ketîye bin karîgerîya van çand û şaristanîyan, wisa jî helbet ji hêla zimanên wan ve jî reng û rû girtîye. Dibe ku fonetîka vê devokê, ketibe bin bandora fonetîka van zimanan. Meriv bi hêsanî dikare dîyar bike, çawa ku fonetîka hemû devokên bakur ketine bin tesîra fonetîka zimanê tirkî, helbet zimanê erebî ku li vê herêmê aktîf e, dibe ku karîgerî li fonetîka wê kiribe.

Çawa ku fonetîka kurmancî di devoka herêma Xerzan da diguhere, zayenda bêjeyên navdêr jî bi temamî ji hemû devokên din ên kurmancî cîya bûye, hema mîna kurdîya babanî zayenda hemû cure bêjeyên navdêr bûye wekî hev. Bêjeyên mîna “dayk”, “xwişk” û “met” ku zayenda wan makî ye, di devoka kurmancîya Xerzan da gişt bi awayê nêrî dikevin îzafeyan.

Cihderka dengdêra “a”yê di devoka Xerzan da ji aliyê fonetîkê ve bi temamî dişibe kurdîya babanî/naverast. Axiverên vê devokê, tîpên xwe yên nedengdêr, mîna nedengdêrên kurmancîya jêrîn bi awayekî çist û çeleng bi lêv dikin. Kurmancîya Xerzan ji aliyê fonetîka dengdêrên xwe ve çawa ku dişibe devoka Torê, bi pareke pirtir dişibe fonetîka kurmancîya xwarê/jêrîn.

Rêbaza Lêkolînê

Devoka Xerzan ku bi awayekî balkêş dişibe dîyalekta kurmancîya jêrîn û di nav hemû devokên din ên kurmancîya jorîn da xwedî cîyekî xweser e, bi çî awayî ketîye vê rewşê, kengê bi zayenda navan ji devokên din ên kurmancî veqetîyaye, ji ber çî sedemê dişibe dîyalekta kurmancîya jêrîn, hêjayî lêkolînê bû. Bi qasî ku pê hisîyame, li ser vê devokê xebateke zimannasî nehatîye kirin. Ji ber vê çendê armanca min bi vê lêkolînê ew e ku bi qasî taqeta xwe hîn bibim bê ka ev devok xwedan çî taybetîyan e, bi çî awayî teşe girtîye û heta roja me berdewam kirîye.

Agahîyên derbareyê fonetîk, teşenasî, gramer û sentaksa devoka Xerzan ku di vê gotarê da behsa wan hatiye kirin, ji wan daneyên xebata qadî ku min bi xwe berhev kirine, peyda bûne. Digel ku ez şênîyekî vê herêma devoka navbangî me jî, dîsa min dengê axiverên vê devokê qeyd kirine û a niha qeydên wan li ber destê min mewcûd in.

Di vê xebatê da min ji rêbazên zimanî yên zanistî, ne rêbaza dîyakronîk; bes rêbaza senkronîk bingeh girt. Çawa ku Bingöl (2017: 90) amaje pê dike, ji bo rêbaza dîyakronîk, pêdivî bi metnên qedîm ên berê hebû. Çî heye ku tu deqeke/metneke nivîskî ya berê bi destê min neket. Ji lew ra taybetmendiyên devoka Xerzan ku min hewl da tesbîta wan bikim û bi devok û dîyalektan ra berawird bikim, tenê yên xasî bi axaftina roja me ne.

1. PÊNASEYÊN BÊJEYÊN TAYBET ÊN HERÊMA XERZAN

1.1. Bêjeya “Xerzan”

Koka bêjeya *Xerzan*, li gor qenaeta min ji غرز an ji غرض “xerz” ango “gherz” tê. Digel ku di zimanê erebî da bêjeya غرض “xerez” heye û wateya wê “qesd” e û ev her du bêje dişibin hev jî, ji çavkanîyên dîrokî dîyar dibe ku guhertoyeke wê ya din jî heye. Li gor M. E. Zekî, têkilîya bêjeya *Xerzan* û *Erzen* digel hev heye (1945, بگ: 369). Li gor komisyona akademisyenên Universîteya Atatürk a Erzurumê qeyd kirîye jî, têkilîya vê bêjeyê, bi bêjeya “erzen” ra heye: “Di pey sedsala 4an da, li ser parvekirina herêma Erzen, Pers û Bizansî ketine şer û herban. Ev şer, heta dawîya sedsala 5an domîyane. Di vê serdemê da

Bîzansîyan, ji bo parastin û berterefkirina êrişên li sêkoşeya Sason, Hezo û Bedlîsê, gelek keleh ava kirine (Komisyon, 2011). Keleha bi navê *Rebetê* li gundê Yanikkayayê/Smayilkayê dimêne. Ev dever, 18 km. dûrî navçeya Kozluk/Hezoyê ye û li bakurê wê ye.”

1.2. Bêjeya “Hezo”

Kurmancên vê deverê, bêjeya “Hezo”yê bi awayê herfa ح ya erebî û ز (zeyna)ya erebî bi lêv dikin: حزو. Heger em li bêjeya قاضي ya erebî binihêrin, em dê bibînin ku gelê tirk vê bêjeyê bi awayê “kadî”; kurmanc bi awayê “qazî” bi lêv dikin. Nexwe kurmanc, herfa ض ya erebî, bi awayê “z”yê bi lêv dikin. Dibe ku ev bêjeya حمض (Hezo)yê jî wisa be. Dibe ku ev bêje, ji عزو ya erebî jî hatibe û dibe ku herfa و “û” veguherîbe herfa “o”yê.

Navê navçeya *Hezro* ku li ser Dîyarbekirê ye jî bi fonetîka xwe dişibe navê Hezoyê. Bêjeya *Hezro*, ji zimanê erebî tê û awayê wê ye *حضر* ye. Wateya wê, keskî ye. Wisa dîyar e ku ev herfa و veguherîye herfa “o”yê. Navên mîna Zoqê û Zoqeydê jî li hêla Gurdîlan hene.

2. Hudûdê Cografi yê Herêma Xerzan

Pîvherêma navçeyê, 1101 kîlometrekare ye. 69 gund û 115 mezra li ser wê ne. Di navenda wê da 25 tax hene. Ji ber ku wekî deriyekî Rojava di navbera Rojhilat û Serhedê cîyê xwe digire, di dîrokê da behsa wê bi berfirehî hatîye kirin. Herêma Xerzan wekî cografya, ji aliyê şaroşkeyan/navçeyan ve ji hêla başûr ve ji bajarokê Qubînê (Beşîrî) dest pê dîke tê Misircê (Kurtalan) û diçe heta bajarokê Hewêlê (Baykanê); ji hêla bakur ve ji bajarokê Hezo (Kozluk)ê dest pê dîke diçe digihîje heta navçeya Sasonê. Hudûdê herêmê, bi çemê Batmanê ku di navbera sînorê Dîyarbekir/Amid û Batmanê da diherike bi dawî dibe. Li hêla Bidlîs û Sêrtê jî çemê ku ji Bidlîsê tê diherike hêla başûr, bûye sînorê herêmê. Ji bakur ve çîyayê Mereto û Helqîs û Kopê, wekî sînorên siruştî yên herêmê tên zanîn.

Li gelîyê Xerzan, xiravabajerek heye ku wekî şehrekî kaviil, a niha jî li ber çavan e û lêkolînên arkeolojîk li ser wê hatine kirin. Van çavkanîyên ha, ev der wekî *şehrekî entîke* bi nav kirîye û vê agahîyê li ser wî didin. Li mezraya Yeşilyurta ku li ser gundê Oyuktaşê ya navçeya Hezoyê ye, li ber qeraxê Çemê Xerzan e, lêkolînên ser-rûyê erdê hatine kirin, kaviilên vî şehre entîke derketine holê. Îca gundikê Yeşilyurt, li ser xerabeyên Erzenê hatîye avakirin. Lewre ev gundikê Yeşilyurt, di meha çile ya 2008an da li gor Qanûna Parastina Hebûnên Çandî û Siruştî, ya bi hejmara 2863yan, wekî qada sît hatîye îlankirin. Ji Mîrektîyên tirk, Dilmaçoğullarıyan, şehre Erzen, ji xwe ra kirîye payitext. Piştî Şerê Melazgirê, begên din ên tirk, bi ser Enedolê ve cerd kirine û di pey fethên serkeftî da, Selçûkîyan, Erzen û derdora wê, weke tîmar daye Mehmet Begê Dilmaçoğlu. Wî jî, sala 1085an, li vê herêmê begîtiya xwe damezirandîye. Dilmaçoğullarıyan di dîrokê da wisan zêde deng venadebe jî, wan ev erd, maweyeke dirêj di bin

hîmayeya xwe da girtine. Akkoyunîyan, sala 1395an, ev begîti bi temami xerab kirîye. Erzen, di çavkanîyan de, ji payitextên herî mezin ên Serdema Navîn hatîye hesibandin. Di hîyama nîveka sedsala 13an de, cografyagerê navdar ê Îslamî, Îbn Şeddad, ev şehr zîyaret kirîye û dîtinên xwe wiha dîyar kirîye: “Li cîyekî berfireh ava bûye, xan û medreseyên wî hene, mufferreh e. Bi 32 bircan dormedorkirî ye.” Bi xebatên zanistî derketîye holê ku Erzen, a Îslamê ye. Erzena Îslamî, di Serdema Navîn de, yek ji wan şehrên girîng ên mîna Dîyarbekir, Mêrdîn û Heskîfê ye. Hetta tê dîyarkirin ku wê serdemê, Erzen ji hêla qada xwe ya bicihbûnê ve, ji şehrê Dîyarbekirê mezintir bûye (Komîsyon, 2011: 53-54). Wekî din, hin agahiyên ku li ser şehrê Erzenê hatine tomarkirin radigihênin ku kaviên şehrê Erzena Entîke, li gundê Yunuslara ku li ser nevçeya Misircê (Kurtalana) Sêrtê ye hene; îca ev kaviên ku li hêla gundê Hezoya Batmanê ne, beşa wî ya havîngehî ne.¹

2.1. Hudûdê Cografi yê Devoka Xerzan

Herêma Xerzan digel ku wekî cografya, ji aliyê şaroşkeyan/navçeyan ve ji hêla başûr ve ji bajarokê Qubînê (Beşîrî) dest pê dîke ber bi bakur ve tê Misircê (Kurtalan) û diçe heta bajarokê Hewêlê (Baykanê); ji hêla bakur ve ji bajarokê Hezo/Kozlukê dest pê dîke ber bi rojava ve diçe digihêje heta navçeya Sasonê jî, ji hêla “Devoka Xerzan” ve di nav sînorên van şaroşkeyan da li cîyekî lokal bi sînor dibe. Şaroşkeya Qubînê, bi devoka gund û eşîrên nav hudûdê xwe, bi temami ji devoka Hezo, Misirc, Hewêl û Sasonê cîya ye. Navenda navçeya Hezo, Misirc, Hewêl û Sasonê di nav sînorên vê devokê da ye; lêbelê navenda navçeya Qubînê, ji ber ku ji eşîrên mîna Reşkotan û Elikan pêk tê, ne di nav sînorên devoka Xerzan da ye. Digel vê jî, qismekî mezin ji şênîyên vê navçeyê, piştî salên 1980yî ji hêla çîyayên Hezoyê hatine li vir bi cih bûne û bi devoka Xerzan dipeyivin.

Çawa ku navenda navçeyên mîna Hezo, Sason, Misirc û Hewêlê, hema hema bi temami di bin karîgerîya kurmancîya Xerzan da ne, çend gundên nêzî navenda van navçeyan jî bi temami di bin tesîra vê devokê da ne. Sînorê wan gundên nêzî navenda Sason û Hezoyê ku bi devoka Xerzanîyê dipeyivin, ji 40 km.yan nabihure.

Gundên mîna Timoq, Daragûzê, Mangîk, Bariştirm, Melkîşa û Dêrayê ku li hêla rojavayê Hezo dimênin, bi devoka Hezoyê dipeyivin; bes ji sînorên van gundan pê ve gundên mîna Baqînê, Kenik, Xoxê, Mexsûdikê, Qawecî, şaroşkeya Kanîyahenê, Kanîkê, Selîvê, Zîlîya, Dêle, Hiskûtê û Şelmo ku wekî gundên eşîra Bekiran tînan zanîn, bi kurmancîyeke wisa dipeyivin ku ji hêla devokê ve bi tu awayî naşibe devoka Xerzan.

¹ Ji bo agahiyên berfireh bnr. <http://www.haberpen.com/antik-kent-iki-arada-bir-derede-kaldi-haberi/> 02.03.2015.

Li hêla navçeya Sasonê jî gundên nêzî navenda wê ne tê da, ew gundên ku li hêla herêma Xerzan dikevin û bi qasî 10 km.yan nêzî vê navçeyê jî dîsa bi devoka Xerzan napeyivin. Gundê Kanîyanavo, Kanîyaberê, Cewzîkê, Holê, Rebetê, Baqînê, Smaîlka, Kifîfê û Teraş ku dîsa bi qasî 20-30 km.yî nêzî Sasonê ne, bi temamî bi kurmancîyeke derveyî devoka Xerzan dipeyivin.

3. EŞÎRÊN HERÊMA XERZAN

Eşîra Bekiran, ji gundê Qawecî (Kahveci) ku li rojavayê başûr ê Hezoyê dikeve dest pê dike tê heta nehîyaya Kanîyahenê (Bekirhan), gundê Melkîşa, Şelmo, Xoxê/Sûcê, Baqînê, Smaîlka (Yanikkaya), Kanîyaberê, Rebetê, Dehlikê, Kifîfê, Holê û Cewzîkê. Li hêla başûrê Hezoyê ku ber bi Batmanê ve diçe, eşîra Reşkotan heye. Li milê rojhilatê Hezoyê ku ber bi Weyselqeranî û Hewêl (Baykan)ê ve diçe, eşîra Etmankan heye. Li hêla bakur, di navbera Hezo û Sasonê da, di nav çiyayên bakurê Herêma Xerzan da, eşîrên erêb ên mîna Şîgo, Bidrî, Celalî, Dêrxanî, Kendo, Şero û Şêxan hene; ji eşîrên kurdan jî eşîra Xîyan, Tîmoq, Kurrî/Xerzî û Bozikan hene (Naîma, 2018).

4. RABIRDÛYA DÎROKÎ YA SÎYASÎ Û MÎREKTÎYÊN HERÊMA XERZAN

Çawa ku Mîrektîya Xerzan hebûye, mîrên cîranên wî yên mîna Mîrektîya Sasonê, Mîrektîya Heskîfê û Mîrektîya Meyafariqînê jî hebûne. Çi heye ku di nav Mîrektîya Xerzan da tenê Mîrnişîna Hezo û Mîrnişîna Sasonê hene. Jixwe kurmancîya van her du deveran mîna hev e. Ji bo ku meriv bikaribe li ser devoka herêma Xerzan bigihêje encameke baş, helbet pêdivî bi ronkirina rabirdûya wê ya dîrokî heye. Ji lew ra li vir, me cih da vê binbeşê.

4.1. Mîrektîya Hezo

Ji ber ku di cografyayeke krîtîk û girîng da ava bûye, ev der tûşî gelek destguherînan bûye û heta serdema desthilatdarîya îslamî negihaştîye îstîqrarê. her çiqas di serdema îslamê da carina ketibe bin desthilatdarîya bîzansîyan jî, bi giştî di destê rêveberên muslim da maye. çawa ku di serdema xelîfe umer da devera cezîre ketîye bin desthilatdarîya sîyasî ya îslamî, êdî di serdema hz. usman û hz. elî da jî di destê musliman da maye. xelîfe umer (634-644), sala 17yê koçî, se'd bin ebî weqqas û 'îyaz b. xenem wekî fermandarên artêşê şand ser cezîreyê. herêm, ji ber ku di navbera çemê dicle û çemê firatê da cih digire, bi vê bêjeya "cezîre"yê hatiye binavkirin. ev dever, di nav xwe da dabeşî du herêman bûye: dîyarê misir û dîyarê bekir. li ber ava çemê dicle û firatê gelek beled û keleh ava bûne û wê serdemê di bin destê bîzansîyan da bûne. herêma dîyarê bekir, ji herranê heta ruha, reqqe, re'su'l-'eyn, nuseybîn, sincar, xabûr, mardîn, amid, meyafariqîn, mûsul û yên din pêk tê. piştî fetha şam û iraqê, xenem bin îyaz, piştî sulha ruhayê ku herran, bi fermandarê musliman ra li hev dike, êdî fermandar îyaz, eba mûsa el-eşerî dişêne ser aliyê nuseybînê; umer bin se'd jî dişêne hêla re'su'l-'eynê. îca îyaz bi xwe jî berê xwe dide hêla darayê û vê

deverê digire bin destê xwe. eba mûsa şênîyên nuseybînê ra, fermandarên din jî bi xelkê deverên din ra bi awayê herî xweş li hev dikan (2005/1426: 127-128). di pey wan da ku serdema emewî û ebbasîyan tê, dever her bi nasnameya xwe ya îslamî maye. dewleta îslamî ya xanedanê kurd merwanî jî, heta hatina selçûqîyan li vê deverê bûne desthilatdar. piştî selçûqîyan eyyûbîyan ev der girtîye bin destê xwe. piştî desthilatdarîya eyyûbîyan, heta serdema osmanîyan mîna mîrektîyên din ên herêmê, ev der jî bi awayê sîstema rêvebirina mîrektîyan bûye.

Di pey çar xelîfeyên mezin da hemû herêm, mîna Hezoyê, di salên 906an da ketîye bin desthilatdarîya Dewleta Emewî, peyre jî ya Dewleta Ebbasîyan. Di serdema xelîfetiya Ebbasîyan da Hemdanîyan di nav salên salên 906 û 990î da li vê derê hukum kirîye. Di pey wan da Merwanîyan di nav salên 990 û 1096an da li herêmê xanedanîyeke dewletî ava kirîye û li vê deverê hukum kirîye. Tugrul Begê Selçûqî di nav salên 1056 û 1057an da tê serfera herêmê û wê dixê bin destê Selçûqîyan. Sultanê Selçûqî Melîkşah, piştî ku payîtexta duyem a Merwanîyan Silvanê sala 1085an dixê bin destê xwe, kelehên din ên mîna Mêrdîn, Sêrt, Erzen û Heskîfê û dormedorên wan jî dibin tabîê/peyrewê wan (Sevim & Yücel, 1989: 93). Muhtemelen devera herêma Xerzan, kelehên Sason û Hezoyê jî wê hingê ketîye bin desthilatdarîya Selçûqîyan.

4.2. Mîrektîya Sasonê

Mîrê Sasonê, ji nesla Mîr Îzzeddînê Bedlîsê ye û muqabilî eşîra Rojkî ye. Çar şaxên wê hene: Şîrawî, Yabûsî, Sûsanî û Tamûkî. Tevî Erzenê eşîra Xaldî, Dêrmexanî û Ezîzanî ketine bin desthilatdarîya Mîrê Sasonê. Li gor Şerefnameyê, damezrînerê vê mîrektîyê Mîr Ebûbekir e û di serdema Akkoyunîyan da hatîye damezrandin. Vê mîrektîyê heta serdema Şah Smaîl dewam kirîye. Piştî Şerê Çaldîranê ketîye destê Osmanîyan. Bi Osmanîyan ra Keleha Erzenê jî ketîye destê Mîrektîya Sasonê. Li ser vê, navbera wî û Mîrê Heskîfê xerab bûye (Zekî Beg, 2010: 517). Çi heye ku devoka herêma Bidlîs û Sasonê naşibe hev.

Mîrektîya Sason-Hezoyê, di serdema Elî Beg b. Mîr Ebû Bekir da bû tabîê Şah Smaîlê Sefewî; di serdema Muhemmed b. Elî Beg da li cem Yavuz Sultan Selîm cih girt û di Sefera Misirê da li hember Çerkezan ket şerekî dijwar. Ji ber wê, Yavuz Sultan Selîm, birêvebirina Mîrektîya Sason-Hezoyê da destê wî. Erzen jî lê zêde bû û piştî vê, ew birayê wî Hizir Beg b. Elî Beg ku li ser daxwaza serokeşîran bûbû rêvebir, ji vê wezîfeyê, li ser hemdê xwe feraxet kir, ji Keleha Sasonê derket û çû li Hezoyê bi cih bû. Mîrê Heskîfê Xelîl Beg, nexwast ku Keleha Erzenê radestî wî bike, lewre Muhemmed b. Elî Beg bi piştgirîya Mîrê Bidlîs û Cizîrê çû ser Keleha Erzenê û ev der girt bin destê xwe. Ji eşîrên Heskîfê yê mîna Xaldî, Dirmîgarî û Ezîzan jî bûn alîgirê wî. Sultan Suleyman Xan, fermannameyek ragihand û tê da hukumdarîya Sason-Hezoyê da Bahaddîn Beg b. Elî Beg (Zekî, 1945/1364: 369).

Ji çavkanîyan (Zillî, 2006: 476) dîyar dibe ku li zozanên vê derê kurdên Xaldî, Çeknawî û Zebarî hene. Piştî salên 1869an Xerzan, wekî qezayekê bi ser Lîvaya Sêrtê ve hatîye zêdekirin; Hezo jî, wekî qezayekê li ser Xerzanê ye. Sala 1884an Hezo, wekî qezayekê li ser Sêrtê xuya dibe û Sêrt jî, wekî sancaxekê li ser welayeta Bidlîsê ye (Falay & Uymaz, 2007: 153). Sala 1890î, hejmara şênîyên qezaya Hezoyê 10 hezar e, 5 hezarê wê muslim, 4 hezarê wê ermenîyên gregoryan; hezarekê wê jî ermenîyên katolîk in (Saraçoğlu, & Yıldız, 2007: 622-630). Şemsettîn Samî radigihêne (Sami, 1996: 29) ku Sason li ser sancaxa Mûşê bûye; Mûş jî li ser welayeta Bidlîsê bûye. Samî dîyar dibe ku hejmara şênîyên qezaya Hezoyê, digel 119 gundên wê gihîştîye 20101ê. Zemanê berê, digel ku ehalîyê wê 60 hezar bûye; peyra çî bûye nahê zanîn. 10370yî wê muslim, 8389ê wê ermenî, 372yê wê qiptî û 970yê wê êzîdî ne.

5. FONETÎKA DEVOKA HERÊMA XERZAN

5.1. Cihderka Dengdêrên Dirêj

[a]

Cihderka dengdêra dirêj [a]yê dişibe dengdêra [a]ya erebî. Ji ber ku ereb û kurd li bajarê Hezo û Sasonê û gundê mîna Xelefana digel hev dijîn, dibe ku ev deng ketibe bin karîgerîya fonetîka erebî. Bi tarîfeke din, ew [a]ya ku bi awayekî normal ji devê merivan derdikeve û di devokîna din ên kurmancî da heye, di devoka Xerzan da tune; lêbelê bi awayekî gelek balkêş bi temamî di dirûvê [a]ya kurmancîya jêrîn (kurdîya naverast) da ye. Axifgêrên Xerzî, dengdêra [a]yê bi awayê axiverên Torî ku devokeke kurmancîya jorîn e derdixin. Cihderka [a]ya wan, nêzî cihderka dengdêra [ê]yê ye.

[û]

Dengdêra [û]yê nêzî dengdêra [o]yê ye. Axiverên vê devokê, vê dengdêrê bi awayekî ku ji devokên din hîn dirêjtir be bi lêv dikin û bi terzekî şedîd ji hinava xwe derdixin.

[ê]

Ev dengdêr mîna dengdêrên di ên dirêj, ne bi awayê devokên din ên kurmancî; bes tam bi awayê diyalekta kurmancîya jêrîn (kurdîya naverast) tê bilêvkirin û axiverên wê, hundirê gewrîya xwe hinekî diguvêşin û wê ji kûranîya singê xwe derdixin.

[î]

Awayê bilêvkirina vî dengî yê devoka Xerzan, ji devokên din ên kurmancî cîyawaz e. Axiverên wê, bi awayekî narîn û nazik wê ji kûranîya hinava xwe derdixin.

[o]

Axiverên devoka Xerzan, bi piranî dengdêra [o]yê bi awayekî ku dûrî [o]ya devokên din be bi lêv dikin û wê ji jora gewrîya xwe derdixin. Gava ciwanekî ji gundê Mangîk bêjeya “qoq” bi lêv dike, nedengdêra [o]yê wekî dengekî ku di navbera [u] û [o]yê de be derdixe.

5.1.2. Cihderka Dengdêrên Kurt “[e], [i], [u]”

Rêjeya bikaranîna dengdêrên kurt di devoka Xerzan da hindik e. Ew dengdêra [e] ji nav dawîya esmanê devê xwe derdixin. Dengdêra [i], bi dengekî narîn û henûn tê derxistin. Tiştê ku heye, cihderka dengdêra [u]yê, nêzî cihderka dengdêra [û]yê ye. Heta van salên dawîn hinek dormedoran li dengdêra [i], dengdêra alfabea tirkî [ı] bi kar dianî û îro jî dewrûberên ku kirmancî wekî zimanekî xweser dihesibînin, di alfabea xwe da vê dengdêra alfabea tirkî bi kar diênin; çî heye ku di devoka Xerzan da bi awayekî gelek zêde aşkera dengê [i] derdikeve.

5.2. Cihderka Nedengdêran

Axiverên devoka Xerzanîyê, hemû nedengdêrên xwe, bi awayê çîst, çeleng û hêzdar bi lêv dikin. Awayê bilêvkirina nedengdêrên vê devokê, bi awayekî gelek zêde dişibin kurdîya babanî û soranî ku jê ra kurdîya naverast tê gotin (سه‌جادی & نێبیراهیمی, 1396: 29).

5.2.1. Cihderka Nedengdêra “r”yê

Çawa ku zimanewanê kurdîya naverast Wirye amaje pê dike (Emîn, 2009: 105-106) digel ku zimanê kurdî û erebî di şeş dengên mîna [r], [ر] [ر] [rr], [ص], [س], [ر] da hevbeş in jî; di sîstema nivîsîna nedengdêrên [r]ya zirav û [r]ya stûr [ر] da ji hev cîyawaz in û wekî du fonemên cîyawaz ji devê merivan derdikevin. Awayê derxistina nedengdêra [r]ya stûr, di derbirîna da zarî ye, gava ku meriv bixwaze vî dengî derxe, zimanê xwe ber bi pêş ve dibe û bi awayê lertzok derdixe (Xoşnaw, 2013: 26).

5.2.2. Cihderka Nedengdêra [L]yê

Di sîstema nivîsîna nedengdêra [L]ya zirav û [L]ya stûr” da cîyawazî heye wekî du fonemên cîyawaz ji devê merivan derdikevin. Ji lew ra di alfabea erebî ya kurdîya naverast da ji bo ku ferqa navbera [L]ya stûr [ل] ji [L]ya zirav bihê kirin, zimannasan (Emîn, 2009: 107) nîşaneyê “v”ê li binê [L]ya stûr danîye. Çawa ku Xoşnaw (2013: 26) cihderka wê tarîf dike gava meriv vî dengî di weqtê derbirîna da bi lêv dike, serê zimanê xwe ber bi pêş ve dibe û hinekî giran dike û wisa derdixe.

6. FONOLOJÎYA DEVOKA HERÊMA XERZAN

6.1. Dengdêr

6.1.1. Dengdêra [A]

Axiverên devoka Xerzan, çî di serê bêjeyan da be, çî di nivê bêjeyan da be û çî jî di nivê bêjeyan da be, herfa [a]yê, hemin hertim bi awayê narîn û kubar bi lêv dîkin.

6.1.2. Dengdêra [E]

Di devoka Xerzan da dengdêra [e]yê gava wekî gireya erênî tê ser navdêran, nêzî dengê [a]yê ye: *Bajarê Hezoyê xweş e.*

Lêbelê gava axiverêkî devoka Torê, heman risteyê saz dike, dengê [e]yê bi temamî vedighefîne [a]yê: *Bajarê Hezoyê xweş a.*

Wisa xuya dike ku ev deng ne di devoka Mêrdîn û Dîyarbekirê da heye, ne jî di devoka herêma Serhedê da.

Ji bilî devoka Xerzan, devokên din ên derdora vê deverê, -eşîra Reşkotan ne têda- heta devoka eşîra Badikan û herêma Erxenîya Dîyarbekirê, Qerecdaxê, herfa [e]yê, di dawîya bêjeyan da, çî fiil bin, çî jî navdêr bin, vediguherînê herfa [i]yê:

“Elî diçe malê.” > “Elî diçi malê.”

“Ew merivekî baş e.” > “Ew merivekî baş i.”

6.2. Nedengdêr

6.2.1. Nedengdêra [B]yê

Axiverên devoka Xerzan, mîna axiverên devoka Bekiran û Deşta Gewran, herfa [b] bi tu awayî venaguherînin herfa [w], yan jî [v]yê. Tîpa [b] di her rweşê da [b] ye.

6.2.2. Nedengdêra [L]

Di devoka Xerzan da nedengdêra [L]yê bi du awayan di nav axaftinê da cih digire: [L]ya zirav û [L]ya stûr. Ji lew ra di alfabeya kurdîya naverast da ji bo ku ferqa navbera [L]ya stûr ji [L]ya zirav, zimannasan (Emîn, 2009: 107) kovika “v”yê li binê [L]ya stûr danîye.

Bêjeya “mal” dibe ku ji ber dengdêra [a]yê be ku nedengdêra [L]yê stûr tê bilêvkirin. Gava herfa [L] di bêjeya “bila” da dihê bikaranîn, herfa [L] zirav dibe. Ji van rewşan dîyar dibe ku çawa nedengdêr stûr in, dengdêrên bi wan ra jî stûr dibin. Barê stûrîyê ne tenê li ser nedengdêran; bes li ser dengdêran ne jî.

6.2.3. Nedengdêra [R]

Çawa ku di devokên din ên kurmancî da jî heye, di devoka herêma Xerzan da jî du cure nedengdêrên [r]yê hene: [r]ya zirav û [r]ya stûr. Çawa ku di kurdîya naverast (babani-sorani) (Emîn, 2009: 106) da du dengên nedengdêra [r]yê hene, di vê devokê da jî bi awayekî zelal xwe didin der. Ji lew ra di alfabe ya erebî ya kurdîya naverast da ji bo ku ferqa navbera van [r]yan, zimannasan (Emîn, 2009: 105-106) nişaneya “v”yê li binê [r]ya stûr danîye; lêbelê di alfabe ya latîn a kurmancî da ev cîyawazîya van tîpan nehatîye destnîşankirin. Di van risteyên jêr ên devoka Xerzan da nedengdêra [r] stûr e:

Dibêjin derew e. (Tarduş)²

Heta ku ji we bê, derewan mekin. (Wext Çawa Derbas Bû, , 02.11.2018)

6.3. Rûdanên Nedengdêran

6.3.1. Pevguherîna [R] û [L]yê

Meyla devokên derveyî Herêma Xerzan, di bilêvkirina nedengdêra [r] û [L]yê da li ser nedengdêra [r]yê ye; lêbelê ya devoka Xerzan, li ser nedengdêra [L]yê ye.

Devoka Xerzan	Devokên Din
Bila bihên.	Bira bihên.
Bila be.	Bila be.

6.3.2. Pevguherîna [v] û [f]yê

Axiverên devoka Xerzan, cîyê herfa [v]yê didin herfa [f]yê. Mesela bêjeya “mirov” bi awayê “mirof” bi lêv dikin.³

7. GRAMERA DEVOKA XERZAN

7.1. Gireya Dema Bihê/Dahatû

Digel ku îro partîkela dema dahatû, di devokên din ên kurmancî da *ê, dê û wê* ye, ye; li herêma Xerzan, li navenda Hezo, Comanîyê û Babosîyê, di nav

² Îbrahîm Tarduş ku li Unîversîteya Mardîn Artuklu akademîsyen e, bi eslê xwe ji herêma Xerzan e û ji bo vê xebatê min pê ra hevpeyvîn kirîye.

³ Ji ber ku herêma Xerzan xwedan cografyayêke zozanî ye, bedena merivan li vir rehet e, dibe ku ji ber vê avantajê be ku axiverên wê bi awayekî siruştî karîne zimanê xwe henûn û çeleng bikin. Ji bo delîlê vê taybetmendîyê, meriv dikare li ser youtubê, <https://www.youtube.com/watch?v=inNoUWCHHM0&t=731s> li vîdeoya bi navê *seyda abdurrehman inal kozluk binihêre* .

axiverên vê devokê da gireya/partîkela dema dahatû, “tê” ye: *Ez tê werim. Min tê bigota. Ew tê bê.*

7.2. Gireya Karê Demî

Gireya kesê duyem ê yekhejmarî ku tê ser navdêran, meylî ser dengê “a”yê dike ku dişibe devoka Herêma Torê: *Ew a. Ew baş a. Ew şareza ya.*

7.2. Daçek

7.2.1. Paşdaçeka “de/da”

Her çendî di ristesazîya vê devokê da paşdaçeka “de” kêmbê û bêhtir pêşdaçeka “li” tê bikaranîn jî, dîsa “de” heye. Carina ev paşdaçeka “de” bêyî pêşdaçeka wê “di” tê. (Hev. Î. Tarduş). Paşdaçeka “de” bi awayekî zelal û îstîqrarî bi awayê “de”yê tê bikaranîn û bi qasî ku me ji axiverên a niha bihîst paşdaçeka “da” kêmbê e. Paşdaçeka “de” di nav axiverên Gurdilanî/Misircî de jî bi awayekî zelal tê bilêvkirin. Ne bi awayê “da” ne jî bi awayê “di” ye; rasterast tim bi awayekî “de” ye.

7.2.2. Paşdaçeka “re/ra”

Paşdaçeka “re” bi awayekî zelal û îstîqrarî bi awayê “re”yê tê bikaranîn û bi qasî ku me ji axiverên a niha bihîst paşdaçeka “ra” zaf kêmbê û bi awayekî biîstîqrar bi awayê “re” ye.

7.3. Nav

7.3.1. Zayenda Navan

Hemû navdêr, li Herêma Xerzan, di devoka Hezoyê da ji hêla zayenda xwe ve bi awayê nêr tèn bikarênan:

Bavê min

Dîyê min

Xoyê min

Tiştê ku heye ev zayend, hinekî ji zayenda babanî-soranî cîyatir e. Ev zayenda vê devokê kurdîya şêxbizinîyan tîne bîra me. Li gor dîroknesan şêxbizinî çawa ku li cîyên mîna Aksaray, Enqere, Konya, Adapazari, Amasya, Samsun, Sînopê yên turkîyayê hene, li deverên mîna Kexta, Diyarbekir, Wan, Kerkûk, Xaneqîn û Elamê jî dijîn (M. Salih Batirhan, 2014: 85). Di vê kurdîyê da jî navdêrên makî di îzafeyê da mîna navdêrên nêr gireya zayendê digirin:

Jina rind, dibe Jinê rind

Jineke rind, dibe jinê rind (Batirhan, 2014).

Carina meriv dibêje gelo ev têkçûna zayenda mê di devoka Hezoyê da ji ber jîyana wan a digel gelê ereb e, yan na? Gava meriv bala xwe dide bajarê Mêrdîn

û Sêrtê, li wê derê jî ereb û kurmanc ji qedîmî zeman ve di nav hev da dijîn; bes zayenda kurmancî xwe diparêze. Çi heye ku divê meriv vê jî bizanibe ku nişteciyên desthilatdar ên bajarê Mêrdîn û Sêrtê ji weqtakî dûr û dirêj ve ne kurmanc; bes ereb bûn. Îca gava em li bajarê Hezo û Sasonê dinihêrin, nişteciyên desthilatdar ên van her du bajarên ji qedîmî zeman ve kurmanc bûne. Divê meriv dîyar bike ku erebên kurmancîaxiv, di axaftina xwe ya kurmancî da zayenda makî ya heyberan zêde bi kar naynin; ew bi giştî meyla xwe didin ser zayenda nêr. Ev jî dibe ku ji ber hêsanîyekê be. Çunkî zayenda navdêran di kurmancî da ji bo gelên bi eslê xwe ne kurmanc bin zehmet e. Wekî din, di dawîya sedsala 15an û serê sedsala 16an da herêma Xerzan ketîye bin desthilatdariya siyasî-îdarî ya sefewîyan. Zimanê sefewîyên wê hingê farisî ye û farisî, wê hingê dibe ku bûbe zimanê serdest-fermî yê vê herêmê. Îca ev rewşa zimanê farisî ku zayenda nêrî û makîya navan avêtîye, dibe ku li ser kurmancîya vê herêmê jî karîgerî kiribe.

7.3.2. Bêjeya Xwişk

Cîyê baldarî û balkêşîyê ye ku bêjeya “xwişk” di piranîya devokên kurmancî da bi awayê “xwişk”, “xwing”, “xweh” û “xuşk” e; lêbelê di devoka Xerzan da bi awayê “xoy”yê ye. Digel ku di devokên derdora herêma Xerzan da ji bo “xwişk”ê “xwa” jî dibêjin, bes li vê herêmê bi formê “xo” maye.

7.4. Cihnav

Di serî da divê em dîyar bikin ku di risteyên vê devokê da koma cihnavên tewandî (min, te, me, we) ji koma cihnavên sade (ez, tu, ew, em,) zêdetir tên bikaranîn. Axiverê vê devokê, gava risteyekê saz dike, li şûna ku bibêje “Ez çûm.” dibêje: “Min çû.” Ne bi awayekî sistematîk be jî, çawa ku di kurmancîya xwarê da cihnav “ez” nayê bikarênan, di vê devokê da jî meyleke mezin li ser cihnav “min” heye.

7.4.1. Cihnav “Xo”

Cihnav “xwe” ku di piranîya devokên kurmancîyê da bi awayê “xwe, xwu, xwi, xu” ye; di devoka herêma Xerzan da tim û tim bi teşeyê “xo” ye. Heta gava di nav bêjeyên pevedudanî jî da cih digire, bi awa û formata “xo” cih digire û naguhere:

Serbixoy, jixoy, bi xo, xo bi xo

Formata cihnav “xo” heman mîna formata “xo”ya kirmanckî û soranî ye. Ne li hemû herêma Xerzan; bes li derdora Sason û Hezoyê wiha ye.

7.4.2. Cihnav “Tu”

Di devoka hemû herêma Xerzan da cihnav “tu” bi tu awayî venaguhere “ti”; lêbelê di devokên kurmancî yê mîna Dîyarbekir û Mêrdînê da dibe “ti”. Ev

cihnava “tu” ne zirav e jî, tam bi awayê kurmancîya jêrîn e û hinekî stûr û dirêj e. Em ji çavkanîyan (Gultekîn, 2010: 45) hîn dibin ku ev cihnav “tu” di kirmanckî/zazakî da jî veguherîye teşeyê “ti”. Wusa xuya dike ku li vir, di bikaranîna dengdrêra kurt “u” û “i”yê da arîşeyek heye. Ji ber ku di kurmancîya jorîn da “tu” û di ya jêrîn da ev format di rengê “to”yê da ye (Kurdo, 2013: 118), bi qenaeta min heq heye ku di kirmanckî da jî ne formata “ti”; bes formata “tu” bihe tercihkirin.

7.4.3. Cihnav “Me”

Ev cihnav kesê yekem ê zafhejmarî “me” bi lêkera “çû”yînê ra zêde tê bikaranîn: *Me çû*.

Nabêjin em çûn; dibêjin me çû. Digel vê, gava yekî Hezoyî vê cihnavê bi lêv dike, nêzî dengê “ma” bi lêv dike. Cihnav “çî” jî forma xwe diparêze: *Tu hatî çî?*

7.5. Hevalnav

Çi – Çî

Di nav axiverên Misirc-Gurdilanî da jî cihnav “çi” bi awayê “çî” tê bikaranîn. Di devoka Kurtalanê da devoka Xerzanîyê, bi awayekî îstîqrar cih nagire; ji herêma Torê jî û ji herêmên din jî axivgêr hene. (Hevpeyvîna bi Îbrahîm Tarduş).

Di devoka Qoser Mêrdînê da “çîk”; di ya Deşta Gewran da “çer” e. Mîna dîyalekta babanî û kurmancîya jêrîn di formata “çî” da ye.

7.6. Bêjeya “Mam” û “Ap”

Bêjeya “mam”, li vê herêmê mîna soranî ye; bêjeya “ap” di devokên din ên kurmanckî da heye; di devoka Xerzan da tune. Gava ev bêjeya “mam” dikeve nav bêjeyên ku binyada wan ji bêjeyên pevedudanî pêk hatine jî, ev bêje naguhere:

Mamojin, kurmam, pismam, keçmam, mamo

8. Sentaksa Devoka Xerzan

Di risteyên vê devokê, hinek taybetmendiyên xweser hene ku devokên din ên kuremanckî da xuya nakin. Bi piranî gava biker bibe cihnav “em”, li şûna wê, riste bi cihnav “me”yê dest pê dike: *“Me çû gund ew dîtin.”*

8.1. Lêkera/Karê Alîkar “be” - “bî”

Digel ku di piranîya devokên kurmanckî da lêkera/karê alîkar “bû” gava tê ser bêjeyêke navdêr/nav, bi formata “be/bi” ye û di devoka Torê da “bê” ye; di dîyalekta kirmanckî da “bo” ye; di devoka herêma Xerzan da bi şiklê “bî” ye: *Qewet bî ji we re.*

Yekî ku tam munafîq **bî**, çavê xwe dikî bin emrê xwe. Yekî ku ne munafîq **bî**, girîyê wî bê, nasekinî. (Wext Çawa Derbas Bû, Şêx Marûf Yıldırım, 01.03.2017)

Gava di vê devokê da yek dibêje “Qewet bî.” diyar e ku bi nîyeta duayê, lêkera alîkar “be”yê ditewêne û wekî ku bibêje: *Hêvîdar im tu bi qewet bî.*”

Ev formata ku di devokên din da bi awayê “*Qewet be.*” ye, di devoka Xerzanîyê da vediguhere “*Qewet bî.*” dibe ku ji hêla sentaksê/ristesazîyê ve risteyeke duayî be, lewra ketîye vî teşeyî. Muminekî/e kurmanc gava dua dike, Xwedayê wî/wê, jê ra serdest e, raser e, lewra nikare lê ferman bike, tenê wekî daxwaz dibêje: “*Ya Rebbî, ez dixwazim tu qewetê bidî wî.*”

Yaxud qesda wî/wê wiha ye: “*Ya Rebbî, heger tu qewetê bidî wî baş e.*”

Yekî ereb, gava dua dike dibêje: “*Allahumme exfirli.*” اللهم اغفر لي [Rebbê min, min bixefirîne.]; yekî tirk gava dua dike, dibêje: “*Allahum beni beni affet.*”; lê yekî kurmanc, wekî ku bi heddê xwe bizanibe, risteya xwe ya duayî, li ser bingeha raweya daxwazî saz dike. Digel vê rewşê, fiîla alîkar “bû-“ di devoka herêma Botan da bi awayê “buwîn” tê bikaranîn. Dibe ku ev awayê ha, bi domana demê ra ji “bûyî”nê” veguherîbe bûwî” > “buwî” > “bî”yê.

8.2. Lêkera/Karê “Fer”-în

Di xebata xwe ya li ser devoka Xerzan da em rastî fiîlekê hatin ku tenê xasî bi axiverê vê devokê ye: *fer*-în. Gava yekî herêma Xerzan dibêje “ferê”, wate li min binihêre, dêhn û bal û haya xwe bide min. Ev karê *ferê*, ji bilî vê devokê, me di tu devokeke din a kurmancî da nedît. Her çendî di metnên nivîskî yên helbestên ehlê medreseyê da ev kar bi awayê *fermûyîd* tê bikaranîn (؟، نامدی: 64). Îro çî di nav axaftina rojane da be, çî jî di nav metnên nivîskî da meriv rast li vê bêjeyê nahê. Digel vê dibe ku ev bêje, têkildarî bêjeya *fêrbûnê* be jî. Gava axiverekî/e Xerzan di weqtê axaftinê da ji kesê pêşberî xwe ra dibêje *ferê*, diyar e ku jê ra dibêje guhdarî bike û hîn bibe. Mîna ku bibêje *fêr bibe*. Digel ku îro di kurmancî da fiîla “ferm-“ di rewşa fermanî/emrî da bi awayê “fermo” tê bikaranîn, bi qenaeta min xelet e. Divê ku bi awayê “biferme” be. Çunkî ev formata ku bi “bi-”yê dest pê dike, (bixwêne, bireve, bimeşe) di hemû fiîlên fermanî yên kurmancî, soranî û kirmanckî da berbelavtir e. Heta em dibînin ku di zimanê farisî da jî bi heman formatê, ango bi awayê “bi-ferma-y-îd” e: “Aqayê Îzdî, *bifermayîd* încâ.” (85 :1990، ثمره)

8.3. Formata Gireya Kesê Duyem ê Yekhejmarî û Kesên Zafhejmarî

Li herêma Gurdilan û Hezoyê, ew gireyên kesên ên mîna *hatîye*, *hatine*, bi awayekî rêkûpêk, “-e/-ye” û “-ine” ye. Mîna herêmên din ku meyla van gireyan diçe ser dengê “-i/yi” û “-ini” nîne: *Ew ji Misircê hatîye. Ew ji Babosîyê hatine.* (H. Î. Tarduş)

Encam

Piştî raxistina rabirdûya dîrokî ya herêma Xerzan û raberkirina taybetmendiyên wê yên cografî, demografî û devokî, digel herêmên din ên dîyalketên kurdî, ne bi temamî be jî, dîyar bû ku devoka Xerzan a kurmacî, çawa ku ji hin hêlên fonetîk, fonolojîk, morfolojîk, gramerî û sentaksî ve ji devokên din ên kurmacî cîyatir bûye, pê ra jî şibîyaye kurmacîya xwarê. Herêma Xerzan, ji qedîmî zeman ve bo qewmên qedîm malovanî kirîye. Hîna ji berî miladê ve bûye cîyê şênîyên medenî. Ji serdema Bizansî, Romayî, Xelîfeyên Îslamê, Emewî, Ebbasî, Merwanî, Eyyûbî, Artûqî, Selçûqî, Akkoyunî û Sefewîyan ve jîyana civakî şaristanî li vir hebûye. Piştî serdema mîrektiyên kurd, êdî ev dever ketîye bin desthilatdarîya Osmanîyan.

1. Tîpa [a]yê ji aliyê fonetîka xwe ve çawa ku ne mîna ye fonetîka devokên din ên kurmacîya jorîn, wisa jî bi xurtî û zelalî dişibe kurmacîya jêrîn/xwarê, ango kurdîya naverast. Tîpên dengdêr ên kurt ên mîna [e], [i], [u] ku di devoka Xerzanîyê da tên bikaranîn, digel ku hinekî dişibin devoka herêma Torê-Mêrdînê, dîsa bi meyleke mezin di dirûvê axiverên dîyalekta kurmacîya xwarê da ne.

2. Herfên nedengdêr ên devoka Xerzan bi temamî ji devokên din ên kurmacî cîyatir in, nerm û lawaz nînin; bes heman mîna nedengdêrên kurmacîya xwarê, bi şîpîl û çeleng in. Di vê çelengî û şîpîşiyê da dibe rista cografî jî hebe.

3. Zayenda makî, heman mîna kurmacîya xwarê ji nav devoka Xerzan rabûye. Sedemê vê jî dibe ku ji ber karîgerîya desthilatdarîya sîyasî ya zimanê farisî, yan karîgerîya awayê axaftina erebên kurmacîaxiv, an jî meyla xelasbûna ji bargiranîya taybetmendiyên zayendê be. Devoka Xerzan, ji aliyê zayendê ve çawa ku dişibe zayenda kurmacîya jêrîn, dîyar e ku dişibe kurmacîya Şêxbizîniyên dormedora Semsûr û Konyayê jî.

4. Cihnav “xwe” di vê devokê da tam bi awayê formata kurmacîya xwarê, “xo” ye. Gava kurmacîaxivên vê deverê bi cihnav “xo” bêjeyên nû saz dikin, dîsa formata wê ya bi teşeyê “xo” diparêzin.

5. Hudûdê devoka Xerzan, di nav herêma Xerzan bi xwe da jî lokal e. Digel ku cografyaya herêma Xerzan ji hêla gund û devokên xwe ve xwedî dewlemendî û rengînîyê ye û li gundên derdora wê eşîrên mezin ên mîna Xîyan, Reşkotan, Elikan û Bekiran hene jî, dîsa ev herêm gişt ne bi heman tarz û teherî dipeyive. Devoka Xerzan, tenê xasî bi şarçeyên mîna Hezo/Kozluk, Hewêl/Baykan, Misircê/Kurtalan û Sasonê ye.

Çavkanî

Aşan, M. B. (1993). Van Yöresi üzerinde Yapılan Tarih Araştırmaları ve Bazı Düşünceler. İstanbul: Türk Dünyası Araştırmaları Vakfı.

Beg, M. E. (2010). Dîroka Kurd û Kurdistanê, (Ji Soranî bo kurmacî: Zîya Avci). İstanbul: Avesta.

- Efendi, A. A. (1280). Der Hülasai Mezamin-i Defter-i Divan. İstanbul: Tasvir-i Efkar Gazetesi Matbaası.
- Emîn, W. ' . (2009). Asoyekîtirî Zimanewanî, (Bergî Yekem). Hewlêr: Aras.
- Falay, F. B. (2007). Siirt'in 19. yüzyıl Sonlarındaki Sosyo-Ekonomik Yapısı. Uluslararası Siirt Sempozyumu, (s. 153). İzmir.
- Gultekîn, S. (2010). Ro Ser ZARawaya Kirmanckî Xebata Gramerî. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- İbrahim Bingöl Mardin. (2017). Cihnav di Zazakiya Gimgimê de. The Journal of Mesopotamian Studies, 90.
- Komasyon. (1998). 1998 Yılı Batman İl Yıllığı . Batman: Batman Özel İdaresi.
- Komasyon, H. . (2011). Batman İli Sosyo-Ekonomik Profili. batman: Batman Ticaret ve Sanayi Odası Yayını.
- Kurdo, Q. (2013). Rêzimana Kurdî (Kurmancî-Soranî) (Ji Kurdîya Soranî: Zülküf Ergün). İstanbul: Nûbihar.
- M. Salih Batirhan. (2014). Şêxbizinîyên Haymanayê û Zarê Wan. Zend, 85.
- Naîma, M. (2018). Sason Aşîretlerinin Dağılımı. <http://www.sasun.org/kultur/gunumuz-sason-asiretlerinin-dagilimi-h731.html>.
- Öztuna, Y. (1969). Devletler ve Hanedanlar (Türkiye, 1074-1990) c. II. Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları.
- S. Sönmezsoy, Y. E. (1994). Siirt Tarihi (Başlangıçtan Osmanlıya Kadar). Van: YYÜ Ferit Melen Kütüphanesi (Basılmamış).
- Sami, Ş. (1996). Kâmûsu'l-A'lâm, IV. Ankara: Kangar Neşriyat.
- San, M. S. (1982). Doğu Anadolu ve Muş'un İzahlı Kronolojik Tarihi. Ankara: Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü.
- Saraçoğlu, M. Z. (2007). 19. Yüzyıldan Günümüze Siirt İlinin İdari ve Demografik Yapısında Meydana Gelen Değişmeler. Uluslararası Siirt Sempozyumu, (s. 622-630). İzmir.
- Turan, O. (1973). Doğu Anadolu Türk Devletleri Tarihi. İstanbul: Turan Neşriyat.
- Xoşnaw, N. E. (2013). Dengsazî, (çapa yekem). Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- Yıldız, H. D. (1976). İslamîyet ve Türkler. İstanbul: İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Yayını.
- Yıldız, H. D. (1982). Anadolu Türk Tarihi. Anadolu Uygarlıkları Ansiklopedisi, (c. 4, 630). İstanbul: İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Yayını.
- Yılmazçelik, İ. (1995). XIX. Yüzyılın İlk Yarısında Diyarbakır, (1790-1840). Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınları.
- Yücel, A. S. (1989). Türkiye Tarihi. Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınları.
- Zillî, E. D. (2006). Seyahatname III-IV, T. Temelkuran, N. Aktaş, ve M. Çevik (Çev). . İstanbul: Üçdal Neşriyat.
- بيروت: دار المعرفة . محاضرات تاريخ النعم الإسلاميّة الدولة الامويية . (2005/1426). الخصري, م .
- بيروت : دار القلم . محاضرات تاريخ النعم الاسلامية الدولة العباسية . (٩). بك, م. خ

قاهره: مطبعت السعادة . تاريخ الدول و الامارات الكرديية فى عهد الاسلامية . (1945). بگ، م. م. ئ
بيروت: دار الفكر . الفاروق بن العمر بن الخطاب . (1426/2005). رضى، م
بغداد: تعفن . خلاصات تاريخ الكرد و كردستان . (1961). زهكى، م. ا
تهران: بيريم باسم و باين . اموزش زبان فارسى كتاب اول . (1990). سمره، ي
سقز: چاپخانهى گوتارى سقز . زمان و ويژهى كوردى . (1396: 29). ئبيراهيمى، م & . سمجادى، ب
ديياربكر: ديياربكر . بعد مدائح و المراسى فى حقق ئوستاذ بديعزمان سعيد نوورسى . (؟). ئامهدى، ز
سۆز .

Transkrîpeya Çavkanîyên Erebi, Farisî û Kurdî yên bi Alfabeya Erebi

Amedî, Zeynelabidin Be'du'l-Medaihi we'l-Merasî fî Heqqi Ustaz Bedîuzzeman
Seîd Nûrsî, (Ceme'ehu.), Dîyarbekir: Dîyarbakır Söz.

Bek, M. X. (?). Muhaderatu Tarîxi'l-Umeme'l-îslamîyye ed-Dewletu'l-
Ebbasîyye, (Tehqîq: Muehmmmed el-'Usmanî), Beyrût: Daru'l-Qelem.

Emîn, Wirya 'Umer. (2009). Asoyekîtirî Zimanewanî, (Bergî Yekem), Hewlêr:
Aras.

Hısın Keyfa Vekainamesi (Nûzhetü'n-Nazır ve Rahatü'l-Hatır), Vîyana Milli
Kütüphanesi, Mxs. 355 varak, 76a.

Riza, M. (2005/1426). el-Farûq Umer bin el-Xettab, (Îtîna bih: Nacî İbrahîm es-
Siweyd), Beyrût: Daru'l-Fikir.

Xoşnaw, Nerîman Ebdulla. (2013). Dengsazî, (çapa yekem), Hewlêr: Çapxaney
Rojhelat.

Zeki, M. E. (1961). Hulasatu Tarihi'l-Kürd ve Kürdistan, Muhammed Ali Avni
(Arapça'ya Terceme), 2. Baskı, Bağdat: Tevin.

Zekî, M. E. (1945/1364). Tarîxu'd-Duweli we'l-Emaratu'l-Kurdîyyeti fî 'Ehdi'l-
İslamîy, ('Errebehu we Raci'ehu: Muhemmed 'Elî 'Ewnî), Qahire:
Metbeetu's-Seadet.

Çavkanîyên İnternetê

Erzurumlu, K. (2015), *Osmanlıdan Günümüze Kürt Sorunu* 3,
www.sediyani.com/p? (31.10.2018)

<https://www.youtube.com/watch?v=-wHFPITh1A&t=2305s> Wext Çawa
Derbas Bû, Şêx Marûf Yıldırım, 01.03.2017, tarîxa gihîştinê, 02.11.2018).

<http://www.kozluk.gov.tr/kozluk-tarihcesi> (Dîroka pêgihîştinê:
31.10.2018).

<https://www.youtube.com/watch?v=inNoUWCHHM0&t=731s>, seyda
abdurrehman inal kozluk (Dîroka pêgihîştinê: 03.11.2018).

<http://www.kozluk.gov.tr/kozlukadi> (Dîroka pêgihîştinê: 03.11.2018).


Naîma, M. (2018). Sason Aşîretlerinin Dağılımı,
[http://www.sasun.org/kultur/gunumuz-sason-asiretlerinin-dagilimi-
h731.html](http://www.sasun.org/kultur/gunumuz-sason-asiretlerinin-dagilimi-h731.html) (08.01.2019)

Kesên Çavkanî yên Zindî

Hevpeyvîna bi İbrahîm Tarduş re, (31.10.2018)



<https://www.google.com/search?q=kozluk+haritası&source=lnms&tbn=isch&sa=X&ved=0ahUKewihwY-UlsjfAhXCE> (30.12.2018)




<https://www.google.com/search?q=kozluk+haritası&source=lnms&tbn=isch&sa=X&ved=0ahUKewihwY-UlsjfAhXCE> (30.12.2018)



<https://www.google.com/search?q=kozluk+haritası&source=lnms&tbn=isch&sa=X&ved=0ahUKewihwY-UlsjfAhXCE> (30.12.2018)



<https://www.google.com/search?q=kozluk+haritası&source=lnms&tbn=isch&sa=X&ved=0ahUKEwihwY-UlsjAhXCE> (30.12.2018)



<https://www.google.com/search?q=kozluk+haritası&source=lnms&tbn=isch&sa=X&ved=0ahUKEwihwY-UlsjAhXCE> (30.12.2018)



<http://www.sasun.org/kultur/gunumuz-sason-asiretlerinin-dagilimi-h731.html>
(07.01.2019)





Makale Geliş Tarihi: 12.05.2019

Makale Kabul Tarihi: 23.06.2019

ÇAND Û ŞARISTANIYA KURDÊN MERWANÎ DI TARÎXU MEYYAFARIQÎNÊ YA ÎBNU'L-EZREQ DA¹

Ahmet SEYARÎ²

KURTE

Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî di sedsala XII'an da, di serdema Artûqîyan da, jiyaye û di dezgehên rêvebirîya dewletê da xebitîye. Fariqî di berhema xwe ya bi navê Tarîxu Meyyafariqînê da derheqê çand û şaristaniya kurdên Merwanî da gelek agahiyên girîng dane. Ev berhem di warê siyasî, sosyolojî, mîmarî, hiqûq û aborîyê da dikare gelek aliyên vê serdemê ronî bike û rê li ber xebatên nû veke. Di vê xebatê da agahiyên di warê çand û şaristaniya kurdên Merwanî, yên ku di Tarîxu Meyyafariqînê da derbas dibin, hatine tesbitkirin û şirovekirin. Di vê çarçoveyê de di warê rêvebirîya dewletê de taybetîya mîran û şewaza derketina wan a ser textê mîrîtîyê, taybetî û peywîrên wezîr, walî û karê nivîsvanan, taybetîyên pergala hiqûqê û qazîyan û rê û rêbaza darizandinê hatiye vegotin. Derheqê artêşa kurdên Merwanî û çekên ku di vê artêşê da hatine bikaranîn da agahî hatine dayîn. Behsa kevneşopî û tore, bîr û bawerîyên di serdema kurdên Merwanî da hatiye kirin. Herwiha agahiyên derheqê avahiyên mîmarî yên ku li vê serdemê hatine çêkirin da û çalakîyên di warê aborî û bazirganiyê û weqfên alîkarîyê da hatine tesbitkirin û şirovekirin.

Peyvên Sereke: Kurdên Merwanî, Çand û şaristanî, Tarîxu Meyyafariqîn, Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî.

¹ Vê gotarê bingeha xwe ji beşeke teza min a mastîrê girtiye. Ev tez bi navê "Kurdên Merwanî di *Tarîxu Meyyafariqîn* a Ibnu'l-Ezreq de" di sala 2016an de li Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê di beşa Ziman û Çanda Kurdî de hatiye nivîsîn.

² Zanîngeha Bîngolê- Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî - Xwendekarê Doktorayê. ehmedseyari@gmail.com
ORCID: 0000-0001-2345-6789

***Îbnu'l-Ezrak'ın Tarihu Meyyafarîkin Adlı Eserinde
Mervanilerin Kültür ve Medeniyetleri***

ÖZET

Îbnu'l-Ezrak el-Farîki 12. yüzyılda Artuklular döneminde yaşamış ve bazı devlet kademelerinde görev almıştır. Farîki Tarihu Meyyafarîkin adlı eserinde Mervanilerin kültür ve medeniyetleri hakkında çok önemli bilgiler vermektedir. Bu eser siyasi, sosyolojik, mimari, hukuki ve ekonomik açıdan bu dönemin birçok yönünü aydınlatıyor ve bu alanda yapılacak birçok çalışmaya katkı sağlayabilir. Bu çalışmada Mervani Kürtlerinin oluşturdukları ve Tarihu Meyyafarîkin'de yer alan kültür ve medeniyet ele alınmıştır. Bu çerçevede devlet yönetiminde emirlerin özellikleri ve tahta çıkış şekilleri, vezir, vali ve divan idaresi hakkında bilgi verilmiştir. Hukuk sistemi ve kadıların özellikleri ve yargılama şekilleri ele alınmıştır. Mervani Kürtlerinin ordusunun özellikleri ve ordunun kullandığı silahlar hakkında bilgi yer almaktadır. Ayrıca bu çalışmada Mervani dönemine ait bina, kalıntı sur, burç, saray, mesire, kubbe, cami ve hastane gibi mimari eserler hakkında bilgi mevcuttur. Yanı sıra, çalışmada Mervani Kürtlerinin adet, gelenek, görenek ve inanışlar, vakıf ve yardımlaşma, ekonomi ve ticari faaliyetler hakkında bilgiler yer almaktadır.

Anahtar Kelimeler: Mervani Kürtleri, kültür ve medeniyet, Tarihu Meyyafarîkin, Îbnu'l-Ezrak el-Farîki.

***The Culture and Civilisation of Merwanî Kurds in The
Work Named Tarîkh al-Mayyâfâriqîn by Îbnu'l-Ezreq***

ABSTRACT

Ibn al-Azraq al-Fariqi lived in the 12th century Artuqid period and served in some state levels. In his work Tarîkh al-Mayyâfâriqîn, Fariqi gives very important information about the culture and civilization of the Marwanis. This work can contribute to many studies in this field by illuminating many aspects of this period in terms of political, sociological, architectural, legal and economic aspects. In this study, the culture and civilization established by the Marwani Kurds in Tarîkh al-Mayyâfâriqîn are analyzed. In this context, information about the characteristics of the amers in the administration of the state and how they came to the throne and information about viziers, valis and divan works is given. The legal system, the characteristics of the kadis and their ways of judging are explained. Information is given on the features of the army of the Marwani Kurds and the special weapons they used. Explanations have been provided about the buildings, remains and architectural works of this period. In addition to these, certain knowledge has been presented about the city walls, palaces, promenades, domes, mosques and hospitals built in this period. Besides that, topic of the customs, traditions and beliefs in the period of the Marwani Kurds has been dealt with. Furthermore, there are descriptions about the foundation and cooperation, economy and commercial activities in the Marwanis.

Keywords: Marwani Kurds, culture, civilization, Tarîkh al-Mayyâfâriqîn, Ibn al-Azraq al-Fariqi.

DESTPÊK: ÎBNU'L-EZREQ EL-FARÎQÎ Û TARÎXU MEYYAFARIQÎN

Navê wî Ehmedê kurê Yûsuf kurê Elî kurê Ezreq e (el-Xûlî û Baluken, 2014:22). Lê wekî Îbnu'l-Ezreq el-Farîqî tê nasîn. Li gor agahîya ku Îbnu'l-Ezreq bi xwe di Tarîxu Meyyafariqînê da dide ew di sala 1119an da li

Meyyafariqînê³ hatiye dinyayê (Fariqî, 2014:552). Derheqê dîroka mirina wî de tu çavkanîyan de agahî nehatina peydakirin.

Îbnu'l-Ezreq hîn di ciwanîya xwe da dest bi xebata di karê dewletê da kiriye (Awad, 1959:31). Di sala 1148an da karê serperîştîya weqfên derveyê bajarê Meyyafariqînê kiriye (Fariqî, 2014: 593).

Destxeta *Tarîxu Meyyafariqînê* di muzeya British a li Londonê da ye. Li heman Muzeyê du nusxeyên berhemê hene. Ya yekem di beşa destxeta Opb And Mss bi nimreya Or.5803an tomarkirî ye û ji 400 rûpelî pêk tê û tê da bûyerên heta sala 1176an hatine vegotin. Nusxeya duyem jî di heman cihê da bi nimreya Or.6310an tomarkirî ye. Ev nusxe jî ji 276 rûpelan pêk tê û tê da bûyerên heta sala 1164an hatine vegotin (el-Xûlî û Baluken, 2014:7,12). Li gor agahîyên ku di beşa pêşî ya *Tarîxu Meyyafariqînê* da derbas dibin Fariqî di sala 1176an ev berhem nivîsîye (Fariqî, 2014:102).

Îbnu'l-Ezreq di rêvebirîya karên dewletê yê girîng da cih girtiye û ji ber vê taybetîya wî tiştên ku di serdema xwe da nivîsîne wekî belgeyên fermî ku bi destên rayedarên dewletê hatine nivîsîn, tîs hesabandin. Li ser vê yekê jî dikare bê gotin ku ev berhema wî wekî belgeyêke fermî ya dewletê ye û ji aliyê dîrokî ve pir girîng e (Awad, 1959:4).

Îbnu'l-Ezraq Derheqê gelek eşîr û xanedanên kurdan da agahî dane. "Ji nav van ên ku bi awayekî gelekî berfireh û hema bêje sal bi sal Îbnu'l-Ezraq agahî Derheqê wan da daye Merwanî ne" (Mansız, 2015:120). Herwiha di vê berhemê da agahîyên çandî û siyasî yê serdemên kevin û bi taybetî jî yê sedsala XIIan ku Îbnu'l-Ezreq tê da jîyaye hene. Derheqê dewleta Emewî, Ebbasî û xelîfeyên wan û rayedarên dewleta wan da jî agahîyan dide. Li ser mîrnişîn û dewletên wekî Selçûqî, Merwanî, Atabeg û Artûqîyan ku li Şam, Iraq, Cezîre, Ermenistan û Îranê hatine damezirandin disekine. Têkilîyên van dewletan ên bi hev ra û yê bi Endulus, Fatîmî û Bizansîyan ra tîne zîmên (Awad, 1959:1-2).

Mijarên pirtûkê di bin van beşan da kom dibin: Beşa yekem behsa xîlafeta Emerê kurê Xetab (Fariqî, 2014:83-215), beşa duyem behsa rêvebirîya Muawîye (Fariqî, 2014:217-330), beşa sêyem behsa destpêka xîlafeta Benî Ebbas (Fariqî, 2014:337-415), beşa çarem behsa destpêka rêvebirîya Hemdanîyan (Fariqî, 2014:), beşa pêncem behsa destpêka rêvebirîya kurdan li Meyyafariqînê (Fariqî, 2014:449-705) û beşa şeşem behsa rêveberîya Necmeddîn Xazî û bidestxistina wî ya Meyyafariqînê (Fariqî, 2014:663-695) kiriye. Ji xeynî van agahîyên dîrokî, Îbnu'l-Ezreq di berhema xwe da behsa mijarên çand û şaristaniyê jî kiriye û di vî warî da agahîyên berfireh dane.

Heta niha li ser *Tarîxu Meyyafariqînê* hin xebat hatine kirin. Xebata pêşî ya li ser vê pirtûkê ku tê zanîn a Henry Frederîk Amdroz e. Piştra Vladimir Mînorsky

³ Bajarekî di navbera herêma Cezîre û Ermenîyanê de ye. Hin kes wê ji herêma Ermenîyan û hin ji cezîreyê dihesibînin. Dikeve rojhilatê Dîjleyê. Ji Amedê pênc fersaxan dûr e. (Bnr. Hîmyerî, 1984:567).

li serê xebitîye. Piştî van rojhilatnasan Bedewî Evdilletîf Awad beşa Merwanîyan weşandiye û Mehmet Emîn Bozarslan ev xebata Awad wergerandiye tirkî. Piştî Bozarslan, Ahmet Savran jî beşa ku Derheqê Artûqîyan da ye wergerandiye tirkî. Lê cara pêşî ev pirtûk bi temamî ji hêla Karim Farouk û Yusuf Baluken ve hatiye weşandin. Di vî warî da teblîxeke Ali Sevîm jî di Kongreya Dîroka Tirkan a VI da li ser weşana Tarîxu Meyyafariqînê ya ku ji hêla Awad ve hatiye weşandin da heye (Sevim, 1967).

1. RÊVEBIRÎYA DEWLETÊ

1.1. Mîr

Li gor agahîyên ku Fariqî dide mîrê kurdan ê ku bingeha revebirîya Merwanîyan danîye Badê kurê Dostik e (Fariqî, 2014:450). Piştî mirina Bad, xwarzîyê wi ye mezin Ebû Elî Hesên rêvebirîya dewletê xistiye destê xwe (Fariqî, 2014:450). Lê bi serdema Ebû Elî ra di dewleta Merwanîyan da piştî mirina mîr, an birayê wî yan jî kurê wî li ser textê mîrîtiyê rûdinişt. Li gor agahîyên Îbnu'l-Ezreq piştî Ebû Elî, birayê wî Mumehîdduwle Ebû Mensûr bû mîr (Fariqî, 2014:461). Jixwe kurekî Ebû Elî tenê li pey mabû û ew jî dema Ebû Elî hatibû kuştin hêja piçûk bû (Fariqî, 2014:462). Piştî Mumehîduddewle birayê wî Nesruddewle Ehmed û piştî Nesruddewle Ehmed jî dîsa kurê wî Nîzameddîn bû Mîrê Merwanîyan (Fariqî, 2014:505). Mîrê Merwanîyan ê dawî jî kurê Mîr Nîzameddîn, Nasiruddewle Mensûr bû (Fariqî, 2014:516).

Di dewleta Merwanîyan da mîr ji hêla desthilatdarîyê ve di rêza yekem da bû. Di karên rêvebirîya dewletê yên wekî îlana şer, gîrêdana peymanan, tayînkirina walîyan da mîran bîryar dida (Yûsuf, 2001: 75). Piştî mirina mîrekî, wezîrî mîre nû îlan dikir (Fariqî, 2014:450). Di berhema Îbnu'l-Ezreq da rêvebir û hikumdarê dewletê wekî emîr hatiye binavkirin. (Fariqî, 2014:453).

Nasnavên mîrên Merwanîyan hebûn. Li gor agahîyên Îbnu'l-Ezrak ji mîrên Merwanîyan cara yekem Ebû Mansûr nasnavê Mûmehîddudewle standibû. Ev nasnav jî wezîrê wî Mem lê kiribû (Fariqî, 2014:461). Nasnavê Ebû Nasir Ehmed jî Nesruddewle bû (Fariqî, 2014:474). Li gor Îbnu'l-Ezreq xizmetkarekî xelîfeyê Bexdayê Qadir Billah hin diyarî li ser navê xelîfe û siltan ji Ebû Nasir re şandin û wî jî nasnavê Nesruddewle dayê. Di heman demê da xelîfeyê Misrê Hakîm Bîemrîllah jî gelek diyarî ji Nesruddewle ra şandin û nasnavê Îzûdewle dayê (Fariqî, 2014:476).

1.2. Wezîr

Di dewleta Merwanîyan da gelek peywîrên wezîran hebûn. Tayînkirina walî û karmendên dewletê û betalkirina wezîfeya wan, dayîna meaşê karmendan, azadkirina kesên di girtîgehê da, destdanîna ser mal, îdarekirina leşkeran û beytulmalê hin ji wan peywîran bûn. Lêbelê wezîr bêyî şewra mîr nikaribû bîryara kirina van karan bidina (Yûsuf, 2001: 78).

Di dema Ebû Elî da jî wezîr Mem bû (Fariqî, 2014:450). Piştî ku Mem û kurê wî Şêro, Ebû Elî kuşt, Mumehîduddewle Ebû Nasir bû mîr. Karûberên dewletê bi temamî ketin destê Mem û Şêro (Fariqî, 2014:452) û piştî Mem, Şero bû wezîr û alikarê Mumehîduddewle (Fariqî, 2014:466). Di rêvebirîya Merwanîyan da gelek caran mîr karûberên rêvebirîya dewletê dixist destê wezîran. Lê heta ku wezîr bi mîr neşewirîyabûna bîryar nedidan (Fariqî, 2014:473).

Piştî ku mîr dîmir wezîran karûberên dewletê dimeşandin. Fariqî bûyerên piştî mirina Nesruddewle wiha fîne ziman: “Dema Nesruddewle mir, wezîr, serokê artêşê şand mala Mîr Nîzameddîn û gazî wî kir. Pêşî wezîr, wekî mîr silav li Nîzameddîn kir û piştra zarok û pismamên wî, qazî, kesên alim û zana û giregirên bajêr hatin cemê û wan jî wekî mîr silav dan Nîzameddîn û herwiha gel jî li wir amade bû” (Fariqî, 2014:505). Piştî mirina Mîr Nîzameddîn jî dîsa Wezîr Ebû Tahir Selameyê kurê Enbarî rêvebirîya dewletê xist bin kontrola xwe û çu gazî Nesruddewle Ebû'l-Muzafer Mansûr kir (Fariqî, 2014:516).

Ji agahîyên ku Fariqî dide tê famkirin ku di Mîrnişîna Merwanîyan da kesekî ne misilman jî dikarîbû bibûna wezîr. Lewra wezîrê Nasiruddewle Mensûr, Ebû Salim kesekî fileh bû. Wexta Nasiruddewle Mensûr derket derveyê Meyyafariqînê rêvebirîya welat hemû xistibû destê wî û hevsera wî (Fariqî, 2014:518).

1.3. Walî

Mîrên Merwanîyan li Meyyafariqînê diman û ew bajarên din bi destê walîyan dihatin îdarekirin. Walîyên li bajarên Merwanîyan pere li ser navê mîr derdixistin û xutbe jî li ser navê wî didan xwendin. Agahîyên kesên ku di serdema Merwanîyan da walîfî kirine di pirtûka Fariqî da wiha derbas dibin: “Di serdema Mumehîduddewle da rêvebirîya Amedê ket destê Ewdulber. Mumehîduddewle bi şertê ku salê du sed hezar dirhemî bidîyê, sikeyan li ser navê wî derxe û xutbeyan jî li ser navê wî bide xwendin rêvebirîya Ewdulber a Amedê pejirand.” (Fariqî, 2014:463). Piştî ku Îbnî Dimne Ewdulber kuşt û ket cihê wî nameyek ji Mumehîduddewle ra şand û xwest ku wî wekî walîyê Amedê bipejirîne. Piştî qebûlkirina mîr Îbnî Dimne bû walîyê Amedê (Fariqî, 2014:464).

Di serdema Ebû Elî û Mumehîduddewle da jî Xoce Ebû'l-Qasim walîfîya Erzenê dikir (Fariqî, 2014:469). Piştî ku Nesruddewle Amed ji Îbnî Dimne stand kurê xwe Ebû'l-Hesen kir walîyê Amedê (Fariqî, 2014:484).

1.4. Karên Dîwan û Nivîsvanîyê

Di serdema Merwanîyan da di rêvebirîya dewletê da ji xeynî wezîr û walîyan di qesrê da kesên ku karê dîwan û nivîsvanîyê dikirin jî hebûn. Hem di têkilîyên navxweyî û hem jî di yê derveyî da rola van kesan hebû. Agahîyên derheqê karê dîwan û nivîsvanîyê da di berhema Fariqî da wiha derbas dibin: "Piştî ku

Nesruddewle kurê xwe ji bo walîtiyê danî Amedê û katibekî bi navê Îbnî Xemmar jî danî cemê" (Fariqî, 2014:484).

Di dema Nesruddewle da li ser navê wezîr, Îbnu'l-Bereke karê dîwanê dimeşand. Karê nivîsîna nameyan û nivîsvaniyê jî Şêx Ebû Nasir Menazî dikir Ebû Nasir ji Melazgirdê bû, helbestvanekî jêhatî bû. Çend caran bi qasidî çûbû Qonstantînyeyê cem qralê Romê. (Fariqî, 2014:486).

Lê ji agahiyên Îbnu'l-Ezreq tê famkirin ku nivîsvanê taybet ê artêşê bi xwe jî hebû. Lewra rojekê di navbera nivîsvanê Artêşê Ebû Hekîm û xulamekî mîr da gengeşî derdikeve. Ebû Hekîm serê xulam dişkîne û li ser vê xulam diçe li cem Nesruddewle gilîyê wî dike. Nesruddewle gazî Ebû Hekîm dike, lê Ebû Hekîm diçe xwe davêje mala kurapekî Nesruddewle yê bi navê Mîrzebanê kurê Belaşo (Fariqî, 2014:493).

2. PERGALA HIQÛQÊ

2.1. Qazîti û Darizandin

Di dewleta Merwanîyan da qazîyan karê darizandinê dimêşand û ev qazî alîyê mîr ve dihatin tayînkirin (Ripper, 2012:513). Dema qazîyekî nû dest bi peywira xwe dikir fermannameya Derheqê tayîna wî da di xutbeyê da dihat xwendin (Fariqî, 2014:504). Qazîyê ku cara yekem Îbnu'l-Ezreq qala wî dike Elîyê kurê Ehmed e û di sala 998an da li Meyyafariqînê miriye. Piştî wî Hesenê kurê Munzir ku li cem serokê qazîyên Bexdayê xwendibû hat, bû qazîyê Meyyafariqînê û heta sala 1010an qazîtiya vê derê kir. Piştî wî Ehmedê kurê Hamid bû qazîyê vê derê û sala 1020an qazîtiya vê derê kir (Fariqî, 2014:462).

Qazî Ebû Elî Hesenê Amedî jî, ku wekî Îbnî Bexel dihat naskirin, bû qazîyê Amedê. Îbnî Bexel yek ji giregirên Amedê bû. Mirovekî dewlemend bû. Qedr û qîmeta wî li cem Nesruddewle pir bû û li cem rêvebirê dewletê jî cihekî wî yê taybet hebû (Fariqî, 2014:491-492).

Di sala 1019an da Qazî Ebû Abdullah Huseyinê kurê Seleme jî bû qazîyê Meyyafariqînê û demekê wî û Şêx Ebû Mihemedê kurê Mîxfer qazîtiya wir bi hev ra meşand. Piştra Ebû Abdullah Huseyinê kurê Seleme bû qazîyê Amedê. Ebû Abdullah qazîtiya Meyyafariqînê û Amedê bi hev ra dimeşand (Fariqî, 2014:479). Qazî mehekê li Meyyafariqînê û mehekê jî li Amedê dima. Çardehê mehê digel maiyeta xwe sazbandên xwe û temamê pêdiviyên xwe ji Meyyafariqînê derdiket, her wiha kesên ku li karê qazîti û darizandina Amedê jî dinêrtin bi vî awayî heman rojê derdiketin û ber bi wan ve dihatin. Her du alî li navbera Meyyafariqînê û Amedê, li Qasimiyê hev didîtin. Wê şevê li wir diman û roja din kesên ku ji Meyyafariqînê bi qazî ra hatibûn dîsa vedigerîyan Meyyafariqînê û Huseyinê kurê Seleme jî bi kesên ku ji Amedê hatibûn ra diçû Amedê û mehekê li wir dima. Meha din jî bi vî awayî qazî dîsa diçû Meyyafariqînê (Fariqî, 2014:484).

Piştî mirina Ebû Abdullah Huseyinê kurê Seleme, Ebû Murca bû qazîyê Meyyafariqînê. Li gor Fariqî, Ebû Murca hiqûqnasekî hêja û baş bû. Lêbelê Ebû Murca hat kuştin û jîyana wî bi awayekî hovanê bi dawî bû. Îbnu'l-Ezreq derheqê kuştina wî da van agahîyan dide: "Rojekê nivîsyanê Ebû Murca li ser navê Qazî nameyek ji hevaleyê xwe ra şand Mûsilê û çend pirtûkên fiqhê ku li Meyyafariqînê peyda nedibûn, jê xwestin. Dema mîr bi vê nameyê hesîya qazî qazî kir û ev name jê pirsî, lê qazî got: 'Haya min jê tune ye'. Nivîsyanê qazî rastîya meseleyê got, lê kesî jê bawer nekir û Qazî Ebû Murca hat kuştin. Piştî kuştina Ebû Murca di sala 1045an da Ebû Mensûrê kurê Şazanê Tûsî bû qazî. Tûsî mirovekî zana û hiqûqnas bû (Fariqî, 2014:498). Lê bi teşebûsa Îbnî Cehîr, qazî ji Ebû Mensûr hat standin û qazîyê Amedê Ebû'l-Qasim bû qazîyê Meyyafariqînê. Lewra bavê Ebû'l-Qasim, Ebû Elîyê kurê Bexel qazîyê Amedê bû û wî qencî bi Fexruddewle kiribû û ew anîbû li welatê Merwanîyan kiribû walî. Paşê Nesruddewle, Qazîyê Amedê Ebû Elî Bexel avêt girtîgehê û dest danî serê qismekî ji malê wî" (Fariqî, 2014:504).

Li welatê Merwanîyan piştî sala 1076an peywira qazîyê bi destê lijneyekê hat meşandin. Di nav vê lijneyê da Îbnî Amir, Îbnî Zeydan û zarokên Qazî Elîyê kurê Bexel hebûn (Fariqî, 2014:515).

2.2. Qanun û Cezakirin

Îbnu'l-Ezreq behsa cezakirina Qazî Îbnî Mûrca dike. Li gor agahîyên wî Ebû Murca dixin bircekê û derîyê bircê li serê diseyînin û heta ku dimire di nava vê bircê de dimîne (Fariqî, 2014:498).

Dema ku di sala 1109an da Meyyafariqîn ket destê Sokmanê mîrê Xelatê li wir avahîyeke îşkenceyê hebû û ev der ji bo lêdanê dihat bikaranîn. Piştra bi fermana Sokman ev der hat xerabkirin (Fariqî, 2014:491-492). Lê ev avahî kengî hatiye çêkirin û ji kengî ve hatiye bikaranîn nayê nizanin, lewra Fariqî derheqê wê da tu agahîyên din nedane.

3. ZANIST û HUNER

3.1. Zanyarî û Teknîk

Gelek alim û zana li welatê Merwanîyan hebûn. Yek ji van jî Ebûbekirê kurê Sedeqe bû. Li gor Îbnu'l-Ezreq, dema siltan ji bo walîtiya welatê Merwanîyan bidîyê gazî Amîduddewle kir Ebûbekirê kurê Sedeqe jî pê ra çû Esfehanê. Li gor neqla Îbnu'l-Ezreq ev kes alîmekî mezin bû. Lewra li medreseyan Esfehanê bi alîmekî bi navê Muştâ ra ketibû minazereyê û navê wî li her derê belav bûbû (Fariqî, 2014:527).

Kesekî din jî yê ku bi ilm û zanîna xwe derdikeve pêş Ebu'l-Qasim e. Ebû'l-Qasim Huseyinê kurê Elîyê Mexribî yek ji wezîrê Nesruddewle ye (Fariqî, 2014:485). Li gor Îbnî Xelikan Ebû'l-Qasim xwedî dîwan e û gelek berhemên wî yên navdar hene (Îbnî Xelikan, 1978:177).

Di dewleta Merwanîyan da girîngî bi pirtûkan, komkirina wan û avakirina pirtûkxaneyan dihat dayîn. Di berhema Îbnu'l-Ezreq de derheqê sazkirina pirtûkxaneyên serbixwe de agahî tunin. Lêbelê li gor agahîya ku Îbnu'l-Ezreq dide di dema Nesruddewle da hin xebatên komkirina pirtûkan hatine kirin. Îbnu'l-Ezreq vê agahîyê wiha dide: “Şêx Ebû Nesr Menazî⁴ ku karê nivîsvanîya dewletê dimeşand gelek pirtûk kom kirin û ji van pirtûkan hin li Meyyafariqînê hiştin hin jî birin Amedê. Ev pirtûk li her du bajaran di mizgeftê da bi cih kirin ku ev pirtûk hêja dimînin û wekî pirtûkên Menazî tînin zanîn” (Fariqî, 2014:486).

Hin agahîyên Derheqê çêkirina alavên teknîkî da di berhema Îbnu'l-Ezreq da wiha derbas dibin: “Di nava seyrangeha Nesriyeyê ya ku Nesruddewle ava kiribû da bi saya dolabekê av ji çem dihat kişandin û bi vê avê baxçe dihatin avdan û hewz dihatin dagirtin” (Fariqî, 2014:489). Nesruddewle di mizgefta Meyyafariqînê da bi pereyên xwe yê şexsî binqamek⁵ çêkiribû (Fariqî, 2014:491). Bi saya vê binqamê gengeşîya di nav gel de ya ji bo avê çareser bûbû (Beysanoğlu,1996:1999).

3.2. Helbest

Ji gotinên Îbnu'l-Ezreq tê famkirin ku mîrên Merwanîyan, bi taybetî jî Nesruddewle, gelek qîmet daye helbestvanan. Helbestvan Tihamî hatiye cem Nesrûdewle û di helbestên xwe de pesnê wî û wezîrê wî daye. Helbestvanên bi navê Qaid Ebû'r-Ridyê kurê Zerîf⁶, Îbnî Sewdawî û Îbnî el-Xedirî jî hatine û ketine xizmeta Mîr Nesruddewle. Wekî din jî helbestvanên gelek welatan di gelek helbestên xwe da pesnê Nesruddewle dane. Helbestvan Sarî Dela di gelek helbestên xwe da pesnê Nesruddewle daye (Fariqî, 2014:490).

Dema mîrek dîmir helbestvan li wir amade dibûn û zêmar li ser mîr dixwendin. Dema Mîr Nesruddewle û Mîr Nîzameddîn mirin, berî ku wan defin bikin helbestvanan li ser wan zêmar xwendin (Fariqî, 2014:505,517).

Di dema Nesruddewle da helbestvanekî Melazgirdî bi navê Şêx Ebû Nasir ku Îbnu'l-Ezreq pir pesnê wî dide û dibêje mirovekî baş û helbestvanekî jêhatî ye, karê nivîsvanîyê dimeşîne (Fariqî, 2014:498). Li gor agahîyên ku Îbnu'l-Ezreq dide nivîsvanê Qazî Ebû'l-Murca Ebûbekir jî helbesetvanekî bi navê Îbnu'l-Fatîrî bû (Fariqî, 2014:498). Ev agahî nîşan didin ku mîrên Merwanîyan qedr û qîmet dane helbestvanan.

⁴ Li gor Bozarşan ji ber ku ji Melazgirdê ye ev nav lê hatiye kirin (Bozarşan, 1990:134)

⁵ Der heqê binqamê de di Burhan-i Qati de ev agahî hene: Binqam peyveke farisî ye. Bi gelemperî ji bo tasik an jî qedehê tê bikaranîn. Cûreyekî tasê ye ku bêtir li cem gundîyên Hindê tê naskirin. Berê bi vê tasê av dihat parvekirin. Binê qul bû û dema dora yekî dihat ji bo ku rez û bexçeyê xwe av bide diavêt nav avê û heta tasik tije dibû dor ya wî kesî bû (Beysanoğlu,1996:1999).

⁶ Di eslê berhemê de wekî "Terîf" derbas dibe. Navê wî ebû Reda Fedlê bîn Mensûr el-Fariqî ye. Di sala 1039an de miriye. Ew dîwana wî heye (Fariqî, 2014:505; el-Xûlî û Baluken, 2014:490).

Rojên cejnan li pêşberî mîr digel rêvebirên dewletê û kesên ku ji dewletên din dihatin helbestvan jî amade dibûn. Roja cejnê ya sêyan qasidê xelîfeyê Bexdayê û yê Romê dema hatin cem Nesruddewle helbestvan jî li wir amade bûn (Fariqî, 2014:476).

Wexta welatê Merwanîyan ketibû destê walîyên Selçûqîyan, demekê ev welat bê walî mabû. Gelek giregirên bajêr xwestibûn ku diwa walîyekî Selçûqî bê û wî welatê bi rê ve bibe. Lêbelê helbestvanekî bi navê Îbnî Esed hin xwendeker û dikandar li xwe civandin û wan welat parast û Meyyafariqîn radestî Nasiruddewle Mensûr kir (Fariqî, 2014:529-530). Ev helbestvan rojekê li Heranê çû cem siltanê Selçûqî jê ra helbestek xwend. Lê dema ji siltan ra hat gotin ku ev helbestvan ew kesê ku gazî mîrê Merwanî kir û Meyyafariqîn radestî wî kir. Îbnî Esed bi fermana siltan tê kuştin (Fariqî, 2014:531).

4. ARTÊŞ û EWLEHÎ

4.1. Artêş

Di dewleta Merwanîyan da artêşeke birêkûpêk ku her tim amade hebû û pêdivîya vê artêşê ji aliyê dewletê ve dihatin dabînkirin. Ji xeynî vê artêşê şervanên ku bi dildarî ji bo welat şer dikirin jî hebûn (Yûsuf, 2001:125). "Bingeha artêşa Merwanîyan ji eşîreta Humeydî û Beşnewîyan⁷ pêk dihat (Lazarev û yên din, 2010:63).

Li gor agahîyên ku Fariqî dide artêşa Merwanîyan di bin fermana femandarekî giştî da bû. Lewra dema Nesruddewle mir wezîr serokê artêşê şand mala Mîr Nîzameddîn û gazî wî kir (Fariqî, 2014:505). Herwiha em dizanin ku Îbnî Felyusê xulamê Şêro jî berpirsîyarê karê asayîşê bû (Fariqî, 2014:466).

Artêşa Merwanîyan ji kurdan û wan gelên din ên wekî ereb, suryanî, ermen, turkmen û gurcîyan pêk dihat (Yûsuf, 2001:127). Di dema Mumehîduddewle da xanedanekî gurcî ji ber qralê gurcî revîyabû û digel girseya pê ra hatibû ketibû bin xizmeta mîrê Merwanî (Fariqî, 2014:471). Leşkerên gurcî yên di artêşa Merwanîyan da cih digirtin ev kes bûn.

Em ji agahîyên Îbnu'l-Ezreq fam dikin ku hin cihên weqîfkirî ji leşkeran ra hatibû veqetandin. Lewra bazirganekî bi navê Îbnu'l-Behat gundekî bi navê Benînûh kiriye û ji bo leşkeran weqîf kiriye (Fariqî, 2014:500).

4.2. Çek

Em ji berhema Îbnu'l-Ezreq fam dikin ku di dewleta Merwanîyan gurz û tîr wekî çekekê hatine bikaranîn. Lewra Ebû Tahir Yusuf Îbnî

⁷ Her çîş di nav pirtûka Lazarev de navê van eşîran Humaydî û Başnawî hatibe nivîsandin ji li gor telifûza rastî navê van eşîran Humeydî û Beşnewî/Becnewî, ye. Li heremê li gor devokên di nav Kurdan de tê bi kar anîn elbet guherto û versiyonên din hebin ji ev yek normal tê qebûl kirin. Me li wir kar anîna devoka Kurd hilbijart.

Dimne bi gurzê li serê Mîr Ebû dixê û wî dikuje (Fariqî, 2014:452). Herwiha leşkerên dewleta Merwanî tîr bi kar anîne heta di nav leşkerê Merwanî da komek tîravêjên gurgî hene. Ev tîravêj ji gurgîyan pêk tên û di dema desthilatdariya Şêro ya Meyyafariqînê da bi fermana Îbnî Felyûsê kurê Şêro ev leşkerên gurgî bi tîrên xwe gelek kesan dikujin (Fariqî, 2014:471).

5. AVAHÎSAZÎ Û BAJARVANÎ

5.1. Sûr

Sûrên Meyyafariqînê di serdema gelek dewletan da li ser piyan mane. Di dema Merwanîyan da jî gelek cihên sûran ji nû ve hatine çêkirin. Birayê Bad Ebû Fewaris, Ebû Mensûr Mumehîduddewle, Ebû Elî cihên xerabe yên sûran restore kirine û navê xwe li ser van sûran nivîsîne. Nesruddewle û Nîzameddîn jî gelek sûr û birc dane çêkirin. Bi vî awayî sûrên Meyyafariqînê tamîreke baş dîtine (Fariqî, 2014:498).

Îbnu'l-Ezreq dide zanîn ku cara pêşî birayê Bad Ebû Fewaris di nava du salan da cihên xerabe yên sûrên Meyyafariqînê çêkirin û herwiha navê wî li ser çend cihên sûran hatiye nivîsîn (Fariqî, 2014:450). Piştî ku Amed ketiye destê Îbnî Dimne wî jî sûr qamekê bilindtir kirine. Ew cihê ku Îbnî Dimne çêkirine hêjî diyar e (Fariqî, 2014:464).

Mumehîduddewle gelek deverên sûrên Meyyafariqînê çêkirin. Ji aliyê hindir ve li bîst û du cihan û li gelek deverên hindir jî navê wî nivîsandiye. Sih û tişteke deverên sûrên wê çêkirine. Dîsa birca ber deriyê navîn xerab bûbû Mumehîduddewle ev der çêkiriye. Deriyê Qulfayê ku di navbera du bircan da ye jî Mumehîduddewle vekiriye (Fariqî, 2014:466). Îbnu'l-Ezreq dibêje ku ji aliyê hindirê sûran ve neh dever û ji derve ve jî sih û tişteke dever ji aliyê Nesruddewle ve hatine çêkirin û Fariqî dibêje “min bi xwe ev jimartine”. Herwiha bi taybetî ji bo mesrefa çêkirina sûran weqîf hatibûn çêkirin. Lewra Nesruddewle ji bo sûran gelek gund û cihên din weqîf kiribûn. Mesela Hemama Eqabe û Hemama Nû ku li deşta Şûrçanê hatibû çêkirin ji bo sûran hatibûn weqîf kirin (Fariqî, 2014:498).

Wextê Îbnu'l-Ezreq qala serdema Mîr Nîzameddîn dike dibêje di dewra Mîr Nîzameddîn da gelek karên avahîsaziyê li Meyyafariqînê hatin kirin. Mîr Nîzameddîn gelek deverên sûrên Meyyafariqîn û Amedê bilind kirin. Li ser van deveran hem jî aliyê hindir û hem jî ji aliyê derve navê wî hatiye nivîsîn (Fariqî, 2014:516).

5.2. Birc

Li gor agahîyên ku Fariqî dide di sala 1070yî da Mîr⁸ Nîzameddîn tebeqeya çaran avêt ser birca mîr a li Meyyafariqînê. Bepirsîyarê çêkirina vê bircê Qazî Ebû Nesr Hîbetullahê kurê Şazî bû û mesrefa wê jî siltan ji kîsê xwe da. Di serdema Mîr Nîzameddîn da li ser derîyê hindirê bajêr du birc hatin çêkirin li ser van bircan dûrbîn û eynik hene. Ev birc di bin bepirsîyarîya Ebû'l-Hesen Ehmedê kurê Bexel da hatin çêkirin û li ser wan navê wî hatiye nivîsîn (Fariqî, 2014:515).

5.3. Keleh

Fariqî di berhema xwe da behsa çêkirina kelehê dîke. Ev agahî di Tarîxu Meyyafariqînê da wiha derbas dibe: “Nesruddewle kelehê di navbera sînore xwe û Senasînayê da bi pereyê xwe yê şexsî ava kir. Ev bû bend û sînore û welatê Merwanîyan li dijî Senasînayê parast.” (Fariqî, 2014:500).

5.4. Qesr

Piştî ku rêvebirîya Amedê ket destê Îbnî Dimne wî li rojhilatê bajêr li alîyê çemê Dîjleyê qesrek ava kir. Li alîyê çem derîyekî vê qesrê vekir û navê vir kir Derîyê Avê.⁹ Piştî ku Nesruddewle Meyyafariqîn ji Şêro stand û xist bin desthilatdariya xwe di sala 1013yan da li rex birca hikûmdariyê qesrek çêkir. Pereyekî pir li vê qesrê xerc kir û qesreke gelek sipehî ava kir. Dîwar û qarçikê wê bi nexşê zêrîn xemilandin (Fariqî, 2014:476).

5.5. Pir

Merwanîyan bacên ku piranîya wan ji karê bazirganîyê bi dest dixistin ji bo çêkirina rêyan xerc dikirin (Ripper, 2012:468). Li gor agahîyên ku Fariqî dide Nesruddewle li ser Çemê Hewê pirek da çêkirin. Bûyera çêkirina vê pire di berhema wî da wiha derbas dibe: “Di serdema Mîr Ebû Elî da dema Ebû Elî ji Meyyafariqînê ber bi Amedê ve diçû Nesruddewleyê birayê Ebû Elî jî pê ra bû. Piştî ku baran barî û çemê Hewê rabû wan nikaribû derbasî alîyê din bibin. Ancax roja din bi zorê di nav av û herîyê da derbasî alîyê din bûn. Hêja di wê rojê da Nesruddewle ji xwe ra gotibû: ‘Eger rojekê Xweda mîrîtyê bike nesîbê min ji bo ku gel di ser ra derbas bibe ez ê pirekê li vir çêbikim’ (Fariqî, 2014:461). Piştî ku Îbnû'l-Bexl bû qazîyê Amedê Nesruddewle jê xwest ku pirekê li ser çemê Hewê çêbike û di sala 1040î da li vir pirek hat çêkirin. Navê kurê mezin ê Mîr Nesruddewle û mirovekî ji gelê Amedê bi navê Îbnî Uqeylî û agahîyên derheqê qazîtiya Ebû Elî da li ser vê pire hatin nivîsîn (Fariqî,

⁸ Di eslê metnê de siltan hatiye nivîsîn. Mîmkun e ji ber ku berê Nîzamîlîmîk bernavê "Siltanê Mîran" dabû Mîr Nîzameddîn ev peyv hatiye bikaranîn (Fariqî, 2014:505; el-Xûlî û Baluken, 2014:515).

⁹ Dibe ku ev ew derîyê ku niha wekî “Yeni Kapi/Derîyê Nû” tê binavkirin be (Bozarlan, 1990:95).

2014:492). Li gor agahîyên ku Beysanoğlu dide ev pira ku Îbnu'l-Ezreq qala wê dike li ser rêya Farqîn û Diyarbekirê ye bi 12 kîlometran dûrî bajêr e û li ser çemê Enbarê ye. Ev pir piştra xerab bûye û di sala 1223yan da bi awayekî xweşik hatiye tamîrkirin. Wisa xuya dike ku ev nivîsên li serê yên ku Îbnu'l-Ezreq qala wan dike hingê xerab bûne "(Beysanoğlu,1996:200). Pira din a ku di serdema Nesruddewle da çêbûye pira li seyrangeha wî ya Nesriyeyê ya li ber girê Benanê ye (Fariqî, 2014:489).

Mîr Nîzameddîn jî di sala 1080yî da li rojhilatê Amedê li ser Çemê Dîjleyê pirek çêkir. Temamê mesrefa vê pirê ji pereyên xwe yên şexsî dan û berpirsariya çêkirîna wê Wezîr Ebû'l-Fadl Îbrahîmê kurê Enbarî kir (Fariqî, 2014:516). Navê vê pirê di nav gel da wekî Pira Dehderî¹⁰ tê zanîn. Lê ev pir berê jî hebû. Di sala 974an da Ji hêla Împeratorê Bizansê Juannes ve hatibû xerabkirin û Mîr Nîzameddîn ev der ji nû ve çêkir. Îbnu'l-Ezreq dîroka çêkirina wê wekî 1080ê daye (Fariqî, 2014:516) lê li gor Beysanoğlu ji nivîsa ser pirê tê famkirin ku ev pir di sala 1065an da çêbûye (Beysanoğlu,1996:221).

5.6. Qenalên Avê

Li gor agahîyên ku Fariqî dide di rêvebirîya Merwanîyan da qenalên avê carinan bi destê mîrekî (Fariqî, 2014:476) carinan bi pereyên weqfê û carinan jî bi piştgirîya kesên dewlemend dihatin çêkirin. Li gor Îbnu'l-Ezreq ji serêkanîyê¹¹ sê qenalên avê dihatin nava Meyyafariqînê (Fariqî, 2014:499).

Di sala 1013yan da piştî ku Nesruddewle qesreke nû li Meyyafariqînê ava kir ji serê kanîyê qenaleke avê kişand qesrê û li wir hemam û hewz çêkirin (Fariqî, 2014:476). Îbnî Şelîta, berpirsare weqfan, ji mal û tiştên weqfan gelek pere berhev kiribûn û bi wan pereyan ji serê kanîyê qenaleke avê kişand nava Meyyafariqînê. Gelek pere li vê qenalê xerc kirin û qenaleke pir zexm çêkir. Ev qenal di binê Mizgefta Serêkanîyê ra derbas dibû û ji aliyê rojhilat ve di nîvê Rabadê diçû û ji wir digihîşt Derîyê Avê û binê birca mîr. Ji wir jî diçû digihîşt derîyê bircek ji ya Derîyê Qulfayê û bi vî awayî av derbasî rojavayê bajêr dibû (Fariqî, 2014:499).

Di serdema Nesruddewle da bazirganekî bi navê Ebûbekir Mihemedê kurê Cerî hebû, wî jî qenaleke avê kişand nava Meyyafariqînê. Ebûbekir ji aliyê rojava ve qenal anî ber sûran û ji wir jî derbasî baxçeyê sûra biçûk kir. Heta ku gihand vir pêncî hezar dînar mesref lê kir. Piştra çû cem mîr ji bo ku sûrê qul bike jê destûr xwest, piştî mîr destûr dayê sûr qul kir û qenal bir nava her du sûran û ji wir jî bir serê kanîyê. Piştra ev qenal li nava bajêr gerand bir mizgeft û Bazargeha Qubê. Ebûbekir ev qenal di ber mala xwe ra derbas kir lê av jê nekişand mala xwe. Dema sedema vê jê pirsîn wiha got: "Weleh ez ji vê qenalê avê nakişînim

¹⁰ Di pirtûka Behsanoğlu de der barê vê pirê de agahî hene. (Beysanoğlu,1996:221).

¹¹ Xuyaye ku Serêkanîyê kaniyeke bi navê kanîya mezin ku niha jî li bakurê bajêr dimîne ye (Beysanoğlu, 1996:221).

mala xwe. Eger ez bikişînin dê bibêjin Ebûbekir, ev av ji bo mala xwe û feyda xwe anîye" (Fariqî, 2014:499-500).

5.7. Seyrangeh

Nesruddewle ji bo xwe, malbat û pismamên xwe seyrangeheke bi navê Nasiriyeyê li qiraxa çem ava kiribû. Di nava vê seyrangehê da jî qesreke xweşik, bazargeh û hemam çêkirin û ji bo her kurekî xwe û kurapekî xwe xanîyek tê da ava kiribû (Fariqî, 2014:489).

5.8. Qub

Li gor agahîya ku Ibnu'l-Ezreq dide piştî ku birayê Bad, Ebû'l-Fewaris hat kuştin li cihê ku hat binaxkirin qubek hat çêkirin û herwiha piştî vê li wir gelek qubên din hatin çêkirin û ji vir ra Qubên Ebû'l-Fewaris tê gotin (Fariqî, 2014:452).

5.9. Mizgeft

"Nesruddewle di sala 1024an da minareya mizgefta Rabadê çêkir (Fariqî, 2014:482). "Di cihê vê mizgefta ku Ibnu'l-Ezreq qala wê kiriye da îro tiştêk nemaye" (Beysanoğlu, 1996:196).

"Nesruddewle di sala 1033yan da Mizgefta Muhdeseyê¹² ava kir û temamê mesrefa vê mizgeftê ji pereyên xwe yê şexsî dan û herwiha hin weqif jî ji bo vê mizgeftê çêkirin (Fariqî, 2014:488).

5.10. Nexweşxane

Li gor agahîyên ku Fariqî dide Nesruddewle di 1024an da bi pereyên xwe yê şexsî nexweşxaneyek ava kir (Fariqî, 2014:531). Îro li cihê vê nexweşxaneyê tiştêk nemaye (Beysanoğlu, 1996:196).

6. JÎYANA ABORÎ Û BAZIRGANÎYÊ

6.1. Aborî

Berî desthilatdariya Merwanîyan nêzî niv sedsalî welatê Merwanîyan di bin desthilatîya Hemdanîyan da bû. Di vê serdemê da ev welat di warê çandînî, huner û aborîyê da bi pêş neketibû. Di serdema Merwanîyan da ev pêşketin pêk hat. Yûsif sedemên sereke yê pêşketinê bi îstîqrar û aşîtiya di nav welatê Merwanîyan ve girê dide û dibêje: "Ji sala 993yan heta dawîya 1026an ango sih û pênc salan û ji sala 1036an heta sala 1083yan ango 49 salan şer û pevçûn di navbera Merwanîyan û tu mîrnişîn û dewletan da çênebûn. Ev şert û merc bûn sedemên pêşketina pîşesazî, aborî, çandînî û bazirganîya welatê Merwanîyan (Yûsuf, 2001:177).

¹² Muhdese leşkergeheke li derveyê Meyyafariqînê bû. (Beysanoğlu, 1996:198).

Di serdema Mumehîduddewle da rewşa Merwanîyan a aborî pir ne baş bû. Bi taybetî ji ber xelaya ku di vê serdemê da didome bihayê tiştan gelek zêde bûye heta li gor neqla Îbnu'l-Ezreq di serdema Mumehîduddewle da ji ber xelayê bihayê elbek genim bûye deh zêr (Fariqî, 2014:469). Lê di serdema Nesruddewle bi taybet bi sedema meşandina siyaseteke biîstîqrar dewlet di warê aborî û bazirganîyê da gelekî bi pêş ketibû. Li gor Fariqî di serdema Nesruddewle da di welat da aşî û aramî hebû û mîr bi gel ra bi edalet tevdigerîya. Di serdema wî da bajarê Meyyafariqînê bi pêş ketibû û ji her derê bazirgan û mirovên din dihatin vir (Fariqî, 2014:478).

Di warê vê pêşketina aborî da cudahî di navbera Meyyafariqîn û Amedê da hebû û vê rewşê gelê Amêdê aciz dikir. Wan dixwest têkilîya xwe ji Meyyafariqînê bibirin û xweser bibin (Ripper, 2012:294). Mîrov dikare vê bûyera ku Mîr Ebû Elî ji alîyê rêvebirên Amedê ve hat kuştin (Fariqî, 2014:461) û Amed bîst û heşt salan ji destê Merwanîyan derket bi vê rewşê ve girê bide (Fariqî, 2014:481).

Dema Îbnu'l-Ezreq behsa xweşî, îstîqrar û dadmendîya serdema Nesruddewle dike bûyereke musadereyê¹³ jî wiha neqil dike: "Di dewra Nesruddewle da zilm li kesî nehatibû kiran û ji xeynî Şêx Ebûbekirê kurê Cerî dewletê dest nedanî ser malê kesî. Sedema destdanîna li ser malê Şêx Ebûbekirê kurê Cerî ev bû: Şêx Ebûbekir dostê hikûmdarê Senasîna bû û ji mîr ra hat gotin ku Şêx Ebûbekir têkilî bi hikûmdar ra danîye û dixwaze bajêr radeştî wî bike. Bi fermana Nesruddewle leşkeran avêt ser mala wî û gelek çek di mala wî da hatin girtin. Ji bo vê yekê rayedarên dewletê dest danîn ser mal û çekên wî. Bahayê mal û çekên wî ku dewletê dest danîbû serê, çar sed hezar dînar bûn. Ji ber ku rayedaran agahî şaş dabûne mîr û ev musadere pêk hat, hekena heta niha nehatibû dîtin ku Nesruddewle yek dirhemek jî ji kesekî sitendibû" (Fariqî, 2014:500-501). Di serdema Nesruddewle da gelek pere hatin xerckirin û di nav beçxeyê Reîs Elîyê kurê Mensûrê kurê Kek da kargehek hat avakirin (Fariqî, 2014:501).

6.2. Bazirganî

Cihê Merwanîyan ê stratejîk di warê bazirganîyê de hin avantaj bi xwe ra anîbûn. Meqdisî ku di dewra Merwanîyan da jîyaye ev taybetî wiha anîye ziman: "Welatê Merwanîyan wê demê di navbera Bîzansîyan û paytexta Ebasîyan da bû û di navbera Rojhilat û Asyaya Biçûk da wekî pirekê bû. Bajarê Amedê li ber qeraxa Dîjleyê bû û ev der navendeke aborîyê bû. Di ser vir ra tiştên welatê kurdan û welatê Rojhilat ên din diçûn Asyaya Biçûk. Di heman demê da jî ev der ji bo tiştên ku ji welatên Bîzansîyan tîne wekî bazargehekê bû. Di sedsala X'an da malê ku ji Bîzansê dihat di ser Amedê ra diçû Bazargehên Bexdayê" (vgz. Yûsuf, 2001:47-48). Qumaşekî ku di sala 1940î da li Milanoyê derket holê û navê Nesruddewle li ser nivîsandî bû vê rastîyê nîşan dide (Ripper,

¹³ Destdanîna ser tiştêkî, jê stendin (Farqînî, 2013:850)

2012:15). Bajarê Meyyafariqîn û Amedê li ser rêyên bazîrganî yê navneteweyî bûn û sedema sereke ya vê pêşketina aborî ev bû. Li gor neqla Gabriel, dema Ebû'l-Ala Maarrî ji Bexdayê vedigere welatê xwe yê li bakurê Surîyeyê digel ku dûrbûna wê jî, ji ber arambûn û ewlehîyê rêya Diyarbekirê tercîh dike (vgz. Ripper 2012:89).

Di welatê Merwanîyan da ji bo bazargehan cihekî taybet heye. Fariqî di berhema xwe da der barê bazargeha Meyyafariqînê û Amedê da gahîyan dide û wiha dibêje: Li Bazargeha Qumaşfiroşan bûbû eded ku kesekî nikaribû bi siwarî di navê ra derbas bibe. Rojekê kurapekî mîr ê nêzî wî di vir ra derbas bû. Kesên bazargehê bertek nîşanî wî dan û cihê ku hespê wî lewitandibû pê dan paqijkirin (Fariqî, 2014:456). Dîsa em ji gotinên Fariqî fam dikin ku li Amedê bazargeha zad û zexîreyan bi rêkûpêk dihatin îdarekirin. Serokekî vir hebû û ev kes ji girêgirên bajêr dihat hilbijartin. Di serdema Mîr Ebû Elî û Mumehîduddewle da serokê vê çarşîyê kesekî bi navê Ewdulber bû (Fariqî, 2014:460). Wekî din navên sê bazargehên Meyyafariqînê jî di berehema Îbnu'l-Ezreq da derbas dibin. Yek jê Bazargeha Qumaşfiroşan, yek Bazargeha Qubê û ya din Bazargeha Etaran e ku dikana Hekîm Ebû Salim li vir bû (Fariqî, 2014:456,499,518).

Dema Îbnu'l-Ezreq qala xweşî û aramîya di serdema Nesruddewle da dike qala bazîrganekî bi navê Îbnu'l-Behat dike bê çawa di rojekê da pênc sed dînarên Armanosî¹⁴ kar kirine. Fariqî vê bûyerê wiha neqil dike: “Li Meyyafariqînê simsarekî bi navê Îbnul-Behat hebû. Rojekê karwanek hat bajêr û Îbnû'l-Behat hemû malê bi vî karwanî re kirî. Di heman rojê da karwanekî din hat û Îbnu'l-Behat ev mal firote vî karwanî û ji vê bazara ku kirî pênc sed dînarên Armanos kar kirin. Li ser vê Mîr Nesruddewle gazî wî kir. Îbnu'l-Behat çû hizûra mîr û dema mîr rastîya vê bûyerê jê pirsî û Îbnu'l-Behat tiştê ku mîr bihîstibû tesdîq kir û pere danîn ber mîr. Li ser vê mîr wiha got: ‘Bi Xwedê min ne ji bo ku ez van pereyan ji te bistînim gazî te kir. Min xwest ez bizanim ka rast e ku mirovek li welatê min di rojekê da pênc sed dînarî kar dike.’ Mîr sûnd xwar ku tiştêkî ji van pereyan nebe û li ser vê Îbnu'l-Behat jî sûnd xwar ku van pereyan nexe nav malên xwe. Îbnu'l-Behat bi van pereyan gundekî li derdora Amedê kirî. Ev gund li ser keleha Fetrasa ya bi navê Benînûh e. Îbnu'l-Behat ji bo leşkerên ku li Akil¹⁵ û Yemanî û Cebare diman ev der weqif kir (Fariqî, 2014:500).

6.3. Bac

Li welatê Merwanîyan baca hin tiştan dihat standin. Ev bac ya rez û bexçeyên li dora bajêr, ya mêwe, zebze, dexil, êzing û komirê bû (Fariqî, 2014:526). Ji xeynê van, baceya aşarê jî hebû. Lewra Îbnu'l-Ezreq dibêje piştî ku siltanê Selçûqî hat Meyyafariqînê baca aşarê ji ser gel rakir (Fariqî, 2014:530). Em ji agahîyê Fariqî

¹⁴ Agahîyên der heqê pereyên ku ji alfyê Bîzansîyan ve hatine derxistin di berhema di pirtûka Ewdirreqîb Yûsuf de derbas dibin. (Yûsuf, 2001: 114).

¹⁵ “Akil” bajar û keleheke kevin e û nezî Amedê ye niha navê wê “Eğil” e. (el-Xûlî û Baluken, 2014:500).

tê digihîjin ku di serdema Merwanîyan da karê tehsîldarîyê jî heye, lewra Îbnu'l-Ezreq qala kesekî bi navê Mihemed Ebû'l-Hesen dike ku tehsildarê weqfan e (Fariqî, 2014:503).

6.4. Pere

Di dewleta Merwanîyan da dirhem û dînar dihatin bikaranîn. Di heman demê da bi taybetî jî li cihên ji bajaran dûr bi awayê pevguherandina tiştan bazar dihat kirin. Lêbelê qada bikaranîna dirheman bêtir berbelav bû. Dînarên zêr bêtir di bazirganî û di têkilîyên nav dewletê û derveyê dewletê da dihatin bikaranîn (Yûsuf, 2001:105). Mesela dema Ebû Elî keça Sadûddewleyê Hemdanî xwest du sed dirhem wekî next dan (Fariqî, 2014:459). Dema Melik Ezîzê Buweyhî hat cem mîrê Merwanî Nesruddewle bi awayekî xweşik ew pêşwazî kir û bîst hezar dînar danê (Fariqî, 2014:491).

Pereyên ku ji aliyê Merwanîyan ve hatine derxistin di mûzeyaya Brîtanyayê ya li Londonê da hene. Ehmed Etiye jî qala pereyên ku di serdema Ebû Elî da li Cizîrê di sala 995an da û di serdema Nesruddewle da li Xelatê di sala 1011an da hatine derxistin dike û dibêje: "Ji xeynî van deveran li Dineyser, Meyyafariqîn û Amedê jî pere dihatin derxistin" (Vgh. Yûsuf, 2001:112).

Gelek caran rêvebirên dewletê ji bo ku gel û leşkeran bikişînin aliyê xwe devê xezîneya dewletê vedikirin û mal û pere li leşkeran belav dikirin. Li gor neqla Fariqî dema Xoce Ebû'l-Qasim ji bo ku Mîr Ebû Nasir biçê rêvebirîya Meyyafariqînê ji Şêro bistîne û herwiha ji bo ku gel piştgirîya wî bike gelek mal û pere li wan belav kirin (Fariqî, 2014:470). Di heman demê da Şêro jî ji bo gelê Meyyafariqînê piştgirîya wî bikin mal li wan belav kir (Fariqî, 2014:471).

7. BÎR Û BAWERÎ

7.1. Dîn û Mezheb

Em ji gotinên Îbnu'l-Ezreq derdixin ku ji xeynî misilmanan di nava dewleta Merwanîyan da mensûbên dînên din jî hebûn û li hemberî wan siyaseteke baş dihat meşandin. Herwiha di rêvebirîya dewletê û karên din ên cûrbecûr da jî gelek kes ji mensûbên dînên din hebûn. Wezîrê Nasiruddewle Mensûr fileh bû. Ev wezîrê fileh Ebû Salim û hevsera wî Ferîhaya keça Filistîn di qesra Nasiruddewle Mensûr da bûn û qîmeta wan pir bû û karûberên dewletê di destê wan da bûn (Fariqî, 2014:518). Di nav artêşa Merwanîyan da ji xeynî misilmanan leşkerên gurcî jî hebûn (Fariqî, 2014:503) û ji serdema Ebû Elî û vir ve karên Weqfan jî bi destê mirovekî fileh ê bi navê Îbnî Şelîta dihatin meşandin (Fariqî, 2014:499).

Ji gotinên Îbnu'l-Ezreq tê famkirin ku azadiya filehan a dînî piştî ku Meyyafariqîn ketiye destê Selçûqîyan ji holê rabûye. Bi taybetî jî di dema walîyê Selçûqî Ebû Elî Belxî da dengê naqosa filehan hatiye qedexekirin û dêra wan hatiye girtin û bûye mizgeft. Li gor agahiyên Fariqî, Fexruddewleyê ku li

ser navê siltanê Selçûqî welatê Merwanîyan bi rê ve dibir di sala 1086an da hat Meyyafariqînê û dêra Êbadê kir mizgeft. Piştra dîsa filehan pere dan û ev der dîsa kirin dêr. Amîdulmulk Ebû Elî Belhîyê ku siltan walîtîya welatê Merwanîyan dabûyê rojekê dema dengê naqosê bihist, aciz bû û bi fermana wî ev dêr dîsa bû mizgeft (Fariqî, 2014:524).

Heta ku Selçûqî hatin vê herêmê Merwanîyan şêst salî li dijî Buweyhîyên şîî, filehên rom û ermenîyan berpîrsyarîya mezhebê sunîtîyê dikir (Tufantoz, 2005:125). Di warê mezhebê emelî da jî mezhebê Merwanîyan ê fermî şafiîti bû. Piştî ku Merwanîyan desthilatdariya herêmê xist destê xwe mezhebê şafiîtiyê belav kir. Gelek alimê şafiî hatin li welatê Merwanîyan bi cih bûn (Baluken, 2010:35). Bi taybetî bi piştgirîya xelfeyê Ebbasî, şafiîti li welatê Merwanîyan belav bû (Biçer, 2014:122). Di serdema Nesruddewle da di sala 1045an da Ebû Mensûrê kurê Şazanê Tûsî bû qazîyê Meyyafariqînê û di heman demê da jî berpîrsyarîya weqfan jî di destê wî da bû (Fariqî, 2014:498). Di serdema xwe da Tûsî alimekî mezin ê mezhebê şafiî bû (Baluken, 2010:36).

Lê di nav dewleta Merwanîyan da alimên neşafiî jî hebûn. Ebû Evdillâ Huseyinê kurê Ehmedê kurê Seleme malikî bû (Baluken, 2010:42) û di serdema Nesruddewle da Mehekê li Amedê û mehekê li Meyyafariqînê dima û qazîtiya van herdu cihan bi hev ra dimeşand (Fariqî, 2014:479).

Di serdema Merwanîyan da li welatê wan mezhebê henîfî pir tune ye lê piştî ku Selçûqî hatin vê herêmê mezhebê henefî li vir belav bû. Bi taybetî jî di belavbûna mezhebê henîfî li vê herêmê da bandora mîrnişîna Artûqîyan pir e (Baluken, 2010:42).

7.3. Stêrzanî û Bawerîyên Mîstîk

Mîrên Merwanîyan girîngî dane stêrzanan. Hin mîran stêrzan anîbûn cem xwe û gotinên van stêrzanan li cem mîr pir biqîmet bûn. Ibnu'l-Ezreq qala du stêrzanên di serdema Nesruddewle û Nizamedîn da dike û wiha dibêje: "Rojekê ji Hindê falbazekî zana hat cem Nesruddewle û mîr gelekî qîmet dayê û gelek qencî pê kir. Falbaz Derheqê paşeroja wî da ev tişt jê ra gotin: 'Mîre min mirovekî ku tu jê hez dikî, tu qîmet didiyê piştî mirina te dê mîrektîyê ji malbata te bistîne û malbata te ji holê rake. Lêbelê di demeke kurt da desthilatdariya vî welatî dê ji destê wî jî derkeve.' Li ser vê, mîr hinekî fikirî û berê xwe da Fexruddewle û wiha got: 'Ku ev gotin rast be kesê ku vê bike ev kal e.' Dema Fexruddewle ev gotinên mîr bihistin wiha got: 'Ezbenî ez li ku kirina vî karê ha li ku?' Lê piştra ev gotinên falbaz rast derketin (Fariqî, 2014:503). "Di serdema Mîr Nizamedîn da di sala 1071ê da stêrzanekî bi navê Îbnî Aysûn hatibû cem Mîr Nizamedîn. Ev stêrzan her wextî di civata Mîr Nizamedîn da amade bû. Şevkî Îbnî Aysûn û mîr bi hev ra li bajêr dinêrtin û sternas ji mîr ra wiha got: "Mîrê min ev çi bajarekî xweş e lê piştî te bi heştê salî zilm û zordestî dê li vir serdest bibe." Gel li hemberî van gatanan metel ma. Lêbelê gotinên vî stêrzanî rast derketin. Lewra piştî Merwanîyan welat ket destê tirkên Selçûqî û rêvebir guherîn. Zilm û

zordestîyê dest pê kir û çawa ku stêrzan gotibû, gel feqîr û belengaz bû" (Fariqî, 2014:517). Dema ku Mîr Nîzamedîn mir jî vî stêrzanî li bircê stêran nêrt û got ku heta sê rojan Ebû'l-Mensûr nikare here ser textê mîrîtiye. Li ser vê, termê Mîr Nîzameddîn hat şuştin û kefenkirin û di nav darbestê da sê rojan hat sekinandin. Heta li gor ku tê gotin di vê navberê da mişkan her du çavên wî xwarine" (Fariqî, 2014:516). Ev agahî nîşanî me dide ku mîrê Merwanîyan û rêvebirên wan pir girîngî dane gotinên falbazan û li gor wan tevderîyane. Herwiha di nav gel da jî hin bawerîyên mîstîk jî hene. Li gor Fariqî dibêje, piştî ku birayê wezîr Ebû Tahîrê kurê Enbarî, Ebû'l-Xenaîm hat kuştin êvaran nûr diket ser gora wî (Fariqî, 2014:532).

Dema Sîfînas Hemdanî tînin Amedê ku bi Ebû Elî ra bizewice li Rihayê disekinin û nivê şevê dema Sîfînas li esman dinêre ji xeybê dengekî dibihîze û wiha dibêje: "Ez li ber wî mîrê dikevîm ku berî bibe zava ez bî hiştîm. Li ser vê bi Sîfînas ra tirs çêdibe û piştî demeke kin xebera kuştina Ebû Elî jê ra tê (Fariqî, 2014:460).

Piştî ku Mumehîduddewle bû mîr li ser xewnekê Ebû Nasir Ehmedê birayê xwe ji xwe dûr kiribû digot ez wî li ku bibînim ez ê wî bikujim. Lewra Mumehîduddewle di xew da dîtibû ku roj diket dawa Mumehîduddewle û Ebû Nasir roj ji dawa wî derdixist (Fariqî, 2014:468-469).

8. JÎYANA CIVAKÎ

8.1. Kevneşopî

Di pirtûka Fariqî da edet û kevneşopîyên wekî pîrozkirina cejnê û girêdana şîne derbas dibin. Li gor van agahîyên Rojên cejnan gel dicivî û di hin serdeman da jî bûbû wekî eded gel roja cejnê biçe derveyê bajêr û li wir nimêja îne bike (Fariqî, 2014:457). Fariqî girtina şîna mirîyan da van agahîyan dide: Piştî ku mîr dimir wezîr, rêvebirên dewletê, carinan helbestvan û pismamên mîr dicivîyan û gel pêşwazî dikir û bi vî awayî şîna mîr gire didan. Dema Nesruddewle Ehmed mir û xelk ji bo serxweşîyê hatin cem Mîr Nîzamedîn ew ji ser textê mîrîtiyê rabû û çû li erdê rûnişt û bi vî awayî mîr kesên ku ji bo serxweşîyê hatibûn, pêşwazî kirin. Piştî mirina Nesruddewle Ehmed helbestvan jî li wir amade bûn û zêmar li serê dixwendin (Fariqî, 2014:505). Ev jî nîşan dide ku di serdemama Merwanîyan da wekî kevneşopîyekê li ser mirîyan xwendina zêmaran jî heye. "Dema Mîr Nîzamedîn mir wezîr û Mîr Ebû Nasir bi cilên qetîyayî û şaşîka gelicî û bi cilên şîne, ji bo sersaxîyê derketin pêşberî gel" (Fariqî, 2014:517). Ev rewş jî wekî kevneşopîyeke girêdana şîne derdikeve pêşberî me.

8.2. Weqf û Alîkarî

Mîrên Merwanîyan girîngî didan alîkarîyê û herwiha em ji berhema Îbnu'l-Ezreq fam dikin ku ji bo vê weqf hatine hin çêkirin. Li gor agahîyên Fariqî di serdema Nesruddewle da Hesênê kurê Mihemedê kurê Mîxfer karûberên weqfan

bi rê ve dibirin. Lewra Nesruddewle soz dabû ku her roj elbek genim bide feqîran. Lê tirsîya ku rojekê bi karê xwe ve mijûl bibe û vê soza xwe neyne cih. Li ser vê gazî Mihemmedê kurê Mîxfer ê berpirsyarê weqfan kir û xwest erdekî ku salê sê sed û şeşt elb dexil jê tê weqif bike. Li ser vê wî jî gundê Etşayê yê ku dikeve rojavayê Meyyafariqînê weqif kir. Ji wê rojê û vir ve jî çî dexl û danên ku ji vî gundî dihat bidestxistin li feqîran dihat belavkirin (Fariqî, 2014:478-479). Li gor neqla Îbnu'l-Ezreq Nesruddewle gelek zevîyên di nav sûrên Meyyafariqînê û gelek cihên din weqif kiribûn. Xêr û alîkarîyên wisa kiribûn ku heta niha ne ji malbata wî û ne ji pismamên wî kesî xêrên bi vî awayî nekiribûn (Fariqî, 2014:477).

Di serdema Merwanîyan da ji xeynî alîkarîyê, hin rolên weqfan ên din jî hebûn. Li gor Îbnu'l-Ezreq ji bo çêkirina sûran (Fariqî, 2014:524) û vekirina qenalên avê jî hin cih hatibûn weqifkirin (Fariqî, 2014:499). Di rêvebirîya Merwanîyan da karê berpirsyarîya weqfan jî hebû lewra li gor agahîyên Îbnu'l-Ezreq piştî ku "Ebû Mensûrê kurê Şazanê Tûsî bû qazîyê Meyyafariqînê nazirtîya Weqfan jî wî dimeşand" (Fariqî, 2014:498) û ji serdema Mîr Ebû Elî û vir ve jî kesekî fileh bi navê Îbnî Şelîta mutewelîtîya weqfan dikir (Fariqî, 2014:499). "Di sala 1076an da jî Ebû Hesênê kurê Bexel bû berpirsyarê Weqfan" (Fariqî, 2014:504).

Encam

Ev berhema Îbnu'l-Ezreq a bi navê Tarîxu Meyyafariqînê di warê çand, şaristani û avahîsazîya kurdên Merwanî da gelek agahîyan dide. Nivîskarê berhemê, Îbnu'l-Ezreq di serdema Artûqîyan da karê rêvebirîya weqfan kiriye. Bapîrê wî jî di serdema Merwanîyan de jîyaye û di rêvebirîya weqfan de xebitiye. Fariqî bi xêra vê peywira xwe derfeta ku xwe bigihîne belgeyên dewletê yên fermî bi dest xistiye. Ev taybetî girîngîya pirtûkê zêde dike.

Di warê avahîsazîyê de gelek agahî di Tarîxu Meyyafariqînê de hene. Fariqî di pirtûka xwe de Derheqê avahîyên wekî sûr, birc, keleh, qesr, pir, qub û mizgeftan de gelek melûmatan dide. Hinek ji van avahîyan niha dibînin û hinek jî wunda ne. Ev taybetîya vê pirtûkê jî dikare rê li ber xebatên nû yên avahîsazîyê bike.

Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî di sala 1176an da berhema xwe ya bi navê Tarîxu Meyyafariqîn nivîsîye. Du destxetên vê berhemê li Londonê di Muzeya Britishê da hene. Di berhema wî da gelek mijarên derheqê dîroka Îslamê û misilmanan da hene û beşeke wê derheqê kurdên Merwanî da ye. Merwanîyan di seranserê serdema mîrnişîna xwe da di warê rêvebirîya dewletê da sistemek ava kirine. Rêvebirî di destê mîr da ye û wezîrên wî mîrî hene. Di heman demê da bajarên derveyê paytextê bi rêya walîyan hatiye îdarekirin. Pergaleke dadmendî û darizandinê jî li cem Merwanîyan heye û ev kar bi destê qazîyan hatiye meşandin. Di warê zanist û hunerê da kar û kirinên Merwanîyan hene û gelek zana û helbestvan di nav welatê wan da jîyane. Artêşeke Merwanîyan a ku her dem amade û di bin fermana mîr da heye û serokekî vê artêşê jî heye. Di

serdema Merwanîyan da di warê bajarvanî û avahîsazîyê da gelek xebat hatine kirin û avahîyên dîrokî hatine çêkirin. Di vê serdemê da gelek sûr, birc, keleh, qesir, pir, qenalên avê, seyrangeh, mizgeft û nexweşxane hatine çêkirin.

Di serdema Merwanîyan pergaleke aborî heye û bac hatiye berhevkerin. Li bajarên Merwanîyan bazargeh hene û bazirganî hatiye kirin. Herwiha ji serdema Bad kurê Dostik û vir ve li ser navê mir pere hatine derxistin. Kurdên Merwanî misilman û sunî ne. Wekî din fal û hin bawerîyên din ên mîstik jî li cem rêvebirên dewletê hene û kevneşopî û toreyên Merwanîyan ên ku xasî wan in jî tîn dîtin. Di rêvebirîya Merwanîyan da ji bo alîkarîyê hin kar û xebat hatine kirin. Ji bo alîkarîyê û hin xizmetên din ên civakî weqf hatine sazkerin û ev kar bi rêya van weqfan hatine kirin.

Çavkanî

- Baluken, Y. (2010). Mervaniler Devrinde Dinî Gruplar. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. Van: Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi.
- Beysanoğlu, Ş. (1996). Anıt ve Kitâbeleriyle Diyarbakır Tarihi. Ankara: Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür Sanat Yayınları.
- Biçer, B. (2014). Kürtler. İstanbul: Çizgi Yayınları.
- el-Hîmyerî, M.B.E. (1984). Rewdetu'l-Mutar fî Xeberu'l-Eqtar (Thq. Îhsan Ebbas). Lubnan: Mektebetu'l-Lubnan.
- Farqînî, Z. (2013). Türkçe-Kürtçe Sözlük. Stenbol: Estîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Îbnî Şeddad. (1978). el-Alaqu'l-Xetîre fî Zikrî Ümeraî's-Şam we'l-Cezîre I-VII. (Thq. Yahya İbare). Dimeşq: Wezaratû's-Seqafîyye'l-Murşadû'l-Qewmî.
- Îbnî Xelikan. (1978). Wefayatu'l-Ayan. (Thq. Îhsan Ebbas). Beyrûd Daru Sadir.
- Îbnu'l-Ezraq. (1990). Mervanî Kürtleri Tarihi (wer. Mehmet Emin Bozarslan). Stenbol: Koral Yayınları.
- Îbnu'l-Ezraq. (1990). Meyyafarikîn ve Amed Tarihi (Wer. Ahmet Savran). Erzurum: Atatürk Üniversitesi Fen-Edebiyat Fakültesi Yayınları.
- Îbnu'l-Ezraq. (1959). Tarîxu'l-Fariqî. (Thq. Bedewî Evdulletîf Awad). Qahîre: Weşana İdaretu'l Ame's-Seqafîyye.
- Îbnu'l-Ezraq. (2014). Tarîxu Meyyafariqîn (Thq. Kerîm Faruk el-Xûlî û Yusuf Baluken). İstanbul: Nûbihar.
- M.S. Lazarev, Ş.X., Mihoyan, E.İ., Vasilyeva, M.A., Gasratyan, O.İ., Jigalina. (2010). Kürdistan Tarihi (Wer. İbrahim Kale). (Ed. M. S. Lazarev û Ş.X. Mihoyan). Stenbol: Avesta.
- Mansız, N. (2015) İbnü'l-Esir'in el-Kamil fit't-Tarih Adlı Eserine Göre Kürtler ve yaşadıkları Bölgeler. Teza Lisansa Bilind. Muğla: Muğla Sıtkı Koçman Üniversitesi.
- Ripper, T. (2012). Diyarbakır Merwanileri. (Wer: Bahar Şahin Fırat). İstanbul: Avesta.
- Sevim, A. (1988). Anadolu'nun Fethi Selçuklular Dönemi. Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınları.

- Tufantoz, A. (2005). Ortaçağda Diyarbakır Mervanoğulları. Ankara: Aça Yayınları.
- Yûsuf, E. (2001). ed-Dewletu'd-Dostakîyye fî Kurdistanî'l-Wusta. (C.2.). Erbil: Darû Aras li't-tebae û neşr.





Makale Geliş Tarihi: 27.07.2019

Makale Kabul Tarihi: 01.08.2019

FONOLOJÎYÊ KIRMANCKÎ DE PIRSGIRÊKA VENGÊ "/ğ/"¹

Ahmet KIRKAN*

KILMÎYE

Kurdî çend hebî alfabeyan reyde yena nuştene. Her alfabe de mojnayena taye vengê yena îhmal kerdene. Taye vengî ke erja frekansê xo kemî yê alfabe de nêyênê mojnayene. Nê vengê ra yew zî vengê "/ğ/" yo. No veng heme mintiqayanê kirmancan de bi heman şeklî ya ifade nêbeno. Nê nuşteyî de pirsgirêka vengê "/ğ/" yî ameya analiz kerdene. Hirê hebî ziwannasê ke kurdki ser o xebitîyênê, erja frekansê nê vengî ser o taye doneyê îstatîstîkî tesbît kerdê. Mîyanê na meqale de nê hirê analîzî û grafîkê vengî ameyê îzah kerdene. Alfabeyê ke seba kirmanckînusî yenê şuxulnayene tedqîq biyê û alfabe de cagirewtîşê na herfe analiz biyo.

Kiltîçekuyî: Fonoloji, Kirmanckî, Fonem, Konsonant, Vokal.

¹ Na meqale tezê doktorayê nuştexî ke bi nameyê "Zazacanın Fonolojik Açından İncelenmesi: Kuzey, Güney ve Merkez Zazacasının Karşılaştırılması" û bi şêwirmendî ya Doç. Dr. Hayreddin KIZILÎ de temambîye ra gêriyaya seba na kovare newe ra nusîyaya.

* Dr. Arş. Gör. Ünîverstîya Artuklu ya Mêrdînî, ahmetkirkkan@gmail.com. Orcid: 0000-0003-3885-5218

Kirmancki Fonolojisiinde “/ğ/” Sesi Problemi

ÖZET

Kürtçe birkaç alfabeyle yazılmaktadır. Kullanılan her alfabede bazı seslerin gösterimi göz ardı edilmektedir. Frekans değeri az olan bazı sesler alfabede gösterilmez. Bu seslerden birisi de /ğ/ sesidir. Bu ses Kirmancca (Zazaca) konuşulan bütün bölgelerde aynı şekilde seslendirilmez. Bu makalede Kirmancca yazımında var olan /ğ/ sorunu analiz edilmiştir. Kürtçe üzerine çalışan üç dilbilimci bu ses üzerine bazı istatistiki veriler tespit etmişlerdir. Makale içerisinde bu üç analize ve ses grafiklerine yer verilmiştir. Kirmancki yazımında kullanılan alfabeler incelenmiş ve bu harfin alfabe yer alıp almaması analiz edilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Fonoloji, Kirmancki, Fonem, Konsonant, Vokal.

Sound “/ğ/” Pblem in Kirmancki Phonology

ABSTRACT

Kurdish is written in several alphabets. The representation of some sounds in each alphabet is ignored. Some sounds with low frequency are not displayed in the alphabet. One of these sounds is the /ğ/ sound. This voice is not played in the same way in all Kirmancca-speaking areas. In this article, the existing /ğ/ problem in Kirmancc language is analyzed. Three linguists working on Kurdish have identified some statistical data on this voice. These three analyzes and sound graphics are included in the article. The alphabets used in Kirmancki writing were examined and whether this letter was included in the alphabet was analyzed.

Keywords: Phonology, Kirmancki, Phonem, Konsonant, Vocal.

Destpêk

Nuştene û nuştişî ya xoîfadekerdiş seba însanan ihtîyacêko eslî yo. Seba nuştişî zî alfabe lazim a. Prosesê tarîxî de seba nuştişî zaf alfabe yî ameyê şuxulnayene. Kurdan zî demanê verênan ra heta nika seba xoîfadekerdişî zaf alfabe yî bikar ardê. Nika ziwane kurdkî bi alfabe yê kirîlkî, latînkî û erebkî (Kurdo-Arabîk) hîrê alfabe yan a nusîyêno. Kirmancki yanî zazakî bi di hebî alfabe yan reyde nusîyêna. Nê alfabe yan ra yew alfabe ya latînkî ya, a bine zî alfabe ya erebkî ya. Alfabe ya latînkî bi name yê Celadet Alî Bedirxanî ya meşhur bîya, sey alfabe ya Bedirxanî yena zanayene. Alfabe ya erebkî badê musulmanbîyayîşî, miyanê Kurdan vila bîya û xususen Iraq de serranê 1920î ra dima seba ziwane kurdkî û bi taybetî lehçeya sorankî ameya rewîze kerdene. Seke yeno zanayene destpêkê seserra 20. de, serra 1906î de, Xelal Xeyalî yê Motkî zî na alfabe ser o xebetîyayo. Heta ey bi na alfabe reyde çend hebî kitabî zî çap kerdê. Vengê ke alfabe ya latînkî de kewenê tîmîyan, alfabe ya erebkî de çîya sembolan reyde mojnayêne. O semed ra bingehê na meqale de alfabe ya latînkî esta.

Derheqê kirmancki de oryantalistan zî taye xebatî kerdê. Nê xebatan de çîya alfabe yî ameyê şuxulnayene. Metnanê verênan/klasîkan û metnanê dînîyan de alfabe ya erebkî ameya şuxulnayene. Kirmancki de alfabe ya latînkî ancax serranê 1960î ra dima ameya kar ardene. Ê ke kurmancki û kirmancki nusenê raste rast alfabe ya Kurdo-Arabîkî nêşuxulnenê. Alfabe ya ke nê kesî şuxulnenê zafine alfabe ya Osmankî reyde ahengdar a. Taye herfê ke fonolojîyê kurdkî de estê, alfabe ya erebkî ameyê zêde kerdene. Alfabe ya Kurdo-Arabîk de sîstemê

herekeyan çin o, herfê vokalî zî bi sembolan a mojneyênê. Labelê alfabeya ke kurmancî u kirmancî medreseyanê xo de bi kar anê herekeyin a. Sey nimûne Mela Ehmedê Xasî ve Muftî Osman Esad Efendî eseranê xo de na alfabe bikar arda. Çünke nê her di nuştoxan zî eserê xo dewrê Dewleta Osmanîyan de nuştê û o dewr de şuxulnayîşê na alfabe çiyêko normal o. Labelê şair û nuştoxê kirmanckî ke aqîdename, fiqhname, mewlîd ûsn. eseranê dînîyan nusenê hîna alfabeya erebkî bikar anê.

Kirmanckî de Serencamê Alfabeya Latînkî

Kirmanckî de alfabeya latînkî serra 1963î de ameya şuxulnayene. Heta ke na alfabe ca girewta, nuştişî de taye herfî çiyayî ameyê nuştene. Xebatanê sifteyanê kirmanckî de vera vengê /i/ [u] sembolê /i/; vera /î/, [i] zî sembolê /i/ ameyo şuxulnayene, ke kes eşkeno vajo ney de tesîrê alfabeya tirkî esto. Çünke alfabeya tirkî de sembolê sey /i/, /i/ yenê şuxulnayene. Nuştoxanê kirmanckî bi zîwanê tirkî ya perwerde vînao û tesîrê nê perwerdeyî şuxulnayîşê alfabe de xo nîşan dayo.

Heta beyntarê serranê 1980yan kurdkî tena bi alfabeya Celadet Alî Bedîrxanî ya nusîyaya. Badê vejîyîşê kovaranê sey *Ayre*, *Piya*, *Raştiye* û *Ware* na rewşe dest bi vurîyayîşî kerdo. Mîsale, kovara *Ayre* hûmara 11. de (Adar 1987) hemberê vengênê /**ʕa**/, /**ʕe**/, /**u**/, /**h**/ sembolê sey /**â**/, /**è**/, /**ü**/, /**h**/ ameyê pêşnîyaz kerdene. Nê sembolê ke vera vengên ameyê pêşnîyaz kerdene, mîyanê kirmancan de vengê vila nîyê û erja frekansê nê vengên zî berz nîya. Badê cû menga gulanî ya serra 1992î de kovara *Ware* de seba herfa fizekî ya zîwanê hurdî [**ɹ**]yî sembolê /**ǰ**/ û sembolê sey /**ü**/, /**u**/, /**i**/ pêşnîyaz bîyê. Reyna na kovare de seba vengê bêcîfê sey /**dz**/, /**ts**/ ke tena fekê Dêrsimî de estê, vera /**ʔ**/ (apostrof) sembolê sey /**h**/; vera vengê /**ǰ**/ zî sembolê /**ğ**/ ameyo pêşnîyaz kerdene. Labelê temsîliyetê nê vengên de, mîyanê nuştoxan û redaksiyonê kovare de konsensusêk nêvirazîyayo ke hûmaranê dimayênanê kovara *Ware* de sembolê /**k**/ û /**kh**/ yan /**ǰ**/ û /**ğ**/ pîya ameyê nuştene. Hûmarê 3. û 4. yê heman kovare de reya verên seba vengê [**h**] sembolê /**h**/ û seba vengê [**tʰ**] zî sembolê /**t**/ ameyo şuxulnayene (Keskin, 2017).

Zilfî Selcan meqaleyê xo yê kovara *Wareyî* de kirmanckî de pirsgirekê alfabe û îmlayî (rastnuştişî) ser o vinderto. Selcanî seba vengên vokal û konsonantan zaf sembolî û herfî şuxulnayê (Selcan, 1998). Xebatê ke cor ra behs bîyê seba seveknayîşê dewlemendîya fekkî ya kirmanckî muhîm ê, labelê alfabe de zêdebîyayîşê herf û sembolan nîsbetê wendiş-nuştişê kirmanckî ser o tesîrêko neyînî (negatîf) virazeno. Heta na rewşe ge gane semedê nuştoxan zî aloziyêk peyda kena.

Alfabeya Celadet Alî Bedîrxanî de goreyê alfabeyanê bînan zêde vurîyayîş neameyo meydan. Sere de Kovara Hawar de şuxulnayîşê taye vengên de (sey /**k**/ û /**q**/ de) taye xeletî estbîyo labelê na pirsgire rew hel bîya. Nuştoxanê kirmancan heta demekî taye vengê nê alfabeyî vurînayê labelê destpêkê serranê

1990yan de na rewşe zî orte ra weriştâ. Kirmanckî û kurmanckî na alfabe ya nusîyêna. Seba rewîzekerdişê na alfabe taye pêşniyazî (sey taye sembolan zêdekerdiş û taye herfan vurînayîş) estê. Her çiqas na alfabe vengane allofonan û vengane lokalan (taye vengê lokalî ke tena mintiqayêka sînorke de yê) yê kirmanckî rê qîm nêkana zî, na alfabe bi şeklêko aktîf yena şuxulnayene.

Vengê /ğ/ û /x/

Vejiyayîşê nê vengî de zîwan ver bi peyasmênfekkî û zîwanê hurdî ya werzeno. No veng qirpiçe ra bi şeklêko vengine vejîyêno. Alfabe ya Kurdo-Arabîk de no veng bi sembolanê /ġ/ û /x/ ifade beno. Nê sembolan ra vengê /ġ/ vengêko nerm, vernîyê fekkî (barî) û vengî o. Labelê vengê /x/ peynîya fekkî (qalind) û bêveng o. Mihemed Emîn Hewramanî îdia keno ke no veng zîwanê Awestayî de zî sey çekuya *xşap* (şew) de bi şeklê /x/ esto (Hewramanî, 1973: 46). No veng alfabe ya Celadet Alî Bedirxanî de tena yew simbol a yeno ifade kerdene. Mîyanê çekuye de nê her di varyantanê ra kamcîn şeklê ci ameyo şuxulnayîş ancax bi însiyatîfê wendoxî ya yeno tesbît kerdene. IPA de (Alfabe ya Fonetîk ya Mîyannetewî) de nê her di vengî cîya sembolan a ameyê mojnayene.

Nuştişê kirmanckî de terefê taye nuştexan ra seba vengê /ġ/ diyagramê /gh/ û seba vengê /x/ zî diyagramê /kh/ yeno şuxulnayene. Taye nuştexan zî semedê vengê /ġ/ simbolê /ğ/ kar ardo. Xususen mîyanê nuştexanê fekê Dêrsimî de, çekuyanê sey *ğele*, *xêge*, *ağwe*, *ğize*, *loğe*, *ğerîb* ûsn, no simbol zaf bikar yeno. Celadet Alî Bedirxanî seba tesbîtkerdişê allofonanê nê vengî (/ğ/ û /x/) simbolê /x/ şuxulnayo labelê dima ney ra fek viradayo (Hawar, 1932: 3)

Kirmanckî de çekuyê sey *xurbet*, *xerb*, *xerîb*, *xêr*, *rexbet*, *mexrîb*, *xezal*, *ağa*, *oxîr* de vengê /ġ/ esto. Reyna çekuyê sey *xirab*, *xet*, *xal*, *xanîme*, *xoz*, *xorî* de vengê /x/ şuxulîyêno. IPA de seba foneme /ġ/ yî simbolê [x̣], [x̣] û [x̣]; seba fonemê /x/ zî [x] û [x] kar yenê. Nê her di vengî yanî /ġ/ û /x/, zaf kewenê tîmîyan. Ganî bêro ifadekerdiş ke herfa /ğ/ alfabe ya lafînkî de zêde nêyana şuxulnayene. No veng çekuyanê kirmanckî de bi vengane /g>/x/, /x>/h/, /x>/q/ û /x>/v/ reyde yeno vurîyayene. Vurîyayîşê vengane rê xag>xax, xelate>halete, xora>hora, xurbet>qurbet, xêx>xêv kes eşkeno sey nimûne bido. Vurîyayîşê vengane /x>/q/ fariskî de û lehçeyanê kurdkî de yeno meydan.

Analîzê Vengê /ğ/

Vengo ke alfabe ya erebkî bi simbolê /ġ/ ramojnayêno, mintiqayanê kirmancan de taye cayan de yeno şuxulnayene labelê taye cayan de çin o. Mintiqayê ke nê vengî şuxulnenê, înan de zî no veng eynî şekl a nêvejîyêno. Yanî vengkerdişê (sesletim) nê vengî her ca de sey pîya nîyo. Taye nuştexî berhemanê xo de simbolê /ğ/ şuxulnenê labelê taye zî ney rê îhtîyac nêvînenê. O semed ra alfabe de bîyayîş yan çinbîyayîşê simbolê /ğ/yî mabênê kirmancan de (heta kurmancan de zî) sey pîrgire vejîyêno meydan. Alfabe ya Celadet Alî Bedirxanî

de nê her di vengî sey allofonê yewbînî ameyê qebulkerdiş û nê vengî tena bi sembolê /x/ reyde ameyê mojnayene.

Sembolê /x/ hem seba vengê lerzdarê fizekî yê ziwane hurdi (voiced uvular fricative) [ɣ] hem zî seba vengê peyasmênfekki [ɣ̥] yeno şuxulnayene. Çekuyê ke erebki û armenki ra kewtê kirmanckî û peygirê –oxî ya qediyênê zafine vengê /ğ/ yeno şuxulnayene. Seke cor ra zî ameyo îfadekerdiş alfabea Celadet Alî Bedirxanî de no veng fonemê /x/ ya ameyo mojnayene labelê alfabea Ware/Jacobsonî de no veng bi fonemanê /ğ/ û /x/ ya mojnayêno. Alfabea Ware/Jacobsonî, *Kovara Wareyî* de ameyo şuxulnayene û badê cû sewbîna kovaran de zî şuxuliyaya. Labelê goreyê acigêrayişanê ma, bi nameyê ziwannasê C. M. Jacobsonî, ke mîyanê grûba *Kovara Wareyî* de bi nameyê Bira Mikail yeno zanayene, tezêk doktorayî yan meqaleyî ziwannasî çin ê. No merdim mîyanê kirmancan de mendo û amadekerdişê alfabeayî de hetkarîye kerda. Yanî qaso ke ma tedqiq kerd, no merdim sey mîsyonerî ya ameyo mîyanê kirmancan û ziwannas niyo.

Celadet Alî Bedirxanî (Bedîrxan û Lescot, 2009), M. Malmîsanijî (Malmîsanij, 2015) û Mesut Keskinî (Keskin, 2017) vengane alfabea latinkî ser o acigêrayîşî viraştê. Her yewî korpusêk amade kerdo û goreyê nê korpusî nîsbetê vengane (erja frekansanê vengane) tesbît kerdo. Bê nînan Husein Muhammedî zî seba nîsbetê herfan taye doneyê îstatistikî tesbît kerdê (Muhammed, 2016). Tîya de doneyanê Celadet Alî Bedirxanî, M. Malmîsanij û Mesut Keskinî ra do behs bibo. Bê nînan seba her vengê kirmanckî, ma zî nîsbetê herfan tesbît kerdî. Labelê tîya de tena nîsbetê vengê /ğ/ do îzah bibo.

Celadet Alî Bedirxanî xebata xo ya gramerî de nîsbetê vengane /x/ û /x̥/ de erja frekansênê nê vengane sey 0, 19% tesbît kerdo (Bedîrxan&Lescot, 2009: 36). Na erja ke Celadet Alî Bedirxanî tesbît kerda, her di varyasyonê (/ğ/ û /x̥/) nê vengî îfade kena. Eke tena seba vengê /x̥/ yanî /ğ/ bêro hesabkerdiş na erje hîna kêmi bena. Celadet Alî Bedirxanî fekê Sêwregî ser o cigêrayîşêko xo yo bîn de erja frekansê vengê /x/ sey 0, 131% tesbît kerda (Bedirxan û Lescot, 2009: 37). Gama ke tena erja frekansê /ğ/î yena analîzkerdiş, na erje erja xebatanê bînan reyde ahengdar a. Metnanê kanan û neweyan de erja na herfe sey yewbînî vejîyaya.

Mesut Keskinî xebata xo de erja frekansê vengê /ğ/î sey 0,29% tesbît kerda. Goreyê Keskinî nîsbetê nê vengî fekanê vakurî yê kirmanckî de hîna zêde yo. Fekanê başûrî yê sey Sêwregî û Çermugi de vengê /ğ/-/ğ̥/î cayê /x/-/x̥/î rê veradano. Keskinî erja frekansê fonemê /ğ/ sey 0,29% û erja frekansê fonemê /x/ zî sey 1,34% tesbît kerdo. Goreyê ey nê her di vengî cîya cîya fonem ê. Ziwannasanê bînan de na rewşe çin a. Ê nê her di vengane sey allofonê pê qebul kena û erja frekansênê tîmîyan de hesab kenê. Labelê Keskinî nê her di vengane yewbînî ra cîya keno û her yewî xoser fonemêk qebul keno (Keskin, 2017). No veng mintiqayanê kirmancan de vakur ra ver bi başûr beno qalind û karakterêko

peyasmênfekkî qezenc keno. Taybetmendiyê korpusê Keskinî ma nêzanê labelê reyna zî erja frekansê vengî /ğ/î zaf kêma.

M. Malmîsanijî vurîyayîşe vengên ser o xebatêka musteqîle kerda. Ey xebate xo ya gramerî de erja frekansê fonemê /ğ/ sey 0,13% tesbît kerda (Malmîsanij, 2015: 30). Sînoranê na xebate de seba nê vengî erja tewre kêmi ya M. Malmîsanijî ya. O na xebate xo de tena nê vengî ser o nêvinderdo. M. Malmîsanij, alfabe ya Celadet Alî Bedirxanî bikar ano û hewceyîya herf zêdekerdişî nêvînenê. Çünke goreyê ey erja na herfe zaf kêmi yo û seba nê vengî alfabe de zêdekerdişê herfe hewce nêkeno.

Ma seba xebate xo, hîrê mintiqayanê kirmancan ra metnê folklorîkî kom kerdî û nê metnî analîz kerdî. Ma mintiqayê kirmancan goreyê sînoranê cografîkan dabeş kerdî û tedqîq kerdî. Goreyê ney ma, vakur de Dêrsim, merkez de Çewlîgû başûr de Sêwregî sey monogram girewt. Xebate metnanê folklorîkan² ser o ameya kerdene çünke metnê ke redakte biyê û goreyê fekê standardî nusîyayê taybetmendîyanê xo yê zîwanê mehelî vîndî kenê. Bi nê metnanê folklorîkan reyde, her mintîqa ra korpusêko 150 000 herfîn amade biyo. Mîyanê nê korpusî ra erja frekansê her vengî ameya tesbît kerdene. Goreyê her mintîqa erja frekansê nê vengî ameya tesbîtkerdiş û erja serayînê nê vengî tesbît biya. Goreyê nê doneyan erja frekansê nê vengî 0, 0024 û erja seranê ci 0, 24% vejîyaya.

296

Mîyanê xebatanê îstatîskanê nê vengî de, erja tewr kêmi ya M. Malmîsanijî, erjan ra tewr zêde zî ya Mesut Keskinî ya. Ferqê mabênê nê erjan, korpusî ra vejîyêna meydan. Çünke her acigêrayoxî goreyê xo korpusêk amade kerdo. Labelê mabênê nê erjan de zêde ferq zî çin o. Erja ke na xebate de tesbîtbiya, erja Mesut Keskinî û M. Malmîsanijî ra dûrî ya labelê erja Celadet Alî Bedirxanî ra nêzdî ya. Goreyê doneyan erja na xebate orteyê heme erjan a. No hete ra kes eşkeno vajo ke temsîliyête xebata ma esta. Erja xebata ma metnanê tarîxîyan reyde zî ahengdar a. Çünke Celadet Alî Bedirxanî demê xo de metnanê kirmancî ser o xebitîyayo.

Erja xebata ma, erja xebatanê bînan yewbînan gêna. Xebatê ke nameyê xo vîyert hemîne de erja nê vengî zaf kêmi ya. Qalkerdoxêkê kirmancî mîyanê 1000 hebî vengên de ancax 24 hebî nê vengî kar anê, ke na erje zî mintîqa ra mintîqaya bîne vurîyêna. Seke Keskinî îfade kerdo, erja frekansê nê vengî mintiqayanê vakurî de berz a labelê ver bi başûrî erja frekansê nê vengî kewena (Keskin, 2017).

² Metnanê folklorî hîrê mintiqayanê kirmancan ra bi şeklêko random (tesadufî) ameyê weçînayene. Nê metnî taybetmendîyanê mintiqayan mojenê. Fekê Çewlîgî de nuştoxê sey Seyidxan Kurîj, W. K. Merdimîn, Wisif Zozanî, N. Celalî, Doxan Karasu, İsmet Bor, Ehmed Dirihî, kovare sey *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü* Dergisi û kovara *Vir* û deyirê û kilamê Rençber Ezizî ra; Fekê Dêrsimî de nuştoxê sey Nadîre Gûntaş Aldatmaz, Hawar Tornêcengî, Mesut Özcan, Alî Aydin Çiçek û kovare sey *Vate, Ware, Mirazî* ra; Fekê Sêwregî de nuştoxê sey Kafur Seçilmek, Şaban Şenates, Recep Yiğitbay, Feyza Adabeyî, Koyo Berz (Cuma Arslan), Roşan Hayigî ra ameyo îstîfade kerdene.

Cêr ra mîyanê hîrê mintiqayan de tekrar û erja frekansê ya vengê /x/, /x̃/ ameyê deyene. Nê tabloyî de her di vengê pîya ameyê analîz kerdene. Yanî tîya de nê her di vengî sey allofon ameyê qebl kerdene.

Tablo: Hîrê Mintiqayanê Kirmanckî de Nîsbetê Venganê /x/ û /x̃/-/ğ/

	Mîyanê Korpusî de Nîsbetê Herfa /x/, /x̃/			
	Tekrar	Korpus	Frekans	Serane
Sêwregî	1822	150 000	0,0121	1,21%
Çewlîg	2174	150 000	0,0144	1,44%
Dêrsim	2198	150 000	0,0146	1,46%
Pêroyî	6194	450 000	0,0137	1,37%

Seke tabloyê corî ra erja frekansê nê vengî ra fehm beno ke, no veng (her di varyasyonê nê vengî) kirmanckî de zaf nêyeno şuxulnayene. Kurmanckî de erja frekansê nê vengî (reyna her di varyasyonî) 1,5% ameyo tespît kerdene (Muhammed, 2016: 43). Nê her di lehçeyan de erja frekansî ya nê vengî zaf nêzdîyê yewbînan ê. Erja nê vengî vakur ra ver bi başûr kêmiyêna.


Goreyê Grafikanê Vengî Analîzê Vengê /ğ/-/ğ̃/ û /x/-/x̃/

Cêr ra dîmenê akustîkê di hebî çekuyan ameyo ramojnayene. Nê dîmenî akustîkî bi hetkarî ya muhendîsanê vengî û perwerdekaranê muzîkî reyde ameyê viraştene. Seba nê dîmenan veng studyo de ameyo qeydkerdiş û bernameyê analîzkerdişê vengî yê *praati* reyde grafîkî virazîyayê.

Nê çekuyan de veng; ortamêko tam îzolekerde de, bi mîkrofonêko omnisfer condanserî (mîkrofono ke vengan kom keno û serrast keno) reyde, bi vengê baretonî yê camêrdî ya, bêefekt ameyê qeydkerdiş û vengan rê mudaxele nêbiyo. Qeydkerdişê vengan de; vengê camêrdî, markaya mîkrofonî, germîya odeyî, hokê mabênê merdimî û mîkrofonî, akustîkî odeyî, rengê vengî ûsn taybetmendîyî sabît tepeşîyaya. Nê parametreyan ra yew bivuriyo, grafîkan de zî vurîyayîş yeno meydan.


Bernameyê analîzkerdişî vengî yê *praate* de kes eşkeno zaf grafîkan amade bikero labelê ma tîya de tena spektogramê nê her di çekuyan sey grafîkî mojnayî. Cêr ra grafîkê yewin û grafîkê diyin aseno.

Grafik 1: Spektogramê Çekuya xewxe>[xewxε]



Seke grafikê yewin de aseno; çekuya *xewxe* de vengê /ç/-[x]-[χ] esto. Gama ke na çekuye yena vengkerdiş, vengêko lerzinok û vengin vejîyêno. Kes eşkeno ney grafik ra zî fehm bikero. Çekuya verêne de qedîyayîşê heceya ewilîne û destpêkê heceya dîyine de no veng esto û pêlê spektogramî raste rast lerzîyayê. Taybetmendiyê nê vengî ke ma cor ra îfade kerdî, grafik ser o eşkera xo nîşan danê

Grafik 2: Spektogramê Çekuya ocaxkor>[odɜaxkor]



Seke grafikê dîyin de aseno; çekuya dîyine yanî *ocaxkor* de vengê /ç/-[x̄]-[ɣ]-[y] esto. No veng, lerzdarê fizekî yê zîwanê hurdî yo. Na çekuye de qedîyayîşê heceya dîyine de no veng esto. Gama ke ma grafik tedqîq kenê, ma vînenê ke spektogramê nê vengî de pêlî ver bi kêmbîyayîşî şîne. Kes eşkeno vajo ke

vengkerdişê nê vengî de pêla vengî kewena û veng xeylêk nerm beno. Goreyê çekuya bine, tîya de veng nedîyar o.

Peynîye

Alfabeya latînkî yê kurdî de seba her vengê ziwani, sembolêko taybet nêameyo tayîn kerdene. Mîyanê na alfabe de taye herfî allofonê yewbînan ê. Xususen vengê ke alfabe Kurdo-Arabîk de cîya sembolan reyde yenê temsîlkerdiş, alfabe latînkî de sey pirsgire vejîyênê meydan. Wendiş û manakerdişê nê veng an însîyatîfê wendoxan rê maneno. Wendox ganî texmîn bikero ke nuştoxî berhemê xo de kancîn veng şuxulnayo. No zî her tim bi şeklêko rast nêbeno. Xora wendiş-nuştişê kurdî û bitaybetî kirmanckî zaf kêmi yo, no tewir astengî zî wendoxan berheman ra dûrî vînenê.

- 12) **Tevgerîna li gorî berjewendiyê behredaran di hemû merheleyên lêkolînê de;** lêkolîner, di pênasê, peyikandin û raporkirina lêkolînê de, li beramberî behredaran (lêkolîner bixwe, xwedî û sermayedarên lêkolînê, beşdar, civata zanistê û lêkolêr, muxatab, rêvebir û behredarên din, şîrikên lêkolînê, mirov, civat û sazî) berpirsiyar e û divê xalên zêf ên lêkolînê, hemahengiya agahiyar, sînor û astengên lêkolînê û zirarên madî bi wan bide zanîn.

⁶ Rikkutana referansnişandanê: yanî di bîdestxistina berjewendiyên xwe û civakî de, xwe ji jêgirtinên hin zanyaran – yên ji aliyê devdora zanistê ve kêrhatî- sînorkirin e. (Wergêr-KS)

- Lêkolîner li beramberî birêvebirî û sûdwergirtina ji çavkaniyan (çavkaniyên iqtisadî, însanî û teknîkî) ku sermayedarên lêkolînê ji bo wan tedarik kirine, berpirsiyar e û nikare li gor serê xwe xerc bike, bi tenê bi qasî ku bikare lêkolîna xwe bibe serî, dikare xerc bike.
 - Destûra lêkolîner tune, tenê ji bo xebateke serbixwe, ji du deran alîkariya madî bigire. Her çiqas li gorî hesab û berjewendiya wan her du deran jî be.
 - Divê lêkolîner, ji bo standina pereyan a ji berpirsiyarên lêkolînê, encama xas a lêkolînê veneşêre an jî raporên cuda nenivîsîne da ku der barê encamên lêkolînê de gumanbariyê çê neke û serê xwîneran tevlihev neke.
- 13) Heke tez an jî pêşnûmayên lêkolînan, li zanîngehekê hatibe çêkirin û kuta bûbe, di vî şertî de hemû gotarên ku ji wan tezen pisporî, doktora û pêşnûmayên lêkolînan tên wergirtin û tên weşandin, lazim e ku navê zanîngehê jî li ser hebe.

Beşa Pêncem: Hiqûqa Beşdaran

Beşdar ji van pêk tên: beşdarên însanî⁷, ajal, giya û eşya.

Beşdarên Însanî:

- 14) **Nasandina guncaw**⁸; etîka lêkolînên zanistî li lêkolîneran ferz dike ku ew xwe bi beşdaran bidin nasîn û der barê xwe de agahiyên durust bidin beşdaran.
- 15) **Dazanînen di serî de**⁹; lêkolîner ji wê yekê berpirsiyar e ku der barê cûreyên pirsan, asta hestyariya van pirsan û tesîrên wan ên mûhtemel de beşdaran, di serî de agahdar bike.
- 16) **Destûra agahdarkirinê û azadî**¹⁰; divê lêkolîner destûra agahdarkirinê ya beşdaran binpê neke û dema ku hewce kir, bikaranîna agahiyan ji bo ghiştina armanc û rêbazan, wek di rewşên xeter, astengî, felaket û arîzeyên mûhtemel ên lêkolînê de, dîsa divê bi destûr û biryara beşdaran be. Divê beşdar azadane, ne ku bi rêya zorê tevî lêkolînê bibe û di wan şertên ku lêkolîn dikeve nav xetereyê de, bêyî ku mirov sergêjî û astengî ji bo beşdaran derxîne, divê mirov fersendên guncaw ji bo xwevekişandinê bide wan. Bi vî hawî lêkolîner, berpirsiyar e ku faydeyên xuyanî yên lêkolînê, di warê mijara lêkolînê û belavkirina agahiyan de bi zelalî vebêje (yanî di lêkolînê de, divê faydeyên êşkere ji bo civakê hebin û divê teqez ji bo kesan û civatê hîç cûre ziyar û zirar tunebin).
- 17) **Parastina pinhaniya(mehremiyet) şexsî**¹¹ **ya kesan**¹²; mafê lêkolîner tune ku bêyî destûra beşdaran, tevî pinhaniya şexsî ya wan bibe.

⁷Beşdarên Însanî; Ew kes in ku di lêkolînê de yan bi beşdariyê rasterast an jî bi agahiyên der barê xwe de (bi rêya goftûgo, pirsname, azmûn û hwd.) şîrkati dîkin, dibin beşdar.

⁸ Îng.: Proper identification

⁹ Îng.: Clear outset

¹⁰ Îng.: Free and informed consent

¹¹ Îng.: Privacy

¹² Tiştê ku wek şexsî tê binavkirin ew e ku kesek bikaribe bi qasî ku tê xuyan bibe lêkolîn. Pinhaniya şexsî jî tê wê maneyê ku kesek xwedî heq e li ser tiştê mehremiyet û pinhaniya wî ya teqez an jî qismî hebe û her wiha yên din jî berpirsiyar in ku li hemberî vî pinhaniyê rêz bigirin.

- Divê lêkolîner ji bo pinhaniya şexsî ya kesan rêzdar be û ji bo bidestxistina agahiyên taybet ên beşdarên rêya zorê bi kar neyîne û ji vî tiştî dûr bisekine.
 - Di bikaranîna agahiyên têkildarî beşdarên de, lêkolîner berpîrs e ku bi tenê ji bo armancên lêkolînê bi kar bîne û divê xwe ji bikaranîna ji bo meqsedên dîtir û di şertên din de, xwe ji vê yekê dûr bigire. Berî şertên xwezayî yên der barê bikaranîneke nû ya wan agahiyan de, heqê destûrê yê wî şexsî, ji bo agahiyên der barê xwe de heye. Li gorî van şertan divê di lêkolînê de şexsê beşdar neyê nasîn û heke bê nasîn, divê ew dane neyên bikaranîn.
- 18) Razdarî û veşartîmayîna¹³ beşdarên di lêkolînê de;** dema ku lêkolîner hindek razên kesan an jî saziyan bi dest xist, divê xwe ji îfşakirin û belavkirina wan razan dûr bigire. Bi heman şiklî dema ku kesekî encamên lêkolînekê xwend, divê pê nehese ka beşdar kî ne. Lewra divê lêkolîner di lêkolînê de bi tu hawî, rêyek an jî nîşaneyek ji bo nasîna beşdarên bi cih neke. Bi vî hawî ji bo her agahiya der barê beşdarên a ku di destê lêkolîner de ye, divê lêkolîner soz bide ku dê tu wextî îfşa neke.
- 19) Selamet, ewlehî¹⁴ û asayîşa beşdarên¹⁵ di lêkolînê de;** lêkolîner berpîrs e ku hay ji selameti û asayîşa bedenî û zêhnî ya beşdarên hebe û her wiha divê lêkolîner, berî her tiştî, ji bo bergiriya xetereyêke mûhtemel, amadekariya her tiştên hewce bike.
- Heke zirar û ziyaneke derî aqil hebe, berjewendiya civatê yan jî pêşketina zanistê, nikare bibe sedema guhertina biryardayîna beşdarên an jî astengiya bikaranîna îrade û qirarên wan bixwe.
 - Heke bê zanîn ku kesekî ji bo lêkolînê ne musaîd e, divê neyê pejirandin.
 - Wextê ku armancên lêkolînê, zorê bide kesên ku ji bo azmûnê hatine hilibijartin, divê ew beşdarên hilibijartî, pêşî hêjahiyên ayende yên lêkolînê bîne ber çavên xwe.
 - Ji bo berxwedan û parastina vê komê ya li hemberî xetereyên di nav xebatê de, divê heya ku pêkan bû fişar û xetereyên mûhtemel bèn kêmkirin.
- 20) Ajel;** dema ku lêkolîner, ji bo lêkolînên zanistî, ji ajelan sûd wergire, divê di nav çarçoveya qaîdeyên lêkolînê de çavdêriya xwe bike û li gorî wan tev bigire. Bi vî hawî divê hay ji van xalên jêrîn jî hebe:
- Divê lêkolîner di warê lêkolînê de li ser ajelan palpiştên têr û tije peyda bike.
 - Destûra lêkolîner tune ku fişar, êş, stres û zirarê bide ajelan.
 - Lêkolîner berpîrs e ku hay ji krîter û standardên diyarkirî yên navenda vekolînê ya li ser ajelan (wek cihê vekolînê, tendurustî, dereceya germahiyê, di peyikandina azmûnê de kêmkirina êşkêşiyê) hebe û li gorî wan tev bigire.
- 21) Giya;** destûra lêkolîner tune ku di lêkolînê de –tu dixwazî bila di şêwaza lêkolînê de hebe an jî tunebe- zirar û ziyane bigihîne giyayan.

¹³ îng.: Confidentiality

¹⁴ îng.: Safety

¹⁵ Welfare of the Respondents

Pir zelal e ku her cûre destekariya li ser heyata giyayan, divê bi awayekî qenaetkar û li gorî faydeya wê ya ji bo civata beşerî, pêk were.

- Lêkolîner berpirs e ku ji bo parastina qada jiyane, hay ji plan û bernameyên siyasî û civakî –netewî an navnetewî- krîter û standardên diyarkirî hebe û li gorî wan hereket bike.
- 22) Parastina eşya, sened û belgename, kevnare û kelûpelên herêmî;** lêkolîner berpirs e ku di xirecira lêkolînê de hay ji krîter û standardên diyarkirî yê ji bo bikaranîna eşyayên kevnare û xwendina sened û belgenameyên qedîm, hebe û divê di vê hingameyê de zirar û ziyaneke negihîne wan.
- Lêkolîner di her şertî de bi parastina selametiya qada jiyane berpirsiyar e.
- 23) Ravekirina şewaza tevgerîna ya di meseleyên exlaqî de;** lêkolîner berpirs e ku di temamê raporkirin û nivîsandina lêkolînê, gotarê, tezê û hwd. de bi awayekî zelal û eşkere, her gav şewaza tevgerîna ya di meseleyên exlaqî de, bîne bîra xwe.

Beşa Şeşem: Reftarên Xerab ên Di Lêkolînê De

- 24) Lihevanî¹⁶;** ji wan tiştan pêk tê: nivîsandina mijarên derîrastiyê, nişandana dane an jî encamên çêkirî bi awayekî ku ji encamên azmûneke rast hatibin der, nivîsîna li gorî nêrîn û keşfên şexsî. Mînak:
- Nişandayîna encamên çêkirî bi awayekî ku wek encamên azmûneke rast bin an jî ji bernameyekê derçûbin.
 - Cîbicîkirina encamên lêkolînekê di şûna encamên lêkolîneke din de.
- 25) Pêleyîstin/Texrîfkirin¹⁷;** ji pêleyîstin û texrîfkirinê qesd ew e ku qeyd û encamên lêkolînekê bi awayekî wisa tê girtin ku bi bendên lêkolînê, bi amûr û alavan û bi prosesa berhevkirina daneyan tê lîstin an jî dane tê guhertin û jêbirin. Bi vî hawî encama lêkolînê li gorî armancên bi dilê mirov çêdibin. Mînak:
- Ji bo bidestxistina encamên ku di gotarê de hatine dayîn, nişandayîna astên azmûnê yan jî nişandayîna şewazên çewt ên analîzan.
 - Bi rêya azmûnên qaşo çêbûyî û mîrandinan, pêlistina encamên destkeftî.
 - Jêbirina qismek ji daneyan û encamên azmûnkirî an jî jêbirina analîzên şênber e ku nişandayîna wan, dudilîyê ji bo encamên destkeftî çêdike.
 - Bi rêya sûdwegirtina ji hin bernameyan (software), çêkirina guherînan berbiçav ên şiklî an jî grafikî.
 - Xemilandin û xweşnişandan¹⁸ an jî bi mezinkirina tiştên biçûk, veşartina armancên rasteqîn û mezintir.
- 26) Întîhal/Diziya zanistê¹⁹;** ji veguhastina fikr û gotinên nêzîk ên nivîskarên din pêk tê. Di vegotina nêrîn û mînakdayîna de lihevçûneke yek bi yek bi xebatên din re an jî bêyî tu nişaneke jêderî, fikr, şewaz, encam û peyvên kesên din, wek yê xwe hesibandin.

¹⁶ing.: Fabrication

¹⁷ing.: Falsification

¹⁸ing.: Juicy Quotes

¹⁹ing.: Plagiarism

- Li gorî qaîdeyên bingehîn ên vî warî, bêyî tu destûrgirtinê, wergerandina berhemek bi temamî an jî beşek ji wê berhemê û danasîna wê berhemê bi awayekî ku lêkolîneke wî ya zanistî ya resen be.
- 27) **Îcareya zanistê;** qesd ji îcareya zanistê ew e ku lêkolîner di şûna ku bixwe bi lêkolînê re bipelike, ji bo xebata lêkolînê kesekî din îcare dike û bixwe jî her çiqas tu hewlek nedabe jî piştî ku kar bê qedandin, hin tiştan lê zêde dike an jî diguherîne û paşê wek ku ew xebitîbe, li ser navê xwe diweşîne.
- 28) **Nakokiya berjewendiyê²⁰;** di şert û mercên diyarkirî de yek ji armancên sereke ya biryardayîna xebatê, peyman a bi lêkolîner a bi beşdarî re ye. Duyemîn berjewendiyê herî xurt jî tiştên wek madî, rûmeta ferdî, rûmeta zanîgehî, navdarî û hwd. in.
- Divê nivîskarê gotarê berjewendiyên hemû kesên têkildar bi awayekî ewle û durist binirxîne û divê her cûre nakokiyên berjewendiyê yên ku ji ber kesên têkildar derdiçin, di metnê yan jî pêşekiya gotarê de bi awayekî zelal bê vegotin.
 - Divê nivîskar çavkaniyên ku ji bo mesrefên lêkolînê û nivîsîna gotarê hatine dayîn, bi awayekî zelal bide nasîn û divê peyman di navbera wî û sponsorê wî de, di gotarê de bi tu hawî nebe sedema vegotinên nakokiya berjewendiyên.

Beşa Heftem: Jêgir

- 29) **Referans û jêgir²¹ ji çavkaniyên ku jê sûd hatine wergirtin;** sûdwergirtina ji berhemên kesên din²² çî bi awayekî rasterast be çî jî ne rasterast be, lêkolîner berpirs e ku wan kesan referans nîşan bide.
- Dema ku mirov ji gotin an jî nivîsên lêkolînerêkî, rasterast sûd wergirt, divê li gorî standartên diyarkirî yên veguhastinên rasterast²³ bê hereketkirin.
 - Di gotar an jî nivîsîna lêkolîna xwe de, heke mirov ji şikl, tablo û anketên berhevkerî, yanî ji xebateke berhevkarî sûd wergirt, divê mirov wek referans metna esil nîşan bide û veguhêzer jî pirtûka berhevkarîyê nîşan bide.
- 30) **Ravekirin²⁴ û îzahkirin;** Dema ku lêkolîner bi gotin û peyvên xwe wateya sereke ya metnê an jî nêrîna nivîskarê metnê, rave an jî şirove kir û vê yekê jî neqil kir, mecbûr e ku çavkaniya bingehîn wek referans nîşan bide.

²⁰ İng.: Conflict of Interest

²¹ İng.: Citation

²² Nîşandan: Ew cihê ku bi awayekî taybet jê sûd hatiye wergirtin referans bal bi wê cihî ve ye. Li gorî rê û rêbazên diyarkirî, berhemên ku di nav vê yekê de cih digirin kêm û zêde ji van tiştan pêk tên: pirtûk, kovar, rojname, raporên salane, îstatîstîk, hukmên dadî, şerh, weşanên spesîfik, peyman, pêşgotin, sertîfîka, rojnivîsk, nêrînen pîsporî, hevpeyvîn, rûniştinên zanistî, tablo/çarçove, grafîk, nexşe, lewhayên biçûkkirî, film, wêne, bernamêyên televîzyonê û radyoyê, konferans, malperên înternetê, bernamêyên vekirî/online, webblog, posteyên elektronîkî û hwd.

²³ Hinek ji van standartên diyarkirî yên veguhastinên rasterast ên girîng ev in: dema ku mirov ji metnekê rasterast wergirt, divê di nav du dunikan “ ” de bê nîşandan, di serî de divê mirov bi kurtî çavkaniyê bide nasîn û jêgira xwe rêzek ji nivîsa beriya wê cuda bike û pûntoyên jêgirtinê jî ji nivîsa normal biçûktir bike.

²⁴ Ravekirin (Paraphrasing), mirov heman fikrê bi alikariya peyvên hemwate bine ziman, hevokan bi hevoksaziyêke nû saz bike, guherînen qismî di peyvî de çê bike, hin tiştan zêde derxe pêş çav, dibe ravekirina wê fikrê. Îcar jêgirtineke bi vî şiklî be jî dîsa divê teqez çavkaniya wê bê nîşandan.

- 31) **Referansnîşandana çavkaniyên hêja**; kovara ku jê sûd bê wergirtin, malpera ku dê gotar jê bê wergirtin û nivîskarê gotarê bixwe, divê ewle û hêja be. Divê ji çavkaniyên gumanbar an jî ji aliyê zanistê ve nehêja, sûd neyê wergirtin an jî wek referans neyê nîşandan.
- 32) **Li gorî standardên navnetewî, referansnîşandan û jêgirtina guncaw**; yek ji standardan ew e ku nivîskar divê di referansnîşandanê de ji pirtûkeke di warê xwe de naskirî,²⁵ sûd wergire.
- Di sûdwegirtina ji çavkanî û berhemên elektronîkî de jî divê li gorî rêgezên pîvanên exlaqî yên çavkanî û berhemên çapkirî, bê hereketkirin.

Beşa Heştem: Berpirsiyarî û Xwedîtiya Entellektûelî²⁶ ya Lêkolîna Encambûyî

- 33) **Mercên nivîskariya lêkolînê**; kesê ku nivîskarê lêkolînê be an jî yek ji nivîskaran be (di plansaziya lêkolînê, gotar, pirtûk û hwd. de) divê herî kêmtaybetiyek ji van xalên jêrîn tê de hebe:
1. Bi qasî pareke meqbûl, di van her sê xalan de serkeftî be: a) Nîşandana nêrînekê di lêkolînê de an jî bikaribe plansaziya nîrxandinekê bike. b) Bikaribe daneyan berhev bike. c) Bikaribe analîz û şiroveyê bike.
 2. Berî nivîsandina gotarê û danîna bingeha wê an jî di prosesa tekûzkirinê de, bi qasî ku bikaribe ji aliyê naveroka zanistî ve bigihe encamekê, xwedî plan û sêwirîn be.
 3. Herî dawî bikaribe gotarekê binîrxîne û tekûztir bike.
- Kesê ku di lêkolînê de xwediyê keda herî zêde ye, wek nivîskarê yekem tê qebûlkirin.
 - Navên hemû kesên ku di nivîsandina gotarê de xwedî ked in, divê wek nivîskar di gotarê de bî nîşandan, serbayêser heke şîrkatiya wan kesan bi wê navend û tîma lêkolînê re, bi çî sedemî dibe bila bibe, qut bûbe jî divê dîsa ew wek nivîskar bî nîşandan.
 - Divê mirov ji wê yekê dûr be ku (kesek an jî kesên ku bi tu awayî di wî warî de, ne xwediyê gotinê bin) wek nivîskarê rûmetê bê nîşandan an jî navê (kesek an jî kesên ku di wî warî de layiq, mahir û xwedîgotin bin) bê veşartin û neyê nîşandan.
- 34) **Berpirsiyariya nivîskarên gotarê ya der barê naveroka wê de**; divê hemû nivîskar xalên jêrîn ku der barê berpirsiyariya naveroka gotarê de ne, bipejirînin:
1. Guncawbûna mijarên di gotarê de.
 2. Şopandina rêberên exlaqî di lêkolînê de.
- Navên ku dê di gotarê de bî rêzkirin, divê li gorî keda her nivîskarekî ya di nivîsandina gotarê de û her wiha li gorî asta afirîneriya wî ya di xebatê de bê nîşandan, ne ku li gorî meqam û raboriya kesan.
- 35) **Berpirsiyariyên nivîskarê berpirs²⁷**; nivîskarê berpirs ew kes e ku berpirsiyariya koma lêkolînê û ewlehiya temamê lêkolînê qebûl kiriye û bi vî hawî di şûna nivîskarên heyî de, berpirsiyariya nivîsandin û bersivandina xalên şêlû û îtirazên heyî yên di warê gotarê de û her wiha

²⁵ îng.: Bibliography

²⁶ îng.: Intellectual property

²⁷ îng.: Corresponding author

agahdarkirina nivîskarên din bi name û nêrînên girîng û sererastkirina têkiliyên di navbera wan de, girtiye ser milê xwe.

- 36) **Spasguzarî**²⁸; navê hemû kesên ku di pêkanîna lêkolînê de cih girtine û yên ku alîkarî beşandine lêkolînê, lêbelê li gorî pîvanan di nav listeya nivîskaran de tunebe, di beşa spasguzariyê de, divê navê wan û beşdariya wan a di xebatê de, bê vegotin û nivîsandin.
- Kesê ku bersiva çend pirsiyarên qada pisporiyê ya lêkolîner dabe, divê hêvî neke ku navê wî jî di nav nivîskaran de bê nîşandan, lê divê spasguzariya wî bê kirin.
 - Heke bi kesekî bê şewirîn û piştî vê şewrê, seyra lêkolînê biguhere û bi saya pêşniyarên wî, encamên girîng bîn bidestxistin, divê navê wî bêyî tu astengekê, wek nivîskarê gotarê an jî rapora lêkolînê bê nîşandan.
- 37) Têkilîdanîna nelirê (sexte) ya bi sazî, navend an jî koma azmûnger re ku tu roleke wan di lêkolîna eleqedar de an jî karûbarê pişeyî yê nivîskar de tunebe, ne tiştêkî destûrî ye.
- 38) Hin gotar hene ku ji tezên pisporî û doktorayê tîn derxistin, di van gotaran de divê bi rêzê navê xwendekar, mamosteyê(n) rêber û mamosteyê(n) şewirmend bê nivîsandin.
- 39) Di her şert û mercî de divê mamosteyê rêber an jî şewirmendê lêkolînê, rastî û şaşiyên di naveroka lêkolînê de, nîşan bide û bibersivîne. Dixwazî bila rasterast beşdarî lêkolînê bibe, dixwazî bila bi delîlên mezin, bi nêrînên rêkûpêk ên li ser lêkolînê û encamên wê ve têkildar nebe.
- Heke lêkolîner bêyî tu guman û endîşeyê, tenê ji bo agahdarkirina mamosteyê rêber û şewirmendê koma lêkolînê, rabe xebatê li ser navê wan biweşîne, berpirsiyarî hemû li ser milê lêkolîner bixwe ye. Piştî vê yekê, divê mamosteyê rêber û şewirmendê koma lêkolînê, di nav gavên qanûnî de û wextekî pir lez de agahdariya raya giştî bike.

Beşa Nehem: Pîvanên Sereke yê Weşanê

- 40) **Çap û belavkirina dawî**; lekolîner berpirs e ku di hemû astên lêkolînê de, keşf û dozînen lêkolînê, rêbazên xebata lêkolînê, ji bo berhevkarî û analîza wan, bi awayekî zelal, şefaf, sade, watedar²⁹ û ji bo îstifadekirina kesên din, çap bike û belav bike.
- 41) **Şandina paralel/pevdemî**; destûra wê yekê tune ku di heman demê de mirov gotarekê ji bo nirxandin û belavkirinê bişîne du an jî çend kovarên çapkirî û elektronîkî.
- 42) **Şandina dubare/jinûve**³⁰; jê re destûr tune ku mirov gotareke weşiyayî ya di weşaneke çapkirî an jî elektronîkî de, ji nû ve ji bo nirxandin û weşanê ji weşaneke din re bişîne.
- Heke nivîskarê gotarekê, gotara xwe ji bo weşanê şandibe weşaneke û paşê biryara xwe biguherîne û ji bo ku gotara xwe ji bo weşaneke din bişîne, divê di serî de, jêgerîn û devjêberdana xwe, bi awayekî nivîskî, ji weşana yekem re bişîne û wan agahdar bike. Ev kar, herî kêr divê berî pejirandina gotarê ya ji bo çapê ya weşana yekem, bê kirin.

²⁸ îng.: Acknowledgement

²⁹ îng.: Meaningful

³⁰ îng.: Duplicate submission

- Heke encamên lêkolînekê di konferanseke zanistî de, bi awayekî kurte, di nav gotarên wê konferansê de weşiyabe, ji bo nirxandin û weşanê, şandina wê gotarê bi halê tam ji bo kovareke din, ne asteng e.
- 43) **Weşana hevdubarekirî³¹**; destûr ji bo lêkolîner tune ku bi awayekî hindik, daneyên gotara xwe ya berê biguherîne û di gotara xwe ya nû de bi awayekî nû bişîne çapê.
- Heke pir hewce be, nivîskar di gotarên xwe yê duym û paşê de, dikarin dubare beşek ji hêman û rêbazên xwe yê gotara pêşîn binivîsin. Lêbelê di her rewşê de lazim e ku qala çavkaniya berê bikin.
- 44) **Weşana parçeyî³²**; di şûna ku encamên lêkolînekê, di gotarekê de bi awayekî yekpare bê weşandin, destûr ji bo lêkolîner tune ku wan encaman, di çend beşên cuda û çend gotarên serbixwe de, bide çapkirin.

Bîbliyografya

- آرامش، کیارش (1388) پیش نویس راهنمای کشوری اخلاق در انتشار آثار پژوهشی علوم پزشکی، معاونت تحقیقات و فناوری وزارت بهداشت، درمان و آموزش پزشکی.
- تابعی، سیدضیاءالدین؛ محمودیان، فرزاد (1386) اخلاق در پژوهشگری، فصلنامه اخلاق در علوم و فناوری، سال دوم، شماره های 1 و 2.
- توکلی، محمد جواد (1388) اقتصاد پژوهش؛ آسیبشناسی معادلات اقتصادی حاکم بر بازار پژوهش، سال اول، شماره دوم.
- حقشناس، محمد؛ زاکری، سید محمد حسین (1387) جستجوی مفاهیم اخلاق زیست محیطی در آموزه ها اسلامی، فصلنامه اخلاق در علوم و فناوری، سال سوم، شماره 1 و 2.
- حکیم باشی، حسن (1384) آسیبشناسی مقاله نویسی و پژوهش در مطبوعات دینی، فصلنامه پژوهش و حوزه، شماره 24.
- خاکی صدیق، علی (1389) مقدمه ای بر اخلاق پژوهش و اخلاق نویسندگی، چاپ اول، انتشارات دانشگاه صنعتی خواجه نصیرالدین طوسی، تهران.

³¹ İng.: Overlapping publication

³² İng.: Partial publication

- خالقی، نرگس (1387) اخلاق پژوهش در حوزه علوم اجتماعی، فصلنامه اخلاق در علوم و فناوری، سال سوم، شماره 1 و 2.
- شریفی، احمد حسین (1388) اخلاق پژوهشگران: بحثی درباره‌ی نقش پارسایی در پژوهش، پژوهش سال اول، شماره دوم.
- شعبانی ورکی، بختیار (1385) منطق پژوهش در علوم تربیتی و اجتماعی: جهتگیری نوین، چاپ اول، انتشارات به نشر، مشهد.
- عابدی سروستانی، احمد؛ شاه‌ولی، منصور (1388) نقش ترویج کشاورزی در ارتقاء اخلاق زیست محیطی کشاورزان، فصلنامه اخلاق در علوم و فناوری، سال چهارم، شماره‌های 1 و 2.
- عزیزی، فریدون؛ اعتمادی، آرش (1384) تعهدات اخلاق نویسندگان مقالات، مجله پژوهش در پزشکی، سال 29، شماره 2.
- فراستخواه، مقسود (1385) اخلاق علمی رمز ارتقای آموزش عالی، فصلنامه اخلاق در علوم و فناوری، شماره 1.
- فرامرز قراملکی، احد (1383) خاستگاه اخلاق پژوهش، آینده میراث، دوره‌ی جدید، شماره 27.
- فلیک، اووه (1387) در آمدی بر تحقیق کیفی، ترجمه‌ی هادی جلیلی، چاپ اول، نشر نی، تهران.
- قانعی، مصطفی و همکاران (1387) مدیریت اجرایی اخلاق در پژوهش های علوم پزشکی: نتایج یک کارگاه، مجله اخلاق و تاریخ پزشکی، 1 (1): 5-16.
- گال، مردیت؛ بورگ، والتر؛ گال، جویس (1384) روش های تحقیق کمی و کیفی در علوم تربیتی و روانشناسی، ترجمه احمد رضا نصر و همکاران، جلد اول، چاپ دوم، انتشارات سمت، تهران.
- لشکربلوکی، مجتبی (1387) چارچوب تدوین ارزشها و اخلاق حرفه‌ای پژوهش های علمی و فناوری، فصلنامه‌ی

- اخلاق در علوم و فناوری، سال سوم، شماره های 1 و 2.
- مبشر، مینا؛ موسوی، فاطمه؛ نخعی، نوزر؛ شیبانی، وحید (1385) بررسی رعایت اخلاق در پژوهش بر حیوانات آزمایشگاهی به روش کیفی، فصلنامه اخلاق در علوم و فناوری، پیوست شماره 1.
 - محمودی، علی (1386) نگرش فلسفی بر اخلاق در پژوهش، فصلنامه دانشگاه اسلامی، سال یازدهم، شماره 4.
 - و داهیر، ابوعلی؛ فرهود، داریوش؛ قاضی طباطبایی، محمد، توسلی، غلامعباس (1387) معیارهای رفتار اخلاق در انجام کار عملی (تاملی بر جامعه‌شناسی اخلاق در علم - فن آوری مرتن و رزنیك)، فصلنامه اخلاق در علوم و فناوری، سال سوم، شماره‌های 3 و 4.

- Boulton, M., Brown, N., Lewis, G., & Webster, A. (2004). Implementing the ESRC Research Ethics Frame-work: The Case for Research Ethics Committees: York: SATSU, University of York and School of Social Sciences and Law, Oxford Brookes University.
www.gold.ac.uk/media/ESRC_Re_Ethics_Frame_tcm6-11291.pdf
- Buchanan, E. A., & Hvizdak, E. E. (2009). Online survey tools: Ethical and methodologi Ethics, 4(2), 37-48.
- Chakladar, A., Eckstein, S., & White, S. M. (2011). Paper use in research ethics applications and study conduct. Clinical Medicine, Journal of the Royal College of Physicians, 11(1), 44-47.
- Chaudhury, Neelam and Kumar, Nandini K. (2006) Ethical Guidelines For Biomedical Research on Human Participants, Indian Council of Medical Research, New Delhi, Published by: Director-General, New Delhi 110 029, www.icmr.nic.in
- Connolly, Paul (2003) Ethical Principles for Researching Vulnerable Groups, University of Ulster, Commissioned by the Office of the rience in Human Research Ethics. Journal of Academic Ethics, 7(1), 27-31.
- Davey, K. G. (2009). Reflections on My Experience in Human Research Ethics. Journal of Academic Ethics, 7(1), 27-31.
- Ferguson, K., Masur, S., Olson, L., Ramirez, J., Robyn, E., & Schmalig, K. (2007). Enhancing the culture of research ethics on university campuses. Journal of Academic Ethics, 5(2), 189-198.

- Guidelines for Ethical Research in Australian Indigenous Studies, Published by the Australian Institute of Aboriginal and Torres Strait Islander Studies, (2011) www.aiatsis.gov.au
- Hebert, P.C., & Fergusson, D. A. (2010). Are we keeping research participants safe enough? *Canadian Medical Association Journal*, 182(10), E428.
- Horner, J., & Minifie, F. D. (2011). Research (RCR)- Historical and Ethics I: Responsible Conduct of Research (RCR)—Historical and Contemporary Issues Pertaining to Human and Animal Experimentation. *Journal of Speech, Language, and Hearing Research*, 54(1), S303.
- Januszewski, A., Nichols, R., & Yeaman, A. R. J. (2001). Philosophy, methodology and research ethics. *TechTrends*, 45(1), 24-27.
- Macfarlane, B., & Saitoh, Y. (2008). Research Ethics in Japanese Higher Education: Faculty Attitudes and Cultural Mediation. *Journal of Academic Ethics*, 6(3), 181-195.
- Paul, H. (2009). Research ethics review: Do it once and do it well. *CMAJ: Canadian Medical Association Journal*, 180(6), 597.

Pêvek:

LIJNEYA EXLAQÊ LÊKOLÎNÊ YA WEZARETA ZANIST, LÊKOLÎN Û TEKNOLOJİYÊ	
Nav û Paşnav	Navnas, Zanîngeh û Sazî
(Dr. Muzaffer Sherifi) دکتەر مۆظفر شەریفی	Serokê Bernamerêzî û Siyasetguzariya Lêkolînê li Wezareta Zanistê
(Dr. Bakhtyar Shabani Wurki) دکتەر بختیار شەبانی وركی	Berpîrsê lêkolîn û teknîkê yê zanîngeha Fîrdews Meşhed
(Dr. Hamid Riza Mumini) دکتەر حمیدرضا مومنی	Berpîrsê lêkolîn û teknîkê yê zanîngeha Irak
(Dr. Ahmad Parsian) دکتەر احمد پارسیان	Endamê lijneya zanistî yê zanîngeha Tehran
(Dr. Simin Husainian) دکتەر سیمین حسینیان	Berpîrsa lêkolîn û teknîkê ya zanîngeha El-Zehra(s)
(Dr. Muhamad Mahdi Dahqan) دکتەر محمد مهدی دهقان	Mudîrê giştî yê bernamerêzî û lêkolînê yê zanîngeha Tehran
(Dr. Ali Riza Zrasondi) دکتەر علیرضا زراسوندی	Berpîrsê lêkolîn û teknîkê yê zanîngeha Şehîd Çomran Ahwaz
(Dr. Shahbaz Nia) دکتەر شهبازی نیا	Endamê lijneya zanistî yê zanîngeha Terbiyeyî Muderris
(Dr. Piman Salihi) دکتەر پیمان صالحی	Berpîrsê lêkolîn û teknîkê yê zanîngeha Şehîd Beheştî
(Dr. Ahd Framorz Qramolki) دکتەر احد فرامرز قرامولکی	Endamê lijneya zanistî yê zanîngeha Tehran
(Dr. Mohdi) دکتەر موحدی	Mudîrê karûbarê lêkolînê yê zanîngeha Sanati Şerîf
(Leila Falah Nijad) لایلا فلاح نژاد	Pispora berpîrs a wezareta zanist, lêkolîn û teknolojîyê




Kitap Deęerlendirmesi | Book Review





KITAP DEĞERLENDİRMESİ

Ronayî Önen, *Ziman û Netewesazî – Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê, Weşanên Peywend, Wergera ji îngilîzî: Şehmuz Kurt, Stenbol, 2018. (214 rûpel)*



Di dîroka kurdan de çanda devkî ji ya nivîskî kevtir û bi bandortir e. Di her serdemê de kurd ji aliyê siyasî ve hatine astengkirin û nekarîne berhemên xwe bi awayekî azad bi nivîskî derbasî nifşên din bikin. Ji ber vê çîrok, klam, stran ji aliyê çîrokbêj û dengbêjan ve bi awayekî devkî nifş bi nifş hebûna xwe parastine. Digel qedexa û astengiyan çapemeniya kurdî cara ewil di 1898an de bi rojnameya *Kurdistanê* dest bi weşanê kiriye. Piştî vê gava girîng a ber bi weşanên nivîskî ve, kovarên wek *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd*, *Hawar*, *Ronahî* û hwd. jiyana kurdan rengîn kirine.

Her çiqas nîqaşên li ser alfabeyê beriya *Hawarê* derketibin jî, pêşengiya alfabeya latînî bi vê kovarê dest pê kiriye. Celadet Elî Bedirxanê ku ligel komeke rewşenbîrên kurd di 15ê gulana 1932yan de kovara *Hawarê* derxistiye, cara ewil tîpên latînî bi kar aniyê. Her wiha bingeha rêzimana kurdî jî bi vê kovarê daniye. Heta niha li ser *Hawarê* gelek xebat hatine kirin, bi taybetî di warê rêzimanê de. Rêzimanzanên roja me yên wek Samî Tan, Mîkaîl Bilbil, Bahoz Baran bingeha berhemên xwe li gor qaîdeyên rêzimana *Hawarê* danîne. Mijareke din a sereke ya kovara navborî “neteweperwerî” ye ku bûye mijara pirtûka Ronayî Önen a bi navê *Ziman û Netewesazî – Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*. Ev xebat teza masterê ye û bi îngilîzî hatiye nivîsîn, ji aliyê Şehmuz Kurt ve ji bo kurdî hatiye wergerandin. Önen li Zanîngeha Marmarayê di beşa Perwerdehiyê de xwendiyê. Mastera xwe li Zanîngeha Bilgiyê, di Beşa Lêkolînên Çandî de kiriye. Ji 2005an ve ye mamostetiya kurdî dike. Bi Samî Tan re pirtûkên dersê yên bi navê *Hîsker I-II-III* nivîsîne.

Xebata Ronayî Önen a bi navê *Ziman û Netewesazî – Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê* ji xeynî pêşgotin û destpêkê, ji du qisman pêk tê. Di qisma ewil de du beş hene û di qisma duyem de jî sê beş hene. Di Beşa I. a qisma ewil de nivîskar

bi serenava *Çarçoveya Teorîk û Rêbazî* bi gelemperî behsa neteweperweriyê kiriye. Pênaseya neteweperweriyê daye li gorî nivîskarên wek Rupert Emerson û Umut Özkırmımlı ku li gorî wê pênaseya Özkırmımlı ji bo destpêkê di cih de ye; “Netewerperwerî, ew vegotin e ku şikil dide hişmendiya me û di şîrovekrina cihanê de alikariya me dike, anku neteweperwerî nasnameya me ya hevpar diyar dike, ew cureyekî îdraqê ye ku vegotin, tevger û helwestên me yê rojane bi rê ve dibe.” Her wiha di vê beşê de ji aliyê neteweperweriya sivil û neteweperweriya çandî ve nîqaşên li ser neteweperweriyê jî sekiniye.

Girîngiya li ser ziman û neteweyê hem di kovara *Hawarê* de hem jî di kovarên beriya wê de gelek caran derdikeve beriya mirov. Ronayî Önen jî di Beşa II. a qisma ewil de bi serenava *Paşxaneya Dîrokî* ji beriya *Hawarê* behsa avakirina vegotinê û sazkirina neteweya kurd kiriye û bi gotinên Evdirrehman Bedirxan, Îsmail Heqî Babanzade an jî bi nameyên xwîneran ku li ser netewe û zimên in û di kovaran de cih girtine paşxaneya xebata xwe xurtir kiriye.

Di qisma duyem de Önen behsa derketina *Hawarê*, weşanger û nivîskarên wê û her wiha behsa mijarên wê jî kiriye. Weku gelek caran hatiye dubarekirin, mijara sereke ya kovarê girîngiya zimên e û gotina Celadet Bedirxan jî vê yekê piştrast dike: “Ez qo qurd û qurdmanc ziman im û zimanê xwe rind dizanim min ew bi heft heşt zmanên din danîye ber hev, qitqitên wi hûrhûnandine; qeydeyên wî ji hev derêxistine.” Önen yek bi yek nivîskarên kovarê jî dane nasîn. Her wiha balkêş e ku di nav van nivîskaran de ji xeynî Rewşen Bedirxan tu nivîskareke din a jin tune ye.

Di Beşa IV. a qisma duyem de nivîskar bi serenava *Avakirina Nasnameya Neteweyî bi Rêya Zimanî* behsa têkiliya di navbera neteweperweriyê û zimên de dike. Girîngiya yekîtiya neteweyî ya bi rêya yekîtiya zimên destnîşan dike û diyar dike ku rewşenbîrên kurd wisa bawer dikir ku heke kurd bi rêya zimanekî yekbûyî û pêşketî ji hev du fehm nekin, di navbera wan de têgihana hevgirtinê peyda nabe. Her wiha nivîskar di vê beşê de cih dide standardizasyona zimên jî ku Celadet Bedirxan gelek girîngî dayê û ji bo ziman û alfabeyeke standard xebitiye.

Di beşa dawî ya qisma duyem de nivîskar li ser mijarên din sekiniye ku bi neteweperweriyê re eleqedar in: welat, ala kurdî, yekîti, hevgirtin û din mijarên sereke ne.

Wek encam mirov dikare bêje ku ev xebat fikrên rewşenbîrên di wê serdemê de derdixe pêş û nêrînên wan ên li ser neteweperwerî, ziman û yekîtiyê nîşanî me dide. Her wiha rê li ber me vedike ku mirov derbarê vê mijarê de xwe bigihîne çavkaniyên bingeh.

Sevda Orak Reşitoğlu

Lêkolîner, Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Yayın İlkeleri

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü tarafından çıkarılan JMS (The Journal of Mesopotamian Studies), Kürt, Arap ve Süryani dili kültürü ve edebiyatları alanlarındaki bilimsel nitelikli çalışmalara yer veren hakemli bir dergidir. Kış (Şubat) ve Yaz (Ağustos) sayıları olmak üzere yılda iki defa yayınlanır. Yayınlanacak yazılarda bilimsel araştırma ölçütlerine uygunluk, alana bir yenilik getirme ve başka yerde yayınlanmamış olma şartı aranır. Bilimsel bir toplantıda sunulmuş bildiriler, yayınlanmamış olmak şartıyla kabul edilebilir.

Yazıların Değerlendirilmesi

- Dergimize gönderilen yazılar, öncelikli olarak yayın kurulunca dergi ilkelerine uygunluk açısından incelenir. İlkelere uygun bulunanlar, iki hakeme gönderilir. Yazarlar, hakemlerin önerilerini dikkate alıp gerekli düzeltmeleri yaparlar; fakat katılmadıkları noktalara itiraz etme hakkına sahiptirler.
- Gönderilen telif makaleler, Editör Kurulu tarafından incelendikten sonra değerlendirilmek üzere “kör hakem” yöntemiyle konunun uzmanı iki hakeme gönderilir. İki hakemin görüş ayrılığı durumunda, üçüncü bir hakemin görüşüne başvurulur. Makale, en az iki hakemden olumlu rapor gelmesi halinde yayınlanır. Hakem raporları yazara gönderilerek karar bildirilir.
- Hakemlerden biri veya her ikisi, “düzeltmelerden sonra yayınlanabilir” görüşü belirtirse, gerekli düzeltmelerin yapılması için makale yazara gönderilir. Düzeltme yapıldıktan sonra hakemlerin uyarılarının dikkate alınıp alınmadığı hakem veya Editör Kurulu tarafından değerlendirilir. Ayrıca yazarların, hakemler tarafından belirtilen görüşlere itiraz etme hakkı bulunmaktadır. Yapılan itirazlar editör kurulu tarafından görüşülüp uygun bir karar alınır.
- Yayınlanmasına karar verilen yazılar, sayfa düzenlemesi yapıldıktan sonra pdf formatında yazarlara gönderilir. Yazar son okumayı yapar ve gerekli düzeltmeleri metin üzerinde işaretleyerek dergiye geri gönderir.
- Yayınlanmayan yazılar iade edilmez ve yazılardaki görüşlerin yasal sorumluluğu yazarlarına aittir.
- Yayınlanan yazılar için yazardan dergiye veya dergiden yazara herhangi bir ücret ödenmez.
- Yayın aşamasında yazılar üzerinde esasa yönelik olmayan küçük düzeltmeler Editör Kurulu tarafından yapılabilir.
- Yayınlanan yazıların yayın hakları MAÜ Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü’ne devredilmiş sayılır. Bu devir, sanal ortamı da kapsar.
- Makale gönderimi ve değerlendirme süreci Dergipark sistemi üzerinden yürütülür.
- Makaleler değerlendirme sürecine alınmadan önce iThentica intihal programı kullanılarak benzerlik analizine tabii tutulur.

Yayın Dili

- JMS’nin yayın dili Türkçe, Kürtçe, Arapça, İngilizce ve Süryanicedir. Ancak her sayıda, dergide yer alan çalışmaların en az yarısının Kürtçe ve onun çeşitli lehçelerinde yazılmış olması ilke olarak benimsenmiştir. Dergiye gönderilecek yazıların akademik dil kullanımıyla ilgili her türlü kusurdan arınmış olması gerekir.

Yazım Kuralları ve Sayfa Düzeni

- Yazılar A4 boyutunda kâğıda, MS Word veya uyumlu programlarla yazılmalıdır. Yazı karakteri olarak Times New Roman kullanılmalıdır. Yazılar 12 punto ve 1.5 satır aralığıyla yazılmalı, sayfalar numaralandırılmalıdır. Makalelerin uzunluğu en fazla 9.000 sözcük olmalıdır. Özel yazı karakterleri kullanılmamalı, transkripsiyon işaretleri varsa bununla ilgili dokümanlar ulaştırılmalıdır.
- Yazarın adı, soyadı, unvanı, görev yaptığı kurum, ORCID numarası ve e-posta adresi mutlaka belirtilmelidir.
- Makalenin başlığı içerikle uyumlu olup koyu harflerle yazılmalı ve 15 sözcüğü geçmemelidir.
- Makalenin başında, en fazla 150 ile 200 sözcükten oluşan bir öz yer almalıdır. Türkçe dışındaki dillerde yazılan makalelerde öz makalenin orijinal dilinin yanı sıra Türkçe ve İngilizce olarak da yazılmalıdır. İngilizce öz kısmında makalenin ismine de yer verilmelidir. Özlerin altında genelden özele doğru sıralanmış 4 ila 6 sözcükten oluşan anahtar sözcükler bulunmalıdır.
- Başlıklar koyu harflerle yazılmalıdır. Uzun yazılarda ara başlıkların kullanılması okuyucu açısından yararlıdır. Ana başlıkların, 1., 2., ara başlıklarınsa, 1.1., 1.2., 2.1., 2.2 şeklinde numaralandırılması tavsiye edilir. Ana ve ara başlıkların tümü (ana bölümler, kaynaklar ve ekler) koyu harflerle yazılmalıdır.
- Metin içindeki vurgulanması gereken ifadeler, “tırnak içinde” gösterilir, eğik veya koyu karakter kullanılmaz. Hem “tırnak içinde” hem eğik veya hem koyu hem eğik yazmak gibi çifte vurgulama yapılmaz.
- Bölüm ve paragraf başlarında girinti uygulanmaz.
- Yazılarda kullanılan çizim, grafik, resim ve benzeri malzemeler JPEG ya da GIF formatında olmalıdır. Görsel malzeme ve ekler gerektiğinde e-posta yoluyla ayrıca ulaştırılmalıdır.

Kaynak Gösterimi

- Alıntı yapma ve kaynak göstermede APA yöntemi kabul edilmektedir.
- Dipnot ve kaynakların yazımı konusunda, yöntem bakımından kendi içinde tutarlılık şarttır. Uzun yapıt (kitap, dergi, gazete vb.) adları eğik, kısa yapıt (makale, öykü, şiir vb.) adları ise “tırnak içinde” yazılır. Ayrıca dipnotların yalnızca metne alınamayan ek bilgiler için kullanılması önerilir.
- Bir yapıtın derleyeni, çevireni, yayına hazırlayanı, editörü varsa künyede mutlaka gösterilmelidir.
- Elektronik ortamdaki metinlerin kaynak olarak gösterilmesinde, yazarı, başlığı ve yayın tarihi belirtilmiş olanlar kullanılır. Ayrıca künye bilgilerinde parantez içinde erişim tarihi belirtilmelidir.
- Ulaşılabilir kaynaklarda ikincil kaynak kullanımından kaçınılmalıdır.
- Atıf yapılmayan çalışmalara Kaynaklar kısmında kesinlikle yer verilmemelidir.
- Kaynaklar metnin sonunda, yazarların soyadına göre alfabetik olarak yazılmalıdır. Eserlerin yayınevleri açık şekilde ve makalelerin bulunduğu sayfa aralıkları belirtilmelidir.
- Latin harfleri dışındaki alfabelerle yazılmış makalelerde Latin harfleriyle yazılmış başlık, özet, anahtar kelimeler, ve kaynakçaya (referanslar) yer verilmelidir.

Publication Principles

The Journal of Mesopotamia Studies (JMS) is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. The JMS is a peer-reviewed journal which gives places to scientific researches on Kurdish, Arabic and Syriac culture, language and literature. It is published semi-annually (Winter and Summer Issues). The articles to be published should bear criteria of scientific researches, be innovative, and also should not be published anywhere else before. If an article has been presented in a scientific meeting, it will be accepted on the condition that it has not been published anywhere before.

The Evaluation of Articles

- Articles submitted for publication are firstly examined by editorial board in accordance with the publication principles of the journal. The endorsed ones are sent to two reviewers. The authors corrected the article according to the notes by reviewers; however they have right to object to the points where they do not agree with.
- Articles submitted for publication are sent to two experts of the field via method of "blind review" after they examined by Editorial Board. In the case of split in opinion of these two reviewers, the article is sent to another reviewer. The article is published if at least two reviewers express positive opinion. The reports by reviewers are sent to the authors to pronounce the evaluation result.
- If one or both reviewers express "it could be published after certain revisions", the article is sent to the author for the required revisions. After revisions are done, they are checked by reviewers or the Editorial Board to evaluate whether they are done in accordance with the remarks. Besides, the authors have right to object to the reviewers opinions. The objections are evaluated and resulted by the editorial board.
- The articles that decided to be published are sent to the author in PDF formatted after page adjustment. The author makes the last reading and shows necessary revisions on the text and sent it back.
- The unpublished articles are not return back to the rightful owner, furthermore the authors are responsible for the opinions of the articles.
- The journal does not demand any fees to publish their articles, and likewise does not pay any fees for publishing articles.
- The Editorial Board may make small adjustments those are not on the main stage.
- It is accepted that the copyright of the published articles are transferred to The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. This transfer includes virtual platforms.
- Article submission and evaluation process is conducted on Dergipark system.
- Before Evaluation process starts, the articles are analyzed via iThentica plagiarism program.

Language(s) of Publication

- The JMS gives places to articles in Turkish, Kurdish, Arabic, English and Syriac. However, it accepted as a principle that at least half of the studies in the journal should be in Kurdish and its various dialects. The articles sent to the journal must be free from all kinds of defects related to the use of academic language.

Writing Rules and Page Layout

- The articles must be written on MS Word or compatible programs. Times New Roman should be used as typeface. The articles should be written in 12 font size in 1.5 ink line

spacing and the pages should bear numbers. The articles should be maximum 9.000 words. The custom typefaces should not be used and if there are transcription signs, their documents should be sent with the article.

- The name, surname, title, place of work, ORCID number and e-mail address of the author(s) must be stated.
- The title of the article must be in accordance with the content and written in bold face, and also must not be longer than 15 words.
- There must be an abstract of maximum 150 to 200 words at the start of the article. For the articles written in languages other than Turkish, the abstract must be written both in the original language of the article and in English. The title of the article must be stated before the abstract as well. There must be maximum 4 to 6 key words that ranked from general to specific at the bottom of the abstract.
- The title must be written in bold face. There should be intermediate titles in the long articles. It is recommended that the main titles numbered as 1., 2., and intermediate titles as 1.1, 1.2., 2.1., 2.2. All the main and intermediate titles (main sections, sources and appendices) should be written in bold face.
- Expressions highlighted in the text, must be «in quotes», bold or italic faces must not be used. There must not be double highlighting as «in quotes» and bold or italic.
- There must not be intents at the start of section and paragraphs.
- Illustrations, graphics, images and other materials those used in text must be in JPEG or GIF format. Visual material and attachments must be delivered also via e-mail if required.

References

- APA is accepted for citation and references.
- Methodically consistency is essential for writing the footnotes and sources. Names of long works (books, magazines, newspapers etc.) should be written in italic face, names of short works (articles, stories, poems and so on) «in quotes». Also, it recommended that to use footnotes only for the additional information that cannot be given in the text.
- The compiler, translator, preparer for publication, editor must be shown in the tag if exist.
- In case of the citation of the text of electronic media, the name of author, title and date of publication which are specified are used. The date of access should also be noted in parentheses in catalog information.
- The secondary sources should be avoided if the primary resources are available.
- The works those have not been cited must not be shown in the sources.
- The sources should be given at the end of the text in alphabetical order. The publishing houses should be given clearly and the pages ranges of the articles should be stated.
- Articles written in any alphabets other than Latin alphabet should include the title, abstract, keywords, and references written in Latin.

